



---

# TÊDE

---

Sal 1 • Hejmar 3 • Îlon 1995

---

**JİYAN Û BERHEMÊN EHMEDE XANÎ (1650-1707) 3**

Prof. Joyce Blau

**MEM Û ZÎN KENGÊ JİYANE? 11**

Mûrad Ciwan

**EQÎDEYA ÎSLAMÊ YA EHMEDE XANÎ 18**

Zeynelabidîn Zinar

**KURD DÎ KÎTÊBÊN MESÛDÎ DE 22**

Emîn Narozi

**GOL 31 & PELÊ PAYÎZÊ 32**

Mehmet Tanrikulu

**GOZÊRE 33**

Serdar Roşan

**NOVEL 39**

Hesenê Metê

**ŞI'ROKE EHMEDE XASÎ 44**

**NE AXPEREST ÎM 47**

Arjen Arî

**HÊNDÊ LAYENÎ KULTURÎ KOMARÎ KURDÎSTAN 1946 II 49**

Kerîmî Husamî

**DÎ DERHEQÊ WEŞANÊN GIŞTÎ Û NÎVÎSKARIYÊ DE ÇEND RÊZ 51**

Şahînê B. Soreklî

**DERDÊ DEWRÊŞÎ 55**

J. Espar

**"SIYASIYEN ME NEBÛN" II 70**

Hemîd Kilicaslan

**NARS Û NARSÎZM 78**

Laleş Qaso

**ŞÊX Û MELA 81**

Mehdî Özsoy

**KOMELEYA XWENDEKARÊN KURD HÊVÎ 83**

Zinar Soran

**NALEY CUDAYÎ 96**

Hêmin

**MÎR 'IZEDDÎNŞÊR Û XULAMÊ WÎ KULO 101**

Yê ku berhev kiriye: Alexandre Jaba

**WERGERA RÛSÎ YA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ 102**

Seîd Mela

**KONFERANSA EHMEDE XANÎ 103**

**JÎ SERHÎLDANA SALA 1925'AN ÇEND FOTOGRAF 104**

---

Sal 1  
Hejmar 3  
Îlon 1995

**XWEDÎ Û BERPIRSIYARÊ GIŞTÎ**

Mehemed Malmîsanij

**REDAKSİYON**

Osman Aytar  
Nedim Dağdeviren  
Nacî Kutlay  
Mahmûd Lewendî  
Hesenê Metê  
Zinar Soran

**ŞERTÊN ABONETIYÊ**

Salek: 200 SEK  
Nîvsal: 100 SEK  
Hejmarek: 50 SEK  
*Ji bo welatên din  
mesrefa postê lê zêde dibe.*

**ÎLAN**

Rûpelek 1000 SEK  
Nîv rûpel 500 SEK  
Çarîk rûpel 200 SEK

**PERGALA BERGÊ Û RÛPELAN**

Nedim Dağdeviren

**RÎSMÊ BERGÊ PÊŞÎN**

Ehmedê Xanî: Ji Seîd Rêzanî

**POSTGIRO**

46 32 31-1

**ISSN**

1400-528X

Berpirsiyariya her nivîsê,  
ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

**ÇAP**

Apec-Tryck

---

**A D R E S S • A D R E S • N A V N Î Ş A N**  
c/o Tayfun, Hyppingeplan 21, 2 tr., 163 62 Spånga • SWEDEN  
**TELEFON** +46 (08) 760 69 38 **TELEFAX** +46 (08) 711 08 36

# JÛYAN Û BERHEMÊN EHMEDE XANÎ (1650-1707)

Prof. Joyce Blau

*Ev gotar di 27. 5. 1995'an de, di Konferansa Ehmedê Xanî de, li Stockholmê hatibû pêşkêşkirin. Konferansa Ehmedê Xanî, ji alî Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê û ABF'ê ve hatibû amadekirin.*

**B**erî her tiştî ez dixwazim ji we re bêjim, ji ber ku ez di nav we de me, ez gelekî bextiyar im. Ji ber ku ez dawetî ve civînê kirime ez sipasî Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê, herwehasipasî Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê û Federasyona Perwerdekariya Karkeran a Swêdê (ABF) dikim.

Gava ku hevalê min Malmîsanij ji min xwast da ku ez bêm û derheqê *Mem û Zînê* de bipeyivim, min ji xwe pirs kir: Gelo ji wan hemî tiştên ku derheqê şahesera şa'irê Kurd Ehmedê Xanî, *Mem û Zînê* de ji alî bisporên Kurd ên mîna Mehmet Emîn Bozarslan, Ferhad Shakely [Ferhad Şakelî], 'Elaeddîn Siccadî, 'Îzzeddîn Mistefa Resûl, Hejar, Perwîz Cihanî û gelekên din hatine gotin yan jî hatine nivîsandin û weşandin zêdetir ez dikarim çî ji we re bibêjim.

Di axaftina xwe de, ez dê giranîyê bidim ser çend babetên ku hîn jî kêm yan jî şaş tî zanîn: jiyana şa'ir, şertên nivîsandina *Mem û Zînê* û teknîka menzûmî ya vî berhemî ku xwediyê xwe kiriye nemir, mîna Fîrdewsî li ba Farisan yan jî Homeros li ba Yûnaniyan.

Ehmed Xanî kî ye? Ez ditirsim ku carna ji navê wî pê ve derheqê wî de tişt nayên zanîn. Dîsa jî bi mezîniya xwe ew, hemî şa'irên din ên klasîk li paş xwe dihêle, ji ber ku ew hem westayê destan û şî'ra lîrîk, hem jî yê fikr û şîklê ye. Ew sofîyek, filozofek bû ku rewşa merivan fêhm dikir û xwe mîna wan hîs dikir.

Em nizanin ka berhemê Ehmedê Xanî, piştî mirina wî bi temamî ma yan na. Wisa xuya dike ku hunermendiya wî ya destanî serkeftîtir bûye ji berhemên wî yên lîrîk ên ku belkî jê tenê çend perçe mane.

Berhemê bingehîn ê şa'ir, *Mem û Zîn*-a ku îsal em sêedsaliya wê pîroz dikin-menzûmeke dirêj e ku ji 2655 beytan pêk tê, ji alî wênegeriya şa'irane û sehneyên

lîrîkî ve dewlemend e û teknîkeke şa'irane ya ku ji zû de pêkhatibû diyar dike, [herweha] kamiliya terîmên (te'bîrên) ku bi awakî vekirî hebûna derbasbûyî ya edebî eşkere dikin, nîşan dide.

Ehmedê Xanî herweha nivîskarê ferhengeke 'Erebî-Kurdî ya bi navê *Nûbar* (*Nûbuhar, yan jî Nûbuhara Biçûkan*) e ku jibo zarokên Kurd hatiye amadekirin da ku ew hîni 'Erebî bibin. Me'nayên 950 peyvikên 'Erebî, bi Kurdî hatine nivîsîn. Ev ferheng bi awakî bi qafiye ye û li gor babetan ji 14 beşan pêk tê; di tarîxa ferhengnasiya (leksikografiya) Kurdî de wek ferhenga yekem tê hesibandin.<sup>1</sup> Herweha Ehmedê Xanî *'Eqîda Îmanê* ya ku ji 73 beytan pêk tê û xezelên bi Kurdî, Tirkî, Farisî jî nivîsîne.

Jibo ku bispor edebiyata Kurdî keşf bikin, diviya heta nivê sedsala XIX'an bihata sekinîn. Wê demê Kurdnasî di destpêka xwe de bû û fikrê serdest ew bû ku Kurd gelekî bînvîs in û nikanin edebiyatekê biafirînin.

Lêkolînerê Rûs, V. Dittel -yek ji kesên pêşîn e ku behsa edebiyata Kurdî kiriye- ji ber keşfkirina hebûna edebiyateke Kurdî ya dewlemend a orîjînal matmayîna xwe nivîsî: "Min hîç nedipa ku zimanê 'eşîrên Kurdan ê ku ji alî rojhelatnasan ewende kêr tê naskirin, bikanibe li kêleka edebiyata devkî edebiyateke nivîskî ya ewende dewlemend derxe". Lê wî domand: "Kurd xwedî edebiyat in, piçek orîjînal, piçek ji çavkaniyên Farisî".<sup>2</sup>

Piştî deh salan (di 1858'an de), Kurdnasekî din ê Rûs, Piotr Lerch (1828-1884) tişteki din digot: "Kurdan edebiyata xwe ya taybetî neafirandine, ji ber ku ew di yekbûn û bidestxistina serbixwebûna xwe de bi ser neketine. Digel viya jî xwedî giyaneke jîndar û bimeraq in, ji wan bextê hinekan dest da ku hîni kultura gelên cîran 'Ereb, Faris û Tirk bibin. Yên dawîn di pêşketina întellektuelên Kurdan de alîkar bûne..."<sup>3</sup>

Jibo birêkûpêkkirina lêkolîna edebiyata Kurdî ya nivîskî ya Dema Navîn, qedrê herî mezin bi zanayê bi 'eslê xwe Polonî, dîplomatê meqambilind, bisporê ronak, berhevkarê (kolleksiyonê) bêwestan ê destnivîsên Kurdî, Alexandre D. Jaba (1801-1894, li Îzmîrê mir) re careke din diyar bû.

Rûsyaya çarî, bo firehkirina desthilatdariya xwe li Qafkasyayê, ji qelsketin û paşdeçûyina Împeratoriya Osmanî û Îranî îstifade kir. Leşkerên (orduyên) Rûsya bi 'asiyên Kurd re, bi parêzkarên sînorên van Împeratoriyan re ku pirr bi kêrî Rûsya hatin, têkilî danîn û Akademiya Çarî ya Zanistan a St. Petersburgê bû yekemîn merkeza Kurdnasiyê ya dinyayê.

Dema ku Alexandre Jaba di 1848'an de bû konsulê Rûsya yê Erzeromê, Akademisyen B. Dorn pêşniyar kir da ku ew jibo hînbûna *Kurmançî* ji konsulîya xwe ya li welatê Kurdan îstifade bike. Ji wê rojê şûn de, A. Jaba hemî wextê xwe yê vala jibo hînbûn û berhevkirina materyalên li ser ziman, edebiyat û tarîxa gelê Kurd terxan kir; wî dê ev karê xwe heta dawîya jiyana xwe bidomanda.

A. Jaba dest pê kir bi zanayên Kurd re têkilî danî, ku herî bijarteyê wan Mehmûd Efendî Bayezîdî gelek alîkariya wî kir. Mehmûd Efendî êdî merivekî pîr, nêzî şêst salî bû. Di 1797'an de li Bayezîdê ji diya xwe bûbû, li vî bajarî dest bi xwendina xwe kiribû, paşê li Tewrêzê (Tebrîzê) dom kiribû. Qur'an, edebiyata 'Erebî, Farisî û Tirkî xwendibû. Piştî ku li seranserê Kurdistanê gerriya, vegeriya Bayezîdê, ku li wir medreseyek îdare dikir. Dema ku mîrîtiya Kurdî ya Bayezîdê têk çû, Mela Mehmûd li Erzeromê bi cî bû, ku li wir karê "xoca" tî dikir. Wê demê di nav 'alimên welêt de gelek qedrê wî hebû. Mela Mehmûd, jibo A. Jaba mamostayekî bêhempa, jibo berhevkirina destnivîsan hevkarê jêhatî bû, kopîst (mustensix) û wergêrê wî bû. Ew herweha nivîskarê lêkolînên girîng jî bû, mîna: *'Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyye* û wergera Kurmancî ya *Şerefnameya Mîr Şeref Xanê Bedlîsî*.<sup>4</sup>

Alexandre Jaba encamên lêgerînên xwe yên li ser ziman û şaristaniyeta Kurdan bi awakî rêkûpek ji Akademiya Çarî ya Zanistan a St. Petersburgê re şandin. Wî bi hevkarîya Mehmûd Efendîyê Bayezîdî kolleksiyoneke yekta ya ji 57 perçeyan pêkhatî berhev kir. Ev kolleksiyona ku di 1868'an de gihaye Kutubxaneyê Giştî ya Çarî ya St. Petersburgê, bi pirranî ji berhemên şa'irên Kurd ên Dema Navîn, wek yên Feqiyê Teyran, Melayê Batê, Melayê Cizîrî û şahkarê şî'ra Kurdî *Mem û Zînê*<sup>5</sup> pêk tê. Di nav vê kolleksiyonê de herweha destnivîsên yekta yên şa'ir Xarîs Bitlîsî, Selîm ibn Silêman (Ûsib û Zelîxe, sedsala XVI'an), Remedanî, Murad Xan Bitlîsî û hwd. hene. Ev xezîna rastikên (rastîn) a jibo lêger û bisporên edebiyata Kurdî, demeke dirêj hatibû jibîrkin; bes di destpêka salên 1960'î de ji alî lêkolînera Ukraynayî Margaret B. Rudenko<sup>6</sup> -ku paşê çend heb ji van tekstan weşandin-<sup>7</sup> ve hat keşfîkirin.

Derheqê jiyana Ehmedê Xanî de çavkaniya me ya pêşîn a agahdarîyê, kurtenivîsa ku ji alî Mehmûd Efendî Bayezîdî hatiye nivîsîn e û Alexandre Jaba ew [kurtenivîs] di kitêba *Recueil de notices et récits kourdes, servant à la connaissance de la langue, de la littérature et des tribus du Kourdistan* -ku bi emrê Akademiya Çarî ya Zanistan di 1860'î de li St. Petersburgê hat çapîkirin- de weşandiye. Li wir em dixwînin: "... Eslê wî [Ehmedê Xanî] jî ji tayifeya Hekariyan ji 'eşîreta Xaniyan e. Bixu hatiye Bazîdê di tarîxa hezarî da tewettun kiriye. Di zimanê Kurmancî da Mem û Zîn nav kitêbek 'aşîq me'şûqan gotiye û kitêbek luxetê jî bi Kurmancî û 'Erebî gotiye, navê [wê] Nûbihar e û zarûkê di Kurdistanê hemû di piştî Qur'anê dixûnin û zehf jî xezeliyat û eş'aran û beyt bi zimanê Kurmancî gotiye û di zimanê 'Erebî û Farisî û Tirkî [de] jî dîsan xezeliyat û eş'aran û ebyat zehf gotiye û di 'ulûmê funûnan [de] jî qewî mahîr û sahib'irfan e û ji şu'erayêd Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û fayîq e belkî ji hemî şu'eran meqbûl û memdûh e û di hezar û şêst û se da jî merhûm bûye û di nêv Bazîdê da mizgevtêk jî bi navê xu bîna kirîye û bi xu jî li kinarê mizgevtê medfûn e we ullahû e'lem."

Ev belgeya kurt gelek girîng e, çunkî tarîxa giştî ya Kurdan a sedsala XVII û XVIII'an hîn jî baş nayê naskirin û ev jî xebata tarîxa edebiyata Kurdî zehmet dike.

Sedsala XVI'an, di tarîxa herême de guherîneke rastikên nîşan dabû. Di destpêka vê sedsalê de Şah Îsmailê Sefewî, ne tenê hakimê Îrana Rojavayê, herweha yê Ermenistanê, Mezopotamyayê û yê Bexdadê bû. Jibo ku ji Sultan-Xelifeyê Osmanî yê Sunnî -ku li Îstebolê dima- re serî netewîne, Şîitî wek dîne nû yê Dewleta Sefewî qebûl kir. Mezinbûna Dewleta Sefewî ber bi rojava, piştî şerrê Çaldiranê (1514) yê navdar, bi temamî hatibû sekinandin. Di wî şerrî de, mîrên Kurdan hemberî Sefewiyan bi awakî qet'î piştgiriya Sultanê Osmanî, Selîm kirin. Wê demê perçeyê herî mezin ê Kurdistanê di bin bandûra Osmaniyan de bû.

Kurdistan bû ciyê şerrên bêdawîyên navbeyna împeratoriyeke Îranê û Osmaniyan û Kurd ligor peymana ku bi Sultan Selîm re çêkiribûn, beşdarî van şerran bûn. Bajarên Kurdan ku dê bikaribûna bibin kakilê dewleteke Kurdî, hatibûn wêrankirin û hejmara Kurdan kêm dibû.

Di dema Ehmedê Xanî de, Kurdistana Mezin a ku Şerefeddîn Xan di dawiya sedsala XVI'an de wek hejmareke mîrîtiyên Kurd ên otonom behs dike, jiber şerrên berdewam piçûk bûbû û bi taybetî nufûsa Kurdan bi xisarên mezin kêm bûbû. Di vê periyodê de edebiyatek pêş de diçe ku tê de, di awayê teswîrkirina bûyerên jiyana rojane û karakterên kesane de, di hewla îfadekirina rastiya tarîxî ya konkret de, meyla îfadekirina rastiyê xwe nîşan dide.

Di vê rewşê de şa'ir Ehmedê Xanî *Mem û Zîn*, destana romanesk (mîna roman) a ku tê de çarenûsa giştî ya gelê Kurd ciyê xwe ji drameke şexsî ya qehremanan re dihêle, nivîsî. Çiroka xembar a Memê û Zîn a dotmîr bûye semboleke millî û îfadeyên welatperwerî tê de gelek in.

Bo ku sedema nivîsandina vê kitêbê diyar bike em gotinê ji Ehmedê Xanî re dihêlin:<sup>8</sup>

235 Xanî ji kemalê bêkemaî	Meydanê kemalê dît xalî
236 Ye'nî ne ji qabil û feqîrî	Belkî bi te'essub û 'eşîrî
237 Hasil ji 'inad eger ji bêdad	Ev bid'et kir xilafê mu'tad

Çi ye ev bid'et, ev "karê nû, yan jî gunehkarî"? Ev, bijartina nivîsandina bi Kurmancî ye. Heta wê demê, li Anadoluyê, li Îranê û hetta li ciyên dûr ên mîna Hindistanê,<sup>9</sup> zimanê Farisî yê ku bi sedsalan e pêkhatibû, bûbû wasiteya edebiyateke hêzdar û aleta ragihandinê; ne tenê di hemî cîhana Îranê de herweha di beşekî mezin ê Asyayê de. Farisî roleke dilîst ku mîna rola 'Erebî di nav gelên Misilman de di sedsalên pêşîn ên hicrî de yan jî rola Frensî li Awrûpayê di sedsala XVIII'an de bû. Şa'ir û nivîskarên ku ji sinifên serdest dihatin bi Farisî dinivîsandin. Hekîm Îdrîsê Bedlîsî yê Kurd (mirina wî: 926/1520) *Heşt Beheşt* a ku cara pêşîn behsa sultanên pêşîn ên Osmanî dike bi Farisî nivîsî. Herweha, hakimê mîrîtiya Kurdî ya Bedlîsê, Mîr Şeref Xan ibn Şemseddîn Bedlîsî (1543-1604) di dawiya sedsala XVI'an de



Şrefname yan "Tarîxê Mofesselê Kordestan" ku îro jî derheqê tarîxa Dema Navîn a Kurdan de çavkaniya bingehîn e, bi Farisî nivîsî.

Nivîsîna bi Kurdî bê zehmetî nebû. Şa'ir dibêje:

355 Ez pêlewer im ne gewherî me	Xodreste me ez, ne perwerî me
356 Kurmanc im û kohî û kinarî	Van çend xeberêd Kurdewarî
357 Îmza bikin ew bi husnê eltaf	Esxa bibin ew bi sem'ê insaf

Ew şîrove dike:

238 Safî şemirand vexwar durdî	Manendê durrê lisanê Kurdî
239 Înaye nizam û intizamê	Kêşaye cefa jiboyê 'amê
240 Da xelqê nebêjtin ku Ekrad	Bême'rîfet in, bêsl û binyad

Lê, şa'ir gazinan dike ku Kurd xwedî padîşahekî zana ninin ku li dor wî bicivin, padîşahekî ku piştgirê 'ilm û edebiyatê bibe tune. Eger ev îmkan hebûya, wê demê:

250 Min dê 'elema kelmê mewzûn	'Alî bikira li banê gerdûn
251 Bîna ve rûhê Melayê Cizîrî	Pê hey bikira 'Elî Herîrî
252 Keyfek we bida Feqiyê Teyran	Hetta bi ebed bimaye heyran

Bi van rêzan, Ehmedê Xanî pêşiyên xwe qebûl dike. Ew lawê me'newî yê 'Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û bi taybetî jî yê Feqiyê Teyran ê şa'ir e. Wek sê pêşiyên xwe, şa'irê me ji rîska dev ji 'adeta bicibûyî û qanûnên edebî yên dema xwe berdanê xwe nade paş û bi Kurmancî dinivîse. Bi rastî jî Şêx Ehmed Nîşanî (1570-1640) yê ku zêdetir bi navê Melayê Cizîrî hatiye naskirin û ji Cizîra Botan e -wê demê mîrê mîrîtiya Cizîra Botan 'Îmadeddîn ê hêzdar bû-, dîwaneke gelek navdar li pey xwe hiştiye ku tê de nêzî 2000 beyt hene û li medreseyên Kurdistanê timî hatiye xwendin. Ev dîwan ji qesîde (menzûmeyên yekqafiyeyî yên 15-30 beytî) û xezelan (menzûmeyên kurt ên 5-12 beytî) pêk tê, şa'ir tê de kurtî, şîrinî, melodiya uslûbê û xweşiya şî'rî digerre. Ber bi dawîya sedsala X'an, sofîyan kiribûn 'adet ku di civînên xwe de xezelan bistrên. Ev, jibo sofîyan wasiteyek bû da ku xwe ji rewşa wecdê re amade bikin. Bi vî awayî xezel ji îlhama sofîyane pêk hat ku diviya roleke ewqas girîng bilîsta.

Şa'irê ku herî zêde tesîr li Ehmedê Xanî kiribû Muhemmedê Mikisî yê bi nasnavê Feqiyê Teyran (1590-1660) bû. Tê gotin ku, mîna Saint François d'Assise wî jî zimanê çivîkan dizanî. Dibe ew yekem şa'irê Kurd be ku hîkayetên menzûm ên şî'rî yên dirêj bi awayê mesnewî nivîsîne.<sup>10</sup>

Mesnewî menzûmeyek e ku her beyta wê ji du misrayan pêk tê û [her beytek] bi serê xwe ye. *Wezna* (*behra*) du misrayan mîna hev e û qafiyê di nav du misrayan de heye. Metoda mesnewî, di edebiyata Rojavayê de mîna ya "*Canterbury Tales*" (Çîrokên Canterbury) a şa'irê Îngiliz Geoffrey Chaucer (1340-1400) e. Ev form

jibo menzûmeyên destanî yên narratîv (awayê rêgihandinê) yan romanesk (mîna roman) û jibo menzûmeyên hînker (dîdaktîk) ên her tewirên (jenrên) exlaqî, tarîxî, doktrîna dînî hatibû bikaranîn. Ev form gelek caran jibo fêrkirina sofîyan hatiye bikaranîn. Hikayeta menzûm ji destpêka sedsala XI'an vir de elaqeyeke mezin dîtîbû.

Ehmedê Xanî minnetdarê pêşengên mezin ên vê tewira (jenra) menzûm bû. Piştî ku wî bi awakî dilşikiyayî, xemsariya zihniyeta menfe'etperestane û çavbirçîtiya hemwelatîyên xwe dît, weha nivîsî:

256 Ger 'ilmê tamam bidî bi pûlek      Û bifiroşî tu hikmetê bi solek  
257 Kes nakete mîterê xwe Camî      Ranagirtin kesek Nîzamî

Ehmedê Xanî navê Nîzamî û Camî dibêje, du şa'irên ku navdariya wan bêsînor bû û bêhejmar kesî dixwest wan teqlîd bike. Wan "medreseya Azerbaycanê" (ekola Azerbaycanê) vejand ku bingehê wê ji alî şa'irê lîrîk Qetranê Tebrîzî (piştî 1072'yan mir) hatibû danîn. Qetranê Tebrîzî, ji hakimê Gence yê Kurd re xizmet kiribû. Gence, li piştqafqasyayê paytextê malbara Kurd a navdar, Şeddadiyan bû ku wan ji 951'ê heta 1075'an 124 salan li wî aliyê çemê Arasê, di herêmeke fireh de hukum kiribû. Şaxekî din ê Şeddadiyan ji 1064'an heta 1198'an li bajarê Xirîstiyânên Ermenî, Anî ya ku bi 1001 kilîseyên xwe navdar e hukum kir. Şeddadiyan bi çalakîyên xwe yên cengdarî û aştiyane bi cîranên xwe yên Xirîstiyân re ketibûn rêkiliyê: Bi Ermenî û Gurcîyan re û bi dagîrkerên din ên mîna Alan û Ûrisan re, ku ji bakurê dihatin.

Nîzamî (Celaeddîn ibn Yûsif) li Genceyê ji diya xwe buye (535/1140 - di 599/1203'an de di 63 saliya xwe de mir). Diya wî Kurd bû. Yê ku tewira (jenra) mesnewiya menzûm a bi awakî serkeftî bi destana romanesk a menzûm re lihevhatî nivîsiye ew e. *Xemseya* wî ya navdar ji pênc menzûmeyên romanesk pêk tê, ku ji wan *Xosrew û Şîrîn* çîroka evîna şahê Sasaniyan Xosrew û dildara wî şahbanûya Ermenî ye; *Leyl û Mecnûn* îlhama ji edebiyata 'Erebî ya berî Îslamê ye ku fikra Nîzamî ya li ser evîna herî pak pirr baş temsîl dike.

Ehmedê Xanî herweha behsa Camî jî dike. Camî (Nureddîn 'Ebdulrehman, di 1414'an de, li Camê, li herêma Heratê -ya ku demekê paytextê Xorasanê bû- ji diya xwe bûye û sala 1492'yan miriye), şa'irê dawîn ê Farisîya dema klasik e ku bi berhemekî xwe -ku hem di edebiyata Farisî de hem jî di doktrîna sofîtiya li ser bingeha Îbnî 'Erebî de dewlemend e- pirr balkêş e. Ev şa'ir, bi pêşkêşkirina tewirên (jenrên) edebî yên Farisî liserhev, bi îlhamdanê jibo nîfşekî nû, gelek xwedîtesîr bû.

Jibo nivîsandina kitêba xwe, yek ji abîdeyên edebiyata devkî ya Kurdî -Mem û Zîn yan jî Memê Alan- ji xwe re wek bingeh girt. Ew efsaneyeke kevn e ku tê de tiştên çîrokî û xeyalî tevîhev dibin û behsa evîna pak û îlahî ya mîrê Kurdan Memî û dotmîr Zînê dike.<sup>11</sup> Bi amadekirina vî berhemî amanca Ehmedê Xanî ew bû ku

berhemek Kurdî binivîse da ku bibe destpêka edebiyateke nû û li ba birayên xwe hişeke (şu'ûreke) millî peyda bike.

Ehmedê Xanî, jibo nivîsandina menzûmeya xwe dibe ku ji çîroka *Leyla û Mecnûn* a Nizamiyê Genceyî ya ku menzûmeya dirêj a ji 4000 beytan pêkhatî ye û perçeyeke *Xemseya* navdar e, îlham girtibe. Bêguman wî awayê mesnewî bijart ku pêşkêşkirina çîrokekê hêsan dikir û jibo şî'ra destanê herî munasib ew bû. Di mesnewî de her beytek ji du misrayan pêk tê, di her misrayê de bi qasî hev pê hene. Misra yekem û duyem bi hev re bi qafiyê ne (*qafiyê: 'erûz û derb*).

*Wezn (behr)* a ku Ehmedê Xanî bijartîye, ew wezn e ku Nîzamî di *Leyl û Mecnûn* axwe de bikar anîye, yanî *hezecê* ku yek ji qalibên *wezna şî'ra 'Erebî-Farisî* ye. *Hezec*<sup>12</sup> qaliba *wezna* herî fireh e û dest dide ku şa'ir bi dehan *pêyên* cihê, herweha îmkanên cihê bikar bîne. Her qaliba *hezecê*, di misrayekê de herî kêr ji sê *pêyan* û herî zêde ji pênc *pêyan* pêk tê. Ev, *wezneke* populer, kurt, sivik, ahengdar (muzîkal) û lezkî (bilez) ye ku pirr baş li zimanê Kurdî tê. *Hezecê museddes* (hezeca şeşî) yan jî heke meriv rasttira wê bêje *hezecê exrebê museddesê meqbûzê mehfûz* wisa pêk hatiye:

\_ \_ o / o \_ o \_ / o \_ \_ //  
mef : 'û: lu / mu: fâ: 'i: lun / fa: 'û: lun

\_ \_ o / o \_ o \_ / o \_ \_ //  
mef : 'û: lu me: fâ: 'i: lun / fa: 'û: lun

Ehmedê Xanî çar problemên herî girîng formule û pêşkêş kirine û jibo bersîvê danîne pêş edebiyata Kurdî: fonksiyonên nivîsê, rola şî'rê, têkiliyên di navbeyna ziman, edebiyat û civatê de û ya dawîn jî statuya ziman bi xwe.

Ez axaftina xwe bi çend beytên Ehmedê Xanî diqedînim:

- |                                   |                                |
|-----------------------------------|--------------------------------|
| 342 Ev mêwe, eger ne abdar e      | Kurmancî ye ew qeder li kar e  |
| 343 Ev tifle, eger ne nazenîn e   | Nûbar e qewî bi min şîrîn e    |
| 344 Ev mêwe, eger ne pirr lezîz e | Ev tifle bi min qewî 'ezîz e   |
| 345 Mehbûb û libas û gûşwar e     | Milkê di min in, ne miste'ar e |

Yê ku ji Frensî wergerandiye:  
M. Malmîsanij

---

<sup>1</sup> Di nivîsandina vî berhemî de dibe ku ji ferhenga menzûm a 'Erebî-Farisîya Ferahî [Ebû Nesr Mes'ûd, di 1242'yan de miriye] ya bi navê *Nisab el-Sibyan* îlham hatibe girtin. Binêre Mémoire de Diplôme d'Études Approfondies ku pêşkêşî Université de Paris III, Sorbonne Nouvelle bûye: Ameen Ghazi, *Littérature kurde, Ahmadé Xanî (1650-1707), Texte, analyse, commentaire et traduction du glossaire "Nû bâr-â buçukân"*, Paris, 1985.

<sup>2</sup> Bide ber (Cf.): Destpêka "*Aperçu sommaire de trois ans de voyage en Asie, dans le Caucase, la Perse, le Kurdistan, la Mésopotamie*", in: *Nouvelles Annales de Voyages*, (Paris), 1849, cild 3, rr. 141-168.

<sup>3</sup> Bide ber: Compte-rendu des publications de la Bibliothèque Impériale, 1868. Bide ber: M. B. Rudenko, *Literaturnaja i fol'klornye Versii kurdskoj poemy "Yusuf i Zelixa"* (Versiyonên Edebî û Zargotinî yên Menzûmeya Kurdî "Yûsuf û Zelîxa"), ed. NAUKA, Moskova, 1986, r. 4.

<sup>4</sup> Şerefeddîn, di 1596'an de *Şerefnameya* xwe ya ku îthafî Sultan Mehmet ê Sêyem kiribû, nivîsî.

<sup>5</sup> Ji alî Muhemmed Xerîb Silêman hatiye kopyakirin. Dibe ku Muhemed Xerîb Silêman, yek ji nasnavên Mehmûd Efendî Bayezîdî be.

<sup>6</sup> M. B. Rudenko, *Opisanie Kurdskoj Rukopisei Leningradskoj* (Teswîra Destnivîsên Kurdî yên Kolleksiyona Lenîngradê), Moskova, 1961.

<sup>7</sup> *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn*, Moskova, 1962; *Feqî Teyran, Şêx Sen'an*, Moskova, 1965; *Harîs Bitlîsî, Leylî û Mecnûn*, Moskova, 1965.

<sup>8</sup> Jibo menzûmeya Ehmedê Xanî me ji xwe ra kitêba M. B. Rudenko bingeh qebûl kir: *Ahmed Xanî, Mem i Zîn*, Enstituya Gelên Asyayê, Moscou, 1962.

<sup>9</sup> Bide ber: Emîr Xosrewê Delhî [1253-1324].

<sup>10</sup> Wî, berhemên xwe bi herfên "Mîm Hey" îmza kirine: *Hikayeta Şêxê Sen'anî, Qiseya Bersiyayî, Qewlê Hespê Reş*.

<sup>11</sup> Li xebatên bingehîn ên bisporê vê destanê Michael Chyet û bi taybetî ji teza wê ya çapnebûyî binêre: *And a thornbush sprang up between them: Studies on "Mem û Zîn", a Kurdish romance* (volumes I and II), University of California, Berkeley, 1991, U. M. I. Dissertation Information Service.

<sup>12</sup> Xelîl *hezec* kiriye 6° beş.

# MEM Û ZÎN KENGÊ JİYANE?

Mûrad Ciwan

**G**ellek ji wan kesên ku li ser Mem û Zîna Ahmedê Xanî rawestiyane behsa wê yekê nekirine ku gelo evîndariya Mem û Zînê buyereke efsanewî ye an rastiyeke dîrokî ye. Herwekî ku tê zanîn ji bilî Mem û Zîna Ahmedê Xanî, destaneke din a evîna navbera Mem û Zînê heye, bi navê "Memê Alan". Ev destaneke folklorî ye û buyer û motîfên dîrokî û efsanewî tê de têkilî hev dibin.

Heta Nûreddîn Zaza di Memê Alanî de koka vê destanê digihîne destaneke meşhûr a dema Împaratoriya Medan. Li ser vê yekê jî îddîa dike ku Ahmedê Xanî, Mem û Zîna xwe li ber vê destana mîtolojîk a folklorîk hûnandiye. Lê rexne li Ahmedê Xanî digre ku ji bo çî ew vê rastiye înkâr dike. Li gorî Nûreddîn Zaza, Ahmedê Xanî di Mem û Zînê de bi van malikên jêrin dide diyarkirin ku Mem û Zîn bi her awayî esera wî ye, ji tu kesî nehatiye sitandin:

Ev name eger xirab e, ger qenc  
Kêşaye digel wê min dused renc  
Nûbare ye, tîfl e, nûresîd e  
Herçendî nehin qewî guzîde  
Lê min ji rezan nekir temetu'  
Manendê dîzan bikin tetebbu'

.....

Mehbûb e lîbas û goşîwar e  
Milkêd min in ne muste'ar e  
Elfaz û me'anî û îbarat  
Înşa' û mebanî û îşarat  
Mewzû' û meqasid û hîkayet

Mermûz û menaqib û dîrayet  
Uslûb û sifet û me'ne û lefz  
Esla nekirin me yek ji wan qerz  
Bilcumle netaicêd fikr in  
Dûşîze û nû'erûs û bikr in

Bi baweriya me, gava di malikên jorîn de Ahmedê Xanî behsa wê yekê dike ku ev eser ji kesî nehatiye deynkirin û bi hemû awayên xwe encamên fikrên wî ne, qesda wî jê ne ew e ku bixwaze bibêje ku efsaneyeke welê tunebuye û wî ev ji ber xwe afirandiye. Na, bi 'eks, ew di Mem û Zîna xwe de eşkere diyar dike ku efsaneyeke wiha di nav miletî de heye, lê ew dixwaze vê efsaneyê bi felsefe û hunermendîyeke bilindtir ji nû ve vejîne:

Sazê dilê kul bi zîr û bem bit  
Sazendeyê işqê Zîn û Mem bit  
Şerha xemê dil bikim fesane  
Zînê û Memê bikim behane  
Nexmê we ji perdeyê derînim  
Zînê û Memê ji nû vejînim  
Me'lûl bûyîn hebîb û 'uşşaq  
Îrohe wakî tebîbê h'azaq  
Derman bikim ez ewan dewa kim  
Wan bêmededan ji nû ve rakim  
Derdê di dilê Memê cîgerrêş  
Zîna ji derûnê dil cefakêş  
Wê perdegîya 'efîf û mestûr  
Wî bêgunehê ji tuhmetê dûr  
Meşhûr bikim bi terz û uslûb  
Mumtaz bibin muhib û mehbûb  
Ew renga bikim ji nû serefraz  
Da bêne temaşayê nezernaz  
Dilber li Memê bikin girînê  
Aşiq bikenin bi derdê Zînê  
Hemderd bikin bi wan sefayê  
Bêderd bikevne h'elwelayê  
Xelqê ku ji sîne û ji dil saf  
Pakîzesirişt û ehlê însaf  
Bilcumle bikin ji bo me tehsîn  
Bêjin ku "Bi qencî hate tedwîn".

Heta ew dide xwiyakirin ku çîrokbêjekî (rawiyekî) ev destan ji wî re gotiye û ew jî ji devê wî neqil dike:

Neqqaşê sehîfeyê hîkayet  
Neqqadê sebîkeyê rîwayet  
Kêşa bi vê terhê resm û ayîn  
Lê da bi vê terzê derb û tezyîn  
Go: Padîşahek zemanê sabîq  
Rabû di hukumeta xwe faîq

.....

Çîroka Mem û Zînê di esera Ahmedê Xanî de bi vî awayî dest pê dike û dewam dike. Di hin derên din ên Mem û Zînê de jî behsa rawiyekî tê kirin ku xwedêgiravî çîrok ji Ahmedê Xanî re gotiye.

Bi baweriya me, gava Ahmedê Xanî îddîa dike ku wî ev eser ji kesekî deyn nekiriye qesda wî jê ew e ku wî, wekî hin şairên din ên wê demê, çîroka miletekî din, ji ber esera şairekî din negirtiye. Wê demê dihat dîtîn ku gellek şairan Leyla û Mecnûn, Yûsuf û Zuleyxa, Ferhad û Şîrîn û destanên mayîn ji ber esera şairekî din digirtin û bi navê esera xwe pêşkêş dikirin. Ahmedê Xanî bi wan malikên xwe yên ku me li jorê dan, dixwaze bêje ku min malzemeyê xav ne ji çîroka miletekî din lê ji ya miletê xwe girt ku heta niha tu kesî ew nehûnandiye, loma jî min ew ji ber tu şairî wernegirtiye, ev malzemeyê xav min bi xwe hûnandiye, bi her awayî netîceya fikra min e.

Loma jî meriv nikare îddîa bike ku Ahmedê Xanî hebûna destana Mem û Zînê înkâr dike û wê dike malê xwe.

Beriya Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî jî di şî' reke xwe de bi pesindayin behsa navê Mem û Zînê tîne, ku di vê meqalê de piçekî li jêr, bi wesîleyeke din em ê li ser vê şî'rê rawestin.

Abdulreqîb Yûsuf di esera xwe ya bi navê Hunerê Tabloyên Şerefnamê de, gava li ser bîst tabloyên rengîn ên mînyaturî radiweste -ku ev tablo di kitêba destnivîs a Şeref Xanê Bedlîsî ya bi navê Şerefnameyê de bicihbûne- (*nivîskar îddîa dike ku hem beşekî girîng ê vê destnivîsê, hem jî bîst tabloyên mînyaturî ihtîmaleke mezin ji destê Mîr Şeref Xan bi xwe derketine*) behsa wê yekê dike ku tabloya pêncan (*ku di çapa Jîna Nû ya kitêba Abdulreqîb Yûsufî de bi şaşîti wekî tabloya çaran derketiye*) dêmena Cizîra Botan û ya Mem û Zînê ye. Gava meriv bala xwe dide tabloyê, meriv dibîne ku tablo jibo ku gellekî berî Ahmedê Xanî hatiye teswîrkirin ne li gorî teswîrên kitêba Mem û Zînê ye lê li gorî varyanta gelêrî ye ku bi navê Memê Alanî hatiye naskirin<sup>1</sup>.

Hin lêkolîner û nivîskar jî hene ku buyera evîndariya Mem û Zînê rastiyeke dîrokî dizanin û hetta tarîxa vê buyerê jî didin.

Ji van yek 'Elaeddîn Seccadî ye, yê din Abdulreqîb Yûsuf e.



**Cizira Botan û Mem û Zin**

(Çavkanî: Abdulreşîb Yusuf, Hunerê Tablayên Şerefnamê, Weşanên Jina Nû)



'Elaeddîn Seccadî di Mêjûyî Edebî Kurdî de dinivîse ku: *"Le dewrûberî 1350 mîladî da Emîr Ziyeddîn -nawêkî Kurd hebû- ke dûr niye şwênî danîştinî le dewrûberî Xelîcî Eskenderûne bûbêt we fermanrewayî beser hemû welatî Botan a kirdibêt- du kiçî perîamêzî hebûwe; yekî Stî û yekî Zîn..."*<sup>2</sup>

Mamoste Abdulreqîb Yûsuf, di kitêba xwe ya bi navê Dîwana Kurmancî de (ev kitêb di 1988'an de li Swêdê ji alî Weşanxana Jîna Nû bi navê Şairên Klasik ên Kurd careke din hate çapkirin) fotografekî gorrekê çap dike ku kêla wê xwiya dike. Li ser kêla gorrê reqema 854'an heye. Mamoste Abdulreqîb Yûsuf dinivîse ku ev fotografê gorra Mem û Zînê ye ku li Cizîrê li nav Medresa Mîr 'Evdalî, li jêrmînekê ye û ew reqema li ser kêlê jî tarîxa hîcrî ya mirina Mem û Zînê ye. Herçî di fotografê de ne diyar e ji Abdulreqîb Yûsuf diyar dike ku gorreke din jî li rex wê gorrê heye û li nav xelkê Cizîra Botan belav e ku ev gorr jî ya Beko ye.<sup>3</sup>

Nexwe li gorî vê tesbîtê Mem û Zîn di 854'ê hîcrî/1451'ê mîladî de mirine. Di nota binî ya li ser vê nivîsê de Abdulreqîb Yûsuf wiha dinivîse:

*"Ev medrese [qesd jê medresa Mîr Evdalî ye] wek ku ji navê wê tê zanîn, Mîr 'Evdal (El Emîr Ebdal) avakiriye. Lê ew mîr kî ye û di kîjan çerxê de jiyaye, baş nayê zanîn. Ewqas tenê tê zanîn ku ji çerxa 8'ê hîcrî (14'ê mîladî) heta 1014'ê hîcrî (1605'ê mîladî) du kes bi navê Mîr Evdal bûne mîrê Cizîrê.*

*Mîr 'Evdalê yekem berî sala 796'ê hîcrî (1394'ê mîladî) koç kiriye. Çimkî kurê wî Mîr Îzeddîn di vê salê de mîrê Botan bûye. Herwekî di tarîxa Kurd û Kurdistan di rûpelê 161'an de û di Şerefnamê de hatiye ku wî di sala 804'ê hîcrî de êrîş bariye ser eskerên Tîmûrleng û li dijî wan şer kiriye.*

*Mîr 'Evdalê duyem neviyê Mîr 'Evdalê yekem buye. Mîr 'Evdal, piştî mirina bavê xwe Mîr Îzeddîn, bi veşartî di nav eşîra Hewrex (Ewrex) de maye. Ev Mîr 'Evdal hevçaxê Mîr Şemseddînê kurê Mîr Şerefê kurê Mîr Şemseddînê Mîrê Bedlîsê bûye. Herwekî di Şerefnamê, di rûpelê 165 û 504'an de hatiye, li dorûbera sala 835'ê hîcrî di navbera wî û Mîrê Bedlîsê de rûdanek gewimîye. Piştî vê em tu saloxekê ji vî mîrî nagirin. Li ba min ne dûr e ev Mîr 'Evdal, Mîr Zeydînê birayê Stiya Zîn be. Zeydîn (Zeyneddîn) jî leqeba wî be û jiyabe heta piştî Mem û Zînê û di sala 854'ê hîcrî (1451'ê mîladî) de yan jî piştî vê salê ev medresa han li ser gorra wan ava kiribe. Ev gorra ku li rexê gorra Mem û Zînê ye, ger ne ya Beko be, mumkun e ya Mîr 'Evdal be."<sup>4</sup>*

Li gorî vê, bi hindikayî sed sal ferq di navbera tarîxa 'Elaeddîn Seccadî û ya Abdulreqîb Yûsuf de heye.

Di Mem û Zînê bi xwe de, hin malik hene belkî karibin alîkariya mirovî bikin ku meriv dema jiyana Mem û Zînê û ya Mîr Zeyneddînî texmîn bike. Lê bi şertê ku meriv karibe zanibe ku ev tesbîta ku di Mem û Zînê de hatiye kirin çend nexyalî ye, çend nêzî rastiyê ye.

Ew malik di wê behsê de ye ku gava Beko diçe li ba Mîr Zeyneddînî fesadiya Tacdîn û Memê dike, Mîr aciz dibe, bi Beko re dixeyide ku çima li nik wî fesadiya wan dike û bi van malikên jêrîn pesnê van muhafîzên xwe dide:

Mîr go: "Qe didim eya bedexter  
 Tacdîn û Memê bi textê qeyser?  
 Roja wekû bûye ceng û purxaş  
 Tacdîn û Memê du sed Qizilbaş  
 Bilcumle bi zirx û zend û binper  
 Înan ji me re bi şûr û şeşper."

Nexwe li gorî van malikan, şerek di navbera Qizilbaş û leşkerên Mîrê Botan de çebûye û Memo û Tacdîn du sed Qizilbaş tevî zirx, zend û mertalên wan anîne, di destê wan bi xwe de jî şûr û gurz hebûne.

Gelo çend caran Mîrê Botan bi eskerên Şah Îsmâilê Sefewî re (ku ji wan re Qizilbaş dihate gotin) şer kiriye, ew mîrê ku bi wan re şer kiriye kî ye û ev şer di kîjan tarîxê de qewimiye?

Şah Îsmâilê Sefewî di navbera salên 1501 û 1524'an de şahîti kiriye. Piştî ku Şah Îsmâil di 1508'an de dewleta Aqqoyunliyan hilweşand, Mêrdîn û dorûbera wê kefte destê Sefewiyan. Ustaclû Mehemed Xanê wezîrê Şah Îsmâil di vê tarîxê de hat Mêrdînê û birayê xwe Qerexan rêkir ser Cizîrê. Qerexanî li vê derê herçendî demeke dirêj li hemberî mîrê Cizîrê, Mîr Şeref şer kir jî neşiya Cizîrê bi dest xe.

Cizîr piştî mirina Mîr Şerefi di dewra fermanrewatiya kurê wî (li gorî Şerefnamê birayê wî) Şah Alî de ji alî Sefewiyan hat zeftkirin. Şah Îsmâil baweriya xwe bi Şah Alî neanî, ji dêvla wî birayê Ustaclû Mehemed Xan, Ûlaş Begê anî ser fermanrewatiyê.<sup>5</sup>

Şerê din ew şer e ku Emîr Bedirê kurê Şah Alî bi rola mezin a Îdrîsê Bedlîsî, tevî mîrên din ên Kurdan li hemberî Sefewiyan şer kir, ji bin destê Sefewiyan rizgar bûn, bi Yavuz Sultan Selîmê Osmanî re li hev kirin. Piştî vê buyerê, Cizîra Botan demeke dirêj di bin siya Împaratoriya Osmanî de wekû hukumeteke serbixwe jiya.

Nexwe ku bûyera Mem û Zînê di dewra şerê bi Qizilbaşan re be, herî zûtîrîn di dema Mîr Şerefê kurê Mîr Bedir de yan jî di dema Mîr Bedirê kurê Şah Alî de qewimiye. Ev jî piştî sala 1508'an e.

Em dizanin ku şairê mezin ê Kurd, Melayê Cizîrî jî di şî'reke xwe de bi vî awayî navê Mem û Zînê aniyê:

Mûyekî ji te nadim ez bi du sed Zîn û Şêrînan  
 Çi dibit ger tu hesêb kî me bi Ferhad û Memê?

Li gorî ku tarîx dinivîsin, Melayê Cizîrî sala 1570'an li Cizîrê hatiye dinyayê û di sala 1640'an de miriyê<sup>6</sup>. Heke buyera ku Ahmedê Xanî bi xwe dide rast be, nexwe bi texmînî pêncî-şêst salan berî jidayikbûna Melayê Cizîrî, buyera Mem û Zînê li Cizîrê qewimiye. Helbet Melayê Cizîrî ev şî'r di 'umrekî mezin (belkî bi kêmasî di sîh-çil saliya xwe) de hûnandiyê. Bi vî awayî di navbera buyera şerên bi Sefewiyan re û hûnandina şî'rê de nêzî qirnekî derbas buye. Jibo hin lêkolîneran, demeke qasî

qirnekî, dikare demeke kurt be ku evîneke wekî ya Mem û Zînê bibe evîneke efsanewî û bibe destan, lê di civakeke girtî ya wê demê ya Kurdewarî de qirnek, bes e ku ji bo buyerek bibe efsane û mezintir bibe. Loma jî ew dema ku Ahmedê Xanî bi xwe dide, ji rastiye ne dûr e.

Lê ev tarîx, ne li ya 'Elaeddîn Seccadî, ne jî li ya Abdulreqîb Yûsuf dike ku ew behsa tarîxa mirinekê dike ku li ser kêla gorrê nivîsandî ye.

Tiştê balkêş, ne di dema tarîxa Mîr 'Evdalê duduyan ê ku Abdulreqîb Yûsuf behs dike, ne jî di tarîxa 1350'yê de ku 'Elaeddîn Seccadî behs dike (ihtimal dema Mîr 'Evdalê yekem, yan jî ya mîrê berê wî Emir Bedreddînê kure Emir Îsa ye) behsa tu şerî nayê kirin.

Lê di dema mîrekî de ku navê wî Mîr Îzzeddîn e, şer ligel sultanê Moxoliyan, Timûrlengî derketiye. Şerefname bi dirêjayî behsa vî şerî dike. Ev Mîr Îzzeddîn (*Em ji bîr nekin ku navê mîrê ku di Mem û Zînê de behsa wî tê kirin ne Mîr Îzzeddîn lê Mîr Zeyneddîn e.*) kurê Mîr 'Evdalê yekem e, piştî mirina bavê xwe fermanrewatî xistiye destê xwe û di 1394'an de, 49 salan piştî tarîxa ku 'Elaeddîn Seccadî binav dike li hemberî Timûrleng şer kiriye<sup>7</sup>. Dibe ku di Mem û Zîna Ahmedê Xanî de eskerên Timûrleng û yên Şah Îsmailê Sefewî bi hev hatibin guhertin. Lê divê em bibîr bînin ku ev tarîx dûrî tarîxa ser kêla gorrê ye.

Welhasil, tişteki diyar û bi belge di vê meselê de tune ye. Ger ew tesbîta Abdulreqîb Yûsuf a li ser kêla gorrê rast be, heta tu belgeyên din neyên dîtin agahdariya tekûztir ew e, yên din pirtir nêzî spekulasyonan in.

---

<sup>1</sup> Yûsuf, Abdulreqîb, Hunerê Tabloyên Şerefnamê, Wergêr ji zaravê Soranî: Alîşer, Weşanên Jîna Nû, Swêd, 1991 r.62-67 û tablo nr: 4

<sup>2</sup> Secadî, 'Elaeddîn, Mêjûyî Edebî Kurdî, Kitabfiroşî Me'arif, Serdeşt, 1361, r. 201

<sup>3</sup> Yûsuf, Abdulreqîb, Şairên Klasîk ên Kurd, Weşanxana Jîna Nû, Swêd, 1988, r. 103 û rûpelên dewamê.

<sup>4</sup> e.n.w.d. r: 104

<sup>5</sup> Yurt Ansiklopedisi, Anadolu Yayıncılık A.Ş., İstanbul, 1982-1983, c.8 r. 5765, madda Mardin.

<sup>6</sup> Melayê Cizîrî, Dîwan, Wergera Zeynelabidin Kaya û Mehemed Emîn Narozî, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1987, Pêşgotin r. 21

<sup>7</sup> Şerefname, Şeref Han, Tercuma M. Emin Bozarslan a bi zimanê Tirkî, Hasat Yayınları, İstanbul, 1990, r. 141

# EQÎDEYA ÎSLAMÊ YA EHMEDÊ XANÎ

Zeynelabidîn Zinar



Ger jiyana mirovan berdewam bibe, pê re ziman û çanda wan jî berdewam dibin. Ji ber ku nişa û adana giyana zindiyan, ziman û çanda wan in. Lê dema xeter û kêmayî têkevin ziman û çandê, herweha ew dikevin giyana mirovan jî û hebûna mirovan dikeve erê-natiyê. Îcar mamosre Ehmedê Xanî destûr nedaye ku hinek zimandirêjî bikin û desthelatiya xwe li ser ziman û çanda Kurdî vebigirin. Ji ber hindê ye ku wî bi mêrxasî dest avêtiye xameya rengîn û ji me re wekî **Mem û Zîna** şeng û mîna helbestên xwe yên babetcihê, **Eqîdeya Îmanê** û **Eqîdeya Îslamê** jî nivîsîne, ew ji nîfşên nûhatî re diyarî kirine û mîna sifreyeke raxistî xistine qada çandê.

Jixwe diyar e ku piraniya rewşenbîr û nivîskarên Kurd ên berê, zêdetir helbest û qesîde nivîsîne. Lê Ehmedê Xanî ji nivîsandina helbestan zêdetir, du berhemên xwe wek pexşan (nesr) afirandine. Yek ji wan **Eqîdeya Îmanê** ye. Ew Eqîde, hin caran di çapemeniya kurdî de hatiye xuyakirin. Lê **Eqîdeya Îslamê** kêman caran hatiye xuyakirin. Carekê min ew herdu berhem di kovara Nûbiharê (hejmar 13'an, Çiriya Pêşî 1993'an) de weşandibûn. Wekî din, şênika çapemeniya Kurdî bi **Eqîdeya Îslamê ya Ehmedê Xanî** pirr nehatiye şênkirin.

Heta niha tarîxeke kifş nehatiye peyîtandin ku Ehmedê Xanî kengê ew herdu berhemên xwe nivîsandine. Bi nivîsandina wan Xanî xwestiye ku nîfşên nûhatî bi zimanê xwe ola Bisilmantiyê binasin. Lê mixabin ev 72 sal in ku dijminên ziman û çanda Kurdî, ev herdu berhem jî, ku Bisilmantiyê bi me didin zanîn, li me qedexe kirine û nehiştine ku em faydê ji wan bibînin.

Ew herdu berhemên Xaniyê nemir, hetanî dawiya salên şêstî jî di medreseyên Kurdistanê de dihatin xwendin.

Gelo, bo çi Ehmedê Xanî pêwîstiya nivîsandina van tiştan bi Kurdî dîtiye? Bêguman têgihîştina bersîvê, karekî hêsan e. Lewra li gorî baweriya ola Îslamê, çi kesê perestînî û daxwazên xwe gava ji Xwedayê dilovan re pêşkêş dike, divê bi wî zimanê ku ew rind pê dizane bixwîne û bibêje. Eger ne wisan be, ne perestînî ji aliyê Xwedê ve têne pejirandin û ne jî ew daxwaz û hêvî digîjin devera xweziyan. Ji ber vê hindê Xanî ev tişt bi Kurdî nivîsandine, da ku Kurd baştir têbigihin.

Ev herdu nusxeyên **Eqîdeya Îmanê û Eqîdeya Îslamê** yên ku di destên me de ne, di 1305'an (1887), meha Zilqe'dê de, bi destên Mele Mihemedê kurê Mele Ehmed ê Wanî hatine nivîsandin. Di dawiya Sedsala Nozdehan de, ew destnivîs ji aliyê **A. Von Lecoqî** ve hatine dîtin û di 1903'an de bi navê "**Kurdische Texte**" bi herfên Erebî, digel hinek çîrok û meselokên bi herfên Latînî jî, li Elmaniyayê hatine çapkirin. Di wê pirtûkê de ev destnivîsên Kurdî yên bi devoka Kurmancî hene: *Meulûda Kurmancî* ya Melê Bateyî, *Nûbihar*, *Eqîdeya Îmanê û Eqîdeya Îslamê* yên Ehmedê Xanî, herweha çend çîrok û serpêhatiyên din û hin tekstên bi devoka Zazakî jî hene.

Ew nusxeya **Eqîdeya Îslamê** ku Mele Mihemedê Wanî di 1887'an de nivîsiye, heşt rûpel in û 85 rêz in. Di pirtûka **Kurdische Texteyê** de ji rûpelê 40'î ta bi yê 47'an cih girtiye. Min ew destnivîs herf bi herf ji herfên Erebî wergerande herfên Latînî. Heta li hin ciyan, tê de hin kêm û zêdeyiya rêzimanê jî têne xuyakirin, lê min her eynî mîna wê bi herfên Latînî nivîsî û li ber hin bêjeyên ku ne zelal in, di nava parantêzan de bi awayekî zelaltir hin bêje nivîsîn.

Çapa Stenbolê ya *Eqîdeya Îmanê ya Ehmedê Xanî*, jixwe diyar e û piraniya rewşenbîran wê dinasin. Mele Ehmedê Qoxî, li serê şerheke bi Kurmancî nivîsiye û dîsa bi herfên Erebî û bi navê "*Rêberê Sanî Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî*" di 1984'an de daye çapkirin. Min jî ew şerh di 1986'an de wergerandibû herfên Latînî û di 1990'î de li Elmanyayê, ji aliyê Weşanxaneyê **Dengê Yekîtiyê** ve hatiye çapkirin. Ji ber hindê min pêwîstiya nivîsandina teksta **Eqîdeya Îmanê** ji xwendevanên **Çirayê** re nedît, lê teksta **Eqîdeya Îslamê** eva li jêrê ye.

Berî ku xwendevan bala xwe bidinê, pêdiviyeye girîng heye divê ku ez wê binivîsim:

Ev **Eqîdeya Îslamê** ji du beşan pêk hatiye. a) **Ruknê di Îslamê**, b) **Ruknê di Îmanê**. Û di termînolojiya Bisilmantiyê de "Ruknê Îslamê" nayê gotin, lê "Şertên Îslamê" û "Ruknên Îmanê" têne gotin. Îcar gelo Ehmedê Xanî ew bi "Ruknê di Îslamê" nivîsiye, yan ew kesê ku wê berhemê ji nû ve kopya kiriye wisan li hevûdu aniye? Bi baweriya min, wê ev şaşî, ne ya Ehmedê Xanî, ya yê ku kopya kiribû be.

## "FÎ BEYANÎ ERKANÎ'L - ÎSLAMÎ [Beyana Hîmên Bisilmantiyê]

Tu bizane!

Ruknê di Îslamê pênc in.

**Ruknê ewil:** Kelîmeê şehadet e. **Eşhedu:** Ez îqrar dikim bi devê xwe, îtîqad dikim bi dilê xwe, **en la îlahe:** Ku nîne tu me'bûdê bi heq di alemê da, **îllellah:** Bi xeyrî ji zatê Xudê bêmisl ku heyirî ne di tefekkura zatê wî da, çiqas mexlûq ku hene bûna giş a bi wî ye. Ya dî ji qedîmî ve ye, [her tişt] bi zatê wî ye, alem muhtacê wî ye, ew muhtacê kesî nîne, bê cî û mekan e, li hemî ciyî hazir e, ji ruh nêzikîrê merov e. Ji bo wî hene çiqas sîfetê kemalî; heft jê qedîm in: **Heyat û 'ilm û îradet û qudret û bihîstin û dîtin û tekellum** [axaftin]. Ev sîfatê di ha ezêlî ne, ebedî ne, ji zatê Xudê başqe nabin. Xudê berî ye ji çiqas ya 'eyb û kêmasî ye. **We Eşhedû:** Ez îqrar dikim bi devê xwo, îtîqad dikim bi dilê xwo, **enne Muhemmeden:** Muheqeq Muhemedê Erebi, Qureyşiyê çavreşê birûkêşayî, enîfireh, şikil sor û sipî yê nûranî wekî neynikê tiştê tê ra xwanê bûn, efdeltir e ji hemî ewladê Adem. Bejna wî ya mûbarek li ber ravê sih nedida. Li Mekkê bi mewlid hatiye [welidiye], li wê di çîlsalî da bûye peyxember. Sêzdeh sal li wê [li Mekkeyê] maye. 'Umrê wî bû şêst û sê sal, wefat kir. Qebra wî ye [ya] şerîf di nav camiyê da ye li Medîne. Navê babê wî Ebdullah e, kurrê Ebdulmuttelib. Navê diya wî Amîne ye, keça Weheb. **Resûlullahî:** Qasidê Xudê ye li ser hindî cin û însan ku riya heq nîşanê wan bide.

**Ruknê diduwa:** Biciênana limêjê di ferz e [kirina nimêjên ferz e].

**Ruknê sisê:** Dana zekatê.

**Ruknê çara:** Rojîya meha Remezanê ye.

**Ruknê pênc a:** Hec e.

Ruknê di Îmanê Şeş in:

[Hîmên baweriyê şeş in:]

**Ruknê ewil,** baweriya ji dil e bi Xudê ku çiqas sîfetê pak in jê ra ne, ê di be kêmayî tê tunin [sîfetên kê m di Xwedê de nînin].

**Ruknê didiwî,** baweriya bi melaîketê di Xudê ye ku cismî di letîf in, nûranî ne, bi emrê di Xudê meşxûl in daîma, daîma, qet bêemriya wî nakin; ne xwarin ji bo wan heye, ne xew, ne mirin, ne jin [zayendeya wan ne mê ye, ne jî nêr e], çiqas mexlûq hene ji giş a bêtir in, heta ji qîrê baranê û ttayê di gihayê û pelê di daran. Her yekê li ser musellet e [çavdêrî dike] bi emrê Xudê teserrufî tê da diket. Kespa wan daîm ta'et e. Di her heft tebeqêt asîman cihê piyekî tune bê melek; hin di rikû'ê da ne, hin di sucûdê da ne, hinik xerq in di şuhûda cemala Xudê da ne, agah ji 'alemê hene wene [wisar] ji adem [meriv]. Didu li ser milê me ne, ê li ser milê rastê xeyran dinivîse, ê li ser çepê şeran.

**Ruknê siya**, baweriya bi kitabê Xudê ye ku sed û çar in. Sed, kaxez in. Deh nazil bûne ji bo **Adem**. Deh ji bo **Îbrahîm**. Sih ji bo **Îdrîs**. Pêncî ji bo **Şîs**. Û *Tewrat* ji bo **Mûsa** ye û *Zebûr* ji bo **Dawud** e û *Incîl* ji bo **Îsa** ye û *Qur'an* ji bo **Muhemmed** e selatul'lahî we selamûhû 'eleyhî we 'eleyhîm ecme'in [xweşî û silavên Xwedê li wî û li me bin]. Hemû heq in, kelamê di Xudê ne. Belê, hukmê wan betal bûye bi hukmê Qur'anê. Heta axirzeman wê [Quran] bimîne, bê kêmi û zêdehî.

**Ruknê çarî**, baweriya [bi] peyxemberan e ku [di] her qernekî [de] Xudê însanekî pak ji gunehan, ji hemî xelqê weqta xwo efdeltir bi kerema xwo kiriye peyxember; mu'cizat danê ku kesekî digel quweta beranberî nebûye, wehî ji bo şandiye ku emrê Xudê bigehîne nav xelqê.

[Pêxember] sed hizar û bîst hizar û çar hizar in [124.000].

*Ûlul'ezm* [serdarên pêxemberan] pênc in: **Nûh** û **Îbrahîm**, **Mûsa**, **Îsa** û **Muhemmed** (ssee).

[Pêxemberên] xwudanêt ummeta, sêsed û sêzde ne. Ê di meşhûr: *Adem û Şîs û Îdrîs û Nûh û Hûd û Salîh û Îbrahîm û Lût û Îsmâ'îl û Îshaq û Ye'qûb û Yûsîfû Eyyûb û Şû'eyb û Mûsa û Harûn û Xîdr û Yûşe' û Ilyas û Yese' û Zulkîfl û Şe'yûb û Şemuwîl û Yûnis û Dawud û Suleyman û Zekerîya û Yehya û 'Uzeyr û Îsa* û seyyîdu'l murselîn *Muhemmed* sellellahu te'ala 'eleyhî we sellem, ecme'in.

**Ruknê pênc**, baweriya bi qiyametê ye û [baweriya bi] herçî peyxemberê megotî.

Ji nişanan [yên qiyametê] wekî rabûna **Mebdî** ye û nazilbûna **Îsa Peyxember** e û rabûna **Deccal** e û **Dabbetulerdê** ye û **Ye'cûc** û **Me'cûcan** e û hilatina rojê ye ji mexribê û rabûna dûkêlê ye tijî dunyayê û çûna erdê ye di xwar da carekê li meşriqê û carekê li mexribê û carekê li Cizîreê Erebi; û kêmiya 'ilm û dunyan [ol] e û zehfbûna fisq û xiyanerê û serdariya bed'eslan e. Û herçî wî [Mihemed Pêxember] gotî ji waqî'atê di heşrê; wekî hûrbûna çiyane û kerkerbûna asîmanan e û rijyana sitêrkan e û bêtûrbûna roj û hîvan e û têkilbûn û hişkbûna behran e û xeyrê van hemî heq in, bêşik wê biqewimin; mexlûq hemû [dê] sax bibin, li Şamê cem' [kom] bibin; kaxezê xeyr û şerran bikevne destê mirov, 'emel bêne hisabkirin, suala 'emelan wê bikirin [bê kirin], be [bi] mîzanê bênekişandin. Tu 'emelbêceza nabin.

Bi fermana Xudê pirê wê deynine ser cehennemê. Bihiştî wê derbasbibin herne ser hewza Kewserê, cehennemî wê bilerizin bikevine agirî.

Şefa'eta musulmanan wê [Mihemed] Peyxember û meşaîx û suleha bikin. Kesê ba [bi] îman, ebedî namîne di cehennemê da.

Ew [dojeh] heft tebeq in, wê\* di bin erdê da. Buhuşte heşt [tebeq] in, wa\* li ser asîmanan.

**Ruknê şeşa**, bawerî ye ku xeyr û şer bi teqdîra wî [Xwedê] ye. Hemî teherruk û 'emelê di mexlûqan ji berê ve nivîsî ne û me'lûm in li nik Xudê. Ji ewil heta bi axer herçî tiştê biqewime, wê muwafiqê wê nivîsê be, bê kêmayî û zêde.

---

\* Peyvika **wê/wa**: Kesekî hazir gava dipeyîve û devereke dîr ku tê xuyakirin bi mirov dide nişandan bi kar tîne. Lê belê "wê" hin xasmetmendiyên xwe yê zêdetir hene, weke: Filankes **wê** di girîgehê de...

# KURD DI KITÊBÊN MESÛDÎ DE



Gelek dîroknas û cografyanasên Îslamê di berhemên xwe de ne bi tebayî be jî, dîsa li ser rewşa Kurdan û welatê wan rawestiyane û kêr û zêde cihê wan ê nav civata Îslamê dane zanîn. Berhemên pêşî yê mêtûyî ji bo agahdarî li ser jiyana Muhemmed Pêxember û li ser vegirtinên (fethên) pêşî yê di destpêka Îslamê de hatine nivîsîn. Çendî destpêka van berheman di dawiya salên 700'î de be jî lê bi wî şeklê dîrokê, li ser bûyerên sal bi sal, li dor salên 900'î ye û berhema **Teberî** (mirin 923) ya **Tarîx er-Rusul we el-Milûk** di vî warî de yek ji yê pêşî ye. Xeyn ji **Teberî**, **Ebû'l-Hesen Elî El-Mes'ûdî** (mirin. 345/956) jî bi hewildaneke cihê, gelek berhemên tarîxî û cografî yê hêja dane û di wan de qala Kurdan jî kiriye. Tarîxnas, cografyanas û gerrokê navdar **Mes'ûdî** li Bexdayê ji diya xwe re çêbûye û li gelek herêmên cîhanê, ji Şam û Filistinê bigre heyanî Hînd, Madagaskar, piştî Çiyayê Qaf (Qafqasya) û Çînê geriyaye. Ew ji bo ku ji nav xelkê, ji devê yekemîn agahdariyan bicivîne li van deran tev geriyaye, lê digel vê jî gelek rexne li rastiya salixdanên wî hatine kirin. Ew li Entaqyayê, li Şamê, li Fustatê jiyaye û di 956'an de li Misrê miriye.

**Mes'ûdî** di gelek waran de berhem dane lê giraniya wan li ser dîrok û cografyayê ye. Wî li ser meşûyê sê berhemên mezin ê hêja mîna **Exbar ez-Zeman**, **El-Ewset û Murûc ez-Zehab we Me'adin el-Cewher** nivîsandine, lê pir mixabin ku ji hersê kitêban bi tenê **Murûc ez-Zehab** ku kurtayiya herduyên pêşî ye, di destê me de maye. Ew di tarîxên xwe de ji pêla rêzkirina bûyerên sal bi sal ve, li ser bûyerên ku li der û dorên mîr, padîşah û yê ku di nav civatê de qewimîne, rawestiyaye. Herweha ew di berhemên xwe de li ser hîwûşiyên (edetên) Xiristîyan û Hîndîyan, li ser felsefeya Yûnaniyan û zanistiya Hindîyan rawestiyaye, ew meraq kirine û li wan geriyaye.

**Mes'ûdî** di cildê pêşî yê **Murûc ez-Zehabê** de me ji welat û deryayên ku di gerra



*xwe de dîtine, agahdar dike û piştire çand ol, hîwuş (edet) û peywendiyên nav xelkên cuda cuda bi me dide nasîn. Ew tê de salixan ji qiral û pêxemberên kevn dide, dûr û dirêj qala esl û fêslê wan dike. Piştire tê ser dema Muhemmed Pêxember û xelîfe bi xelîfe lê didomîne heyânî salên 332/1943 'yan. Ji bilî mêjû û coxrafyayê, wî li ser ol, helbest, keştîvanî û bazirganiyê jî berhem dane. Wî nêzî bîst berhemên mîna **Kîtab et-Tenbîh we'l-Îşraf**, **Kîtab fi'l-Meqalat fi Usûl ed-Dîyanat**, **Kîtab Nezm il-E'lam fi Usûl il-E'hkam**, **Kîtab el-Îbane fi Usûl ed-Dîyane**, **Kîtab el-Îstîzkar Lî Ma Cera fi Salîf el-E'esar**, **El- Exbar ul-Mes'ûdiyat** û gelekên din li pey xwe hiştine.<sup>1</sup>*

*Min li vir hin cihên du kitêbên **Mes'ûdî**, **Kîtab et-Tenbîh we'l-Îşraf** û **Murûc ez-Zeheb we Me'adîn el-Cewher**, ku bahsa Kurdan dikin wergerandin Kurmancî. Li ser wan kitêban hinek notên çapxanê ku ji destnivîs û çapên cuda hatine girtin, hebûn û ew bi piranî bi serê navê xwedî mîna "P", "L", "Mor." yan jî "B: M." hatibûn nivîsîn, lê carna jî nav giş hatibû nivîsîn. Notên li ser **Et-Tenbîhê** bi Latîni bûn lê di gelekên wan de li gor çapên cihê, navê dever û kesan bi Erebi hatine nivîsîn, bes jêrenotên li ser **Murûc ez-Zehebê** hemû bi Erebi bûn. Min ew notên Latîni yên ku min ji wan fam kir wek eslên wan nivîsand lê yên ku min ji wan fam nekir dest neda wan. Navê kes û cihên ku di **et-Tenbîhê** de bi herfên Erebi hatibûn nivîsîn û herweha ew notên bi Erebi ku di **Murûc ez-Zehebê** de bûn jî min bi tenê herfên wan guherandin herfên Latîni.*

Emîn Narozi

## JI "KÎTAB ET-TENBÎH WE EL-ÎŞRAF" A EL-MES'ÛDÎ

Ji xwe me di kitêba **el-Îstîzkar** [navê berhemeke Mes'ûdî ye - E. Narozi] de sedemê şeqbûna Dîcle û guherandina berê wê ku di dema şahê Îranê Kesra Ebruwîz [Perwîz]<sup>2</sup> de çêbûye, got. Kerxeava [cihê ku ava çem tê de diherike - E. N.] wî ya berê di Cûxa<sup>3</sup> de bû û di Es-Sersûra ku girêdayîyê bi bajarê Keskerê<sup>4</sup> ve bû, dirijiya deryayê. Wî berê xwe guherand û şopa wî ya kevn bû kelebêst, çawa me got. Şopa kerxeava Dîcle heyânî vê dema me, di ber guhê Silhê, Behendef,<sup>5</sup> Baderaya,<sup>6</sup> Bakusaya û Famiya Îraqê heyânî bajarê Bazibîn, Deberbî,<sup>7</sup> Qurqûb,<sup>8</sup> Et-Tîb,<sup>9</sup> Şaburzan,<sup>10</sup> Ed-Dermekan,<sup>11</sup> ta ku digihê çemê Cûrê û Mezarê de bû. Gelek çemên din jî diherikin ser çemê Dîcle û Feratê, mîna Serbet, Satîdema,<sup>12</sup> Ersenes,<sup>13</sup> Ez-Zerm,<sup>14</sup> çemê Dûşa ku dikeve navbera bajarê Cezîreya Îbn 'Umer [Cizîra Botan] û Basûrîne, Xabûrê Dîcle ku cihê ketina wî ya ser Dîcle navbera Basûrîne<sup>15</sup> û Qebirsabûrê<sup>16</sup> ye û cihê derketina wî jî kaniya navdar a bi "Eyn el-Bitrîq", Kaniya Bitrîq e. Ew [Xabûrê Dîcle] ji erdê Zozana ji welatê Ermeniyana derdikeve û di nav

çiyayê Cûdî, çiyayê Et-Tinîn<sup>17</sup> û yên din de dibihûre diçe. Li ser Xabûrê Dîcle qesrên Eliyê kurrê Dawudê Kurd ê ku ji Rehzadiyan<sup>18</sup> e û yên hinekî din hene.

Herweha [çemê] Seffan, ku ji çiyayê 'Umer,<sup>19</sup> ji Qareyê û ji çiyayê navdarê bi "'Îlm eş-Şeytan"<sup>20</sup> dertê jî diçe ser wan. Ew [çiyayê 'Îlm eş-Şeytan] piştî çiyayê Tûr Abdîn, cihê ku Ermeniyên mayî ji Suryaniyan lê dimînin [dibe ku di vir de şaşiyek hebe û rastiya wê "cihê ku Ermenî û Suyaniyên mayî lê dimînin" be, çiku weha Ermenî û Suryanî dibin yek - E. N.] tê. Xabûrê Feratê ku ji Re's el-'Eyn, / Serê Kaniyê, derdikeve û jê re 'Eyn el-Werde, / Ava Gulê jî tê gotin û li herêma Qirqîsiya<sup>21</sup> tevî Feratê dibe digel hinek çemên din jî diherikin ser wan [Dîcle û Feratê]. Ji destpêka Dîcle heyani dawiya wê, nêzî çarsed fersexî [fersexek nêzî 12,5 km. ye - E.N.] yan jî zêdetir e.<sup>22</sup>



### **Beşa Duyemîn Ji Şahên Farisan [Îraniyan] "Belan"<sup>23</sup> in Yanî Bilind**

Pêşiyê wan Menûşehr [Menûçehr]<sup>24</sup> e, wî sed û bîst sal mezinatî kiriye. Faris ji bo hinek kirin û mu'cîzeyên wî pir pesnê wî didin û qedrekî bilind didinê. Ew ji azbata Îrecê kurrê Efrîzûn [Ferîdûn] e û di navbera wî û Efrîzûn [Ferîdûn] de sêzde bav hene. Heft heb zarûyên wî hebûne û pîrrên bavik, milûk û gelên Îranî ji wan zêdebûne; ji xwe ji bo Îraniyan ew mîna dareke nesebî ye. Li gor Farisan (Îraniyan), Kurd ji azbata Kurdê [navê yekî ye - E. N.] kurrê Îsfendiyarê kurê Menûşehr [Menûçehr] in. Bazincanî,<sup>25</sup> Şewhecânî,<sup>26</sup> Şazinacânî,<sup>27</sup> Nîşawire, Bozîkan, Lurî,<sup>28</sup> Cûreqan,<sup>29</sup> Cawanî [Gawanî], Barisyan,<sup>30</sup> Celalî,<sup>31</sup> Mustekan,<sup>32</sup> Cabarîqî,<sup>33</sup> Curûxan, Kîkan,<sup>34</sup> Macurdan, Hezbanî<sup>35</sup> digel hinek bavikên din yên li wan pozên Îranê, li Kermanê, li Sicistanê, li Xorasanê, li Esbehanê [Esfahanê] û li Erd el-Cîbal (Welatê Çiyan) tev ji wê azbatê ne. Ji avan jî ava Kûfeyê, ya Besrayê, ya Sebzan, ya herdu Îxaran ku mebest ji wan Burc<sup>36</sup> û Kereca Ebû Dulef<sup>37</sup> in, li nav wan hene. Herweha ew [Kurdên] Hemezânê [Hemedanê], yên Şehrezorê,<sup>38</sup> yên Derabazê, yên Samexanê, yên Azerbaycanê, yên Ermenîstanê, yên er-Ranê,<sup>39</sup> yên Beyleqanê, yên el-Bab û yên el-Ebwab jî tevî wanên li Cezîreyê, Şamê [Erdê Şamê] û yên ku li gelî û birekên wir jî dimînin giş ji wan in.<sup>40</sup>

Hinek ji Kurdên serwest ên vê dema paşî ku me li wan herêmên jorî dîtibûn digotin ku: "Ew ji malbata Kurdê kurê Merd ê kurê Se'se'eyê kurê Herb ê kurê Hewazin in". Hinek ji wan jî dibêjin ku: "ew zarûyên Subey'ê<sup>41</sup> kurê Hewazin in". Li gor nîjadnasên (nessab) malbata Muderr [Muderr pêşiyê bavikekî Eraban e - E. N.], 'Herb û Subey' di rêzek û di sewiyekê de ne û zarû ji wan nemane lê zarûyên Hewazinê Bekrê kurê Hewazin hene. Hinek ji Kurdan jî dibêjin ku: "Ew zarûyên Rebî'e ne [Rebî'e birayê Muderr e û pêşiyê çend bavikên Ereban e - E. N.] û ji piştî Bekrê kurê Waîl in". Ji ber cengeke ku di nav wan xwe bi xwe de qewimiye ew ji hev belabûne, ji cihê xwe barkirine çûne welatê biyaniyan (erd el-e'acimî), li wir ew bûne eşîr û bavikên cuda û zimanê wan guheriye.

Mes'ûdî gotiye [Mes'ûdî gelek caran di kitêbên xwe de, wek edet, dema ku dest bi paragrafek yan jî behseke nû bike wusa dibêje- E. N.] ku "Me di kitêbên xwe yê berê de qala kesên Erebi, Kurd, Cît,<sup>42</sup> Belûc, el-Kûc ku Qufsiyên wan hêlên Kermanê ne, Berberiyên ser erdê Afrîqa û ya Mexribê mîna Kutame, Zuweyle, Mezate, Lewate, Heware, Senhace, Ewrebe, Lemete<sup>43</sup> û gelek bavik û qebileyên Berberiyên ên din jî ku li Bedwê<sup>44</sup> û li çiyayên rojhilat, rojava, bakur û başûr dijîn kir. Herweha me behsa Fîre,<sup>45</sup> Bece û yê din ji gelên xweykon jî kiriye".

Tê gotin ku "Piştî Menûşehr [Menûçehr], Sehmê kurrê Eman ê kurrê Esfeyanê<sup>46</sup> kurrê Newzir<sup>47</sup> ê kurrê Menûşehr pêncî salî fermandarî kiriye û li pey wî jî Ferasiyat et-Turkî / Ferasiyatê Tîrk, dozde salan desthilatdarî kiriye. Di dûvre Zeww<sup>48</sup> zora wî biriye û sê salan hukum kiriye, piştî Kerşasb [Gerşasb]<sup>49</sup> jî dîsa sê salan bûye şah.<sup>50</sup>

## ♦

### **JI "MURÛC EZ-ZEHEB WE ME'ADIN EL-CEWHER" A EL-MES'ÛDÎ**

Li ser destpêka cîsn (esl û binyat) û beşên Kurdan gelek gotûbêj çêbûne. Hinek ji wan xwe ji azbata Rebî'eyê kurrê Nîzarê kurrê Me'dê kurrê 'Ednan (pêxemberê Îslamê Muhemmed, aştî û mihrîvaniya Xwedê lê be, jî di bîstûyek bavî de digihîje 'Ednan. - E. N.) û ji zurriyeta Bekrê kurê Waîl dibînin, lê ew di heyamekî pirr kevn de ji wan qetiyane û ji ber hin rewşên ku ew bi bal xwe ve kişandine, xwe gihandine çiya û geliyan. Ew li wir bûne cînarên wan gelên biyanî û Faris ku li bajar û avahiyên herêmê hêwirîne, piştî wan dev ji zimanê xwe berdaye û yê biyanî ji xwe re girtiye. Her beşeke Kurdan xwediyê zaravayek ji zimanê Kurdî ye. Hinek jî, wan ji azbata Muderrê kurrê Nîzar û di nav zaruyên Nîzar de jî ji nesla Kurdê kurrê Merd ê kurrê Se'se'e yê kurrê Hewazin qebûl dikin, lê ji ber bûyereke pirr kevn ku di nav wan û Xessaniyan de qewimîbû, wan ji cih û warên xwe barkirine.

Hinek jî, wan ji malbata Rebî'e û Muderr dibînin ku ji bo av û kozeçêrê xwe avêtine çiyayan û demek piştî zimanê xwe yê Erebi bi yê cînarên xwe guhartine. Hinek meriv jî wan digihînin qerwaşên (cariyeyên) Suleyman [Pêxember] kurrê Dawud [Pêxember]. Dema milkê wî [Suleyman Pêxember] jê hate sitandin hingê ew şeytanê bi navê "Cesed"<sup>51</sup> navdar, çû cem qerwaşên wî yê munafiq. Xwedê ewên bi bawerî ji şeytan parastin lê yê munafiq jê ber girtin. Încar gava Xwedê milkê Suleyman lê zivirand û ew cariyeyên ku ji şeytan ber girtibûn hemlên xwe danîn hingê wî [Suleyman Pêxember] got: "Wan bavêjin çiya û newalan". Ew zarûk jî bi diyên xwe re hatine şandin û li wir hatine bi cih kirin, dûvre ew zarûk bi hev re zewicîn, ji hev zêde bûn û bûne destpêka neseba Kurdan.

Li gor hinek kesan jî dema di herdu sermilên Dehhakê xwedî çend dev de ku Erebi û Faris li ser eslê wî [Dehhak] di nîqaşê de ne, weke ku li pêş di vê berhemê

de jî hate gotin, du marên ku xwarina wan bi tenê mejiyê mirovan bû, derketin, hingê xelkê Faris (Îranî) pirr hate kuştin û gelek ji wan jî ku Efrîdûn [Ferîdûn] zû gihabû wan, ji bo şerê wî [Dehhak] civiyabûn. Wan alayeke çermîn ku Fursê [Farisan, Îraniyan] jê re "Direfşê Kaweyan" digotin bilind kiribû. Efrîdûn, çewa me li pêş (di § 538 ji **Murûc ez-Zehê** de) bihûrand, rahîste Dehhak û ew bir li çiyayê Dunbawend [Demawend] girêda. Ji xwe wezîrê Dehhak her roj beranekî û zilamekî serjê dikir, mejiyê wan li hev dixist û dida wan herdu marên ser milên wî; kesê ku ji ber difilitî jî derdikete çiya. Ew li wan deran kovî bûn, zurriyeta wan zêde bû û bû destpêka Kurdan. Evên [Kurdên] han jî ji azbata wan in, bûne xelkekî pismamên hev.

Ne Îranî, ne dîroknasên kevn û ne jî kesekî din inkariyê naxin vî tiştê ku me li ser Dehhak got. Ji xwe di nav Îranî û kitêbên wan de gelek bûyerên xerîb li ser Dehhak û şeytan hene. Herweha tê gotin ku "Ew Tehmûrsê<sup>52</sup> ku navê wî, li pêş, di nav şahên Îranî yên beşa pêşî de bihûrî Nûh Pêxember bi xwe ye". Şiroveya "direfş" di Farisiya Pehlewî de ku ya pêşî ye, ala, derxistî û nîşan e.

Ji xwe me li pêş gelek tişt li ser Tirkan û binyata wan gotibû. Hinekan şaşî kirine û gotine ku "Tirk zarûyên Tû'hê kurrê Efrîdûn [Ferîdûn] in", lê ev şaşiyê eşkere ye, çiku Efrîdûn [Ferîdûn] Tû'h ji ser Tirkan rakiribû û ew sipartibûn Rûman [Bîzansiyan]; ger ku ew ji zarûyên wî bûna wê çewa wî ew danîna ser wan. Ev yeka han diyar dike ku ew ne ji zarûyê Tû'hê kurrê Efrîdûn [Ferîdûn] in, çendî ku di nav Tirkan de hinekên meşhûrê bi zurriyeta Tû'h hene jî. Pirraniya Tirkan ji es-Sebet in û ew jî li gor ku me got ji Himyeran in, herwekî ku hinek ji Tebabî'eyan [navê hinek ji mezin û pêşkêşên Yemeniyan e - E. N.] jî ew bi vî awayî tertîb kirine.

Ji wan tiştên ku me li ser Kurdan gotin, li nik xelkê, yê herî navdar û rasttir gihandina eslê wan bi Rebî'eyê kurrê Nîzar ve ye. Ji xwe beşek ji Kurdan mîna Şûhcanên ku li herêma ava Kûfe û Besrayê ango yên ku li ser axa Dînewer û Hemedanê dimînin, înkâr nakin ku ji azbata Rebî'eyê kurrê Nîzarê kurrê Me'd in. Bes di nav Macurdan ku ji Kenkewera [Kengewera] welatê Azerbaycanê ne, Hezbanî,<sup>53</sup> Şurrî û ewên ku li Bîlad el-Cîbal (Welatên Çiya), hêwirîne mîna Şadencanî, Lurrî [Lûrî],<sup>54</sup> Madencanî [Mazencanî], Mezdankanî, Barîsanî, Celalî,<sup>55</sup> Cabarqî, Cawanî [Gawanî], Mustekan, ed-Debabîlî û yên din ku li hêla Şamê ne tevan de tê zanîn ku ew ji neseba Muderrê kurrê Nîzar in. Herweha Yaqûbî û Cûruqanên ku li aliyê Mûsilê û Çiyayê Cûdî dijîn û xiristiyan in jî ji wan in. Dîtina hinek Kurdan jî mîna ya Xariciyan [kesên ku di herba Seffînê de dijî lihevhatina navbera Elî û Me'awiye derketine - E. N.] dîrketina ji Elî û 'Usman e, Xwedê ji wan xweş (razî) be.<sup>56</sup>



[Herweha me li vir] bûyera koleyê Xwedê (ji ber ku bi kurtî gotiye nayê zanîn ka mebest jê çiyê, ji xwe di paragirafa berî vê de dibêje: "Ez van bûyeran nanivîsinim

çimkî ew di dikîtêba min ya **Exbar ez-Zeman** de hene - E. N.) û bûyerên Xariciyên Yemenê mîna 'Hemze el-Muxtar îbn 'Ewf el-Ezdî û Ebû Beyhes el-Heysem<sup>57</sup> digel hinek Xariciyên ku me di kitêba xwe ya bi navê "Fî'l-Meqalat fî Usûl ed-Diyanat" de qala cudahiyên navbera wan û Xariciyên Îbadiye kiribû, negotine [Îbadî beşeke Xariciyan e ku di sala 746'an de ji Emewiyan qetiyanê û bi 'Ebdullah ibn Îbad el-Murrî et-Temîmî ve girêdayî ne. - E. N.] Ew [Îbadî] Xariciyên Ummanê yên Ezdî û yên din in digel yên Ezarîqî, en-Necedî, 'Hemzeyî, el-Cabî, es-Sufrî û hinek grûbên din ji Xariciyan. Welatên wan mîna welatên **Sincar**, Tile'fer ji navçeya Diyarê Rebî'e, El-Sinne, El-Bewazîc û El-'Hedîseyâ ku dikeve piştâ Mûsilê, ne. Dûvre [di Exbar ez-Zeman de] qala bûyerên wan Kurdên ku li herêma Azerbaycanê dimînin û bi Xaricîtiyê tene naskirin, tê. Eslemê bi navê Îbn Şadleweyh navdar ku dest danîbû ser erdê Îbn Ebu es-Sac ê herêma Azerbaycan, Er-Ran, el-Beyleqan û Ermenîstanê jî yek ji wan e. Dîsa bûyerên wanên [Xariciyên] ku li herêma Sicîstanê, çiyayê Heratê, Kûhîstanê, Boşenca Xoresanê û yên ku li Mekrana ber qeraxê deryaya navbera welatê Sind û Kirmanê ku piraniya wan Sufrî û 'Hemzî ne dimînin jî [di wê kitêbê de] hatine dayîn. Ewên ku li devera 'Heraya Îstexrê û Saheka navbera Kirman û Faris de dijîn jî ji wan in. Hinek ji wan jî li Taherta Rojava, li welatê 'Hedremûtê û li hinek deverên din ên cîhanê cihwar in.<sup>58</sup>



Piştê şivanan û Kurdan hinek ji wan [aletên muzîkê] ku bi wan dihate lêdan (mîna bilûrê] çêkirin û gava pezên wan bela dibûn wan lê dida da ku ew bicivin ser hev. Piştê Îraniyan ji bo 'ûdê nayê [neyê] çêkirin, zunnamê<sup>59</sup> ji bo tenbûrê, surnayê<sup>60</sup> ji bo teblîkê û mesticê<sup>61</sup> jî ji bo sencê çêkirin. Awazên Îraniyan bi 'îdan û sencan bûn, ew a wan bi xwe bû û nexme (awaz), îqa'at (aheng), meqatî' (hece) û turûq (awayên lêdanê) ên milûkiyê hebûn. Ew heft awa bûn:<sup>62</sup>

1. Sekaf /bendestan.<sup>63</sup>
2. Ebrîn, ku bêhtir ji binê ewtaran (têlên tembûrê) re tê bikaranîn.
3. Behar, ku meqtî'a zelaltirîn e.
4. Emrese/embrîne, ku awazên herî xweş dicivîne û bêhtir pêl bi pêl nizm û bilind dibe.
5. Madarûsnan/mazriwasban, ya herî giran û derketina ji awazekê ber bi awazekê din ve herî zor e.
6. Saykad<sup>64</sup> /el-qubbe, ewa ku derketina rê teşwîq dîke<sup>65</sup> û li perdeyên notayê digere.
7. Şeysem/şesm, ewa giran ku bi tiliyan tê gitin
8. Cûb'eran<sup>66</sup> /esbiras, ewa perdeya ku li ser nexmeyê ye.<sup>67</sup>

Yê ku ji 'Erebî wergerandiye:  
Emîn Narozî

<sup>1</sup> Ferdînannd Tûlû, El-Muncid fî el-Luxe we el-E'lam, Dar el-Meşriq, Beyrût 1973, çapa 7'an, beşa dîrok û agahan, r. 661

Christopher Toll, Den Arabîska Litteraturen, Norsted & Söners Förlag, Stockholm, n. d. (no date=tarîxê çapê li ser pirtûkê tune), r. 93

The Cambridge History of Arabic Literature Religion, Learning, and Science in the 'Abbasid Period, ed. M. J. L. Young, J. D. Latham and R. B. Serjeant, Cambridge University Press, Cambridge, 1990, r. 204-205

El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zehab we Me'adin el-Cewher, Beyrût, 1965; Pêşgotina Şarl Pulla, cild 1, r. 7-10

<sup>2</sup> Navê şahekî Îranê ye, ew bavê Şehriyarê bavê Yezdecîrd e ku şahîtiya Îranê ya wê demê pê bi dawî hatiye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, Biril, Leyden, 1967, r. 401)

<sup>3</sup> Di çapa L de "Hû'ha" ye, di ya P de "Cexa" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>4</sup> **Kesker** bajarê mesîhiyan ê herî kevn e li Îraqê, di çavkaniyên Suryaniyan de **Kesker** derbasdibe. (Ferdînannd Tûlû, El-Muncid fî el-Luxe we el-E'lam, r. 589). Di çapa L de "Kesrà" ye. (El-Mes'ûdî Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>5</sup> **Behendef**, gundeke dikeve navbera Baderaya û bajarê Wasîtê (Yaqût el-'Hemewî, Mu'cem el-Buldan, Dar Beyrûd, Beyrûd, 1957, c. 1, r. 516). **Wasit** dikeve navbera Kûfe û Besrayê û li qeraxê avê li pêşberî Keskerê ye û ji aliyê waliyê navdar el-Heccac Yusuf es-Seqefî ve hatiye avakirin. (Ferdînannd Tûlû, El-Muncid fî el-Luxe we el-E'lam, r. 589)

<sup>6</sup> **Baderaya** bajarekî nêzî Bakusaya ku dikeve navbera Bexdayê û Wasîtê ye. (Yaqût el-'Hemewî, c. 1, r. 316)

<sup>7</sup> Di çapa P; L de "Denrenî" ye. Di ya Îbn Rosteh de "Deyrî" ye, [c.] 13, r. 188, (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>8</sup> **Qurqûb**, bajarekî navbera Besra, Ehwas û Wasîtê ye. (Yaqût el-'Hemewî, Mu'cem el-Buldan, c. 3, 401)

<sup>9</sup> **Et-Tîb**, cihekî li hêla Xorasanê ye. (Yaqût el-'Hemewî, Mu'cem el-Buldan, c. 3, r. 303)

<sup>10</sup> **Şaburzan**, bajarekî Xorasanê ye, di navbera Et-Tîb û Sûsê de ye. (Yaqût el-'Hemewî, Mu'cem el-Buldan, c. 3, r. 303)

<sup>11</sup> Di çapa P de "ed-Demirkan" e, li gor Mokadd. "d" bûye "r", [r.] 114, [c.] 8. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>12</sup> Li gor çapa P "Sabîdema" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>13</sup> **Ersenes** çemekî ku [hingê] li nav erdê Rûmê [Împeretoriya Bîzansî] dima. (Yaqût el-'Hemewî, Mu'cem el-Buldan, c. 1, r. 150)

<sup>14</sup> Ita P (L Er-Rûm); Jâc. "Er-Rezm" (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>15</sup> **Basûrîn** nahîyeke Mûsilê ye. (Yaqût el-'Hemewî, Mu'cem el-Buldan, c. 1, r. 322)

<sup>16</sup> Li gor Ita, Mor. Jâc. "Fisabûr" e. Hoffmann "Bersabûr", "Fersabûr", et nomen plene audit "Fîrûzsabûr" dibêje. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh ew el-Îşraf, r. 54)

<sup>17</sup> Di çapa P de "Et-Tinîl" e, ya "L" baş nayê xwendin (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>18</sup> Di çapa L de "Ed-Dehradiye" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

<sup>19</sup> Li gor P "El-'Emm" e; lê di çapa L de "El-'Are" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)

- <sup>20</sup> Di çapa L de "Es-Sultan" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 54)
- <sup>21</sup> **Qirqîsya**, gundekî ser Xabûrê ye, nêzî Rehbiyaya Malikê kurrê Tûs e. (Yaqût el-Hemewî, Mu'cem el-Buldan, c. 3, r. 396)
- <sup>22</sup> Ji Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 53-54'an hatiye wergerandin.
- <sup>23</sup> Di çapa L de "Belen" e; li gor Berûnî û Chron 104 "Îlan" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 88)
- <sup>24</sup> Menûçehrê kurê Îrecyek ji şahên îranê yê ji malbata Pîşdadiyên kevn e. Ew palewanekî dîrokî ye ku gelek helbestvan û hunermendên Farisan ew û cengên wî di helbest û mînyaturên xwe de teswîr kirine. Wî du apên xwe, ji ber serhildana li ber bavê wî, di şer de kuştin. (Ferdînan Tûlû, El-Muncid fi el-Luxe we el-E'lam, r. 689)
- <sup>25</sup> Di çapa L de "Narincanî" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 88)
- <sup>26</sup> Di çapa P de yan "Şhwencanî" ye li gor Mor. III, 253, yan jî "Şahûniye" ye li gor Îstexrî [Îstexrî] 115. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 88)
- <sup>27</sup> Di çapa L de "Şawincanî" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 88)
- <sup>28</sup> Li gor çapa P "El-Kerbe" ye, li gor ya Mor. "El-Lezabe" ye û li gor Menahîc El-Fikr jî "El-Lûriye" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>29</sup> Di çapa P de "Cewrekan" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>30</sup> Di çapa L de "el-Babsiyân" e, di ya P de "el-Barnîsan" e û di ya Mor. de yan "El-Barsan", yan "el-Barîsan" yan jî "el-Barnîsan" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>31</sup> Li gor Mor. "El-Xalîye" yan jî "el-Harîbe" ye, li gor Ist. [Îstexrî] "Celîlî" û di Mesalik el-Ebsar de "Kelalî" tê. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>32</sup> Li gor çapa P "Meşkan" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>33</sup> Di çapa L de "el-Habarîqe" ye, di P de "el-Cebarîqe" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>34</sup> Di çapa P de "Macirkan" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89). **Kîkan** navê eşîreke kurdan e ku vêga jî heye û di nav Kurdan de gelek caran bi Eşîra Milan re tê jimartin.
- <sup>35</sup> Di çapa L û ya Mor. de "el-Helbanî" ye, li nik Ibn Hauk. [Îbn Hewqel] "Hednanî" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>36</sup> Li gor çapa L "Burû'h" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>37</sup> Di çapa P de "Wehcan" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>38</sup> Li gor L "Şehzûr" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>39</sup> Li cem L "er-Ran" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>40</sup> Di çapa L de "gelî û birekên Şam û Cezîreyê" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>41</sup> Li gor çapa L "Seb" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>42</sup> Li gor çapa P "El-Cis" e, li gor ya Vulgo "ez-Zût" e û di ya L de "el-Hulû'h" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 90)
- <sup>43</sup> Di çapa L de "Lebte" ye, li gor çapa P "Leyte" ye, li cem Mor. jî "Lefte" yan jî "welîte" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 90)
- <sup>44</sup> Li gor çapa P "el-bilad" [bajaran] e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 89)
- <sup>45</sup> Di çapa P û L de "el-Hemze" ye. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 90)
- <sup>46</sup> Di çapa P de "el-Qenan" e, li nik Mor. "Înqiyad" e, Tab. 530, 2. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 90)

<sup>47</sup> Codd. "Bûr" e, Mor. ut rec.; Tab. 530, 2. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 90)

<sup>48</sup> Li gor P "melikekî ku Zû zora wî biriye" ye û li gor L Sec. Tab. 533. jî "melikekî ku Dû zora wî bir" e. [Lê baş jê nayê zanîn ka "Dû" û "Zû" nav in yan jî kurtiya peyvîne dinin - E. N.]. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 90)

<sup>49</sup> Li gor çapa L "Kersat" e. (El-Mes'ûdî, Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 90)

<sup>50</sup> Ji Kîtab et-Tenbîh we el-Îşraf, r. 88-90'î hatiye wergerandin

<sup>51</sup> **Cesed** navê wê golika [paşî bûye pût û senem] ku Îsrailîyan ew dipere. (Mevlût Sarî, El-Mewarid Arapça-Türkçe Lügat, Bahar Yayınları, İstanbul, n. d., r. 219). Berê dihate gotin ku "Şeytan dikeve nav pûtan û xeber dide", dibe ku ji ber vê yekê "Cesed" wek navê şeytan hatibe qebûl kirin.

<sup>52</sup> **Tahmûrs** şahê duyemîn ê malbata Pişdadiyan e û di destanên Îranî de navê wî derbas dibe. Ew merivekî efsaneyî ye û tê gotin ku keleya Babilê bi destê wî ava bûye, wî xelkê hînî mesele û hîkayeyan kiriye, heywanên kovî û hesp jî wî kedî kirine. (Ferdînanî Tûlû, El-Muncid fi el-Luxe we el-E'lam, r. 438)

<sup>53</sup> Di çapa B. M. de "el-Helbanî" ye. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb c. 2, r. 251)

<sup>54</sup> Di çapa B. M. de "el-Lezbi" ye. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 2, r. 251)

<sup>55</sup> Li nik B. M. "el-Xalî" ye. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 2, r. 251)

<sup>56</sup> Ji Murûc ez-Zeheb, c. 2, r. 249-251'ê hatiye wergerandin.

<sup>57</sup> Li gor B. M. "Îbn Beyhes el-Heysemî" ye û li cem M. "Beyhes el-Cehdemî" ye. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 3, r. 302)

<sup>58</sup> Ji Murûc ez-Zeheb c. 3, r. 302'yan hatiye wergerandin.

<sup>59</sup> Li gor çapa B. M. "ed-Diyyanî" ye. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, cild 5, r. 127)

<sup>60</sup> Di çapa B. M. de "es-Suryanî" ye. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, cild 5, r. 127)

<sup>61</sup> Li gor çapa B. M. "es-senc" e. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, cild 5, r. 127)

<sup>62</sup> Çapên cuda di vir de gelek tevlihevî çêkirine, ji ber vê yekê em mecbûr bûn ku hinekî li hev rast bikin. Nivîskarê Murûc ez-Zehebê gotiye: "Heft turûq (awayên lêdanê) hene", lê ew pênc heban dijmêre. Lê li gor Îbn Xurdadbeh ew heşt turûq in û wan gişan jî dijmêre, bes bi awayekî pir cuda û ecêb ku meriv neşê rastiya wan ji hev derîne. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 5, r. 127)

<sup>63</sup> Navekî wî yê din e ku Îbn Xurdadbeh dijmêre. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 5, r. 127)

<sup>64</sup> Di destnivîsê de "saykah", "sabkad" û "saykad" e. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 5, r. 127)

<sup>65</sup> Li gor B. M. "ya ku ruh jê hizdikin" e. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 5, r. 127)

<sup>66</sup> Di çapa destnivîsê de "hewberan û cuwey'eran" tê. (El-Mes'ûdî, Murûc ez-Zeheb, c. 5, r. 127)

<sup>67</sup> Ji Murûc ez-Zeheb, c. 5, r. 127'an hatiye wergerandin.



# GOL

Mehmet Tanrıkulu

wexta tarîya şevê bi ser gola wanê de digre  
xwe li rêwîtiya demên borî kar dike ava lacîwerd  
şîrçe-şîrqa nalên hespa olan dide li şeva seqirî berê  
sîwarên eşîra xwanê dikin paşê bi ezamet  
bi çirisînên zîvîn li bin hîva nûgerr

sirreka sar xwe li rûyê wê pelîne  
hêdîka vediciniqe  
bêtir noqî bîranîna dibe  
nêz dibin siwar li çargavî  
heye-heya wan pêlek nû dide golê  
dîlê wê germ dike

dest bi sitrana tenêbûnê dike  
sosinek  
ji serê latekî ku xwe li asîmana girtî  
sitraneka reşgirêdayî  
lê bihêrs û rik

dixwaze bask vede were peravê  
nekarîn dibe tîr li dil  
eylokî perrîkestî ye êdî kela wanê  
tevî hêvîyên xwe î baskokirî

û siwar  
li bayê bezê buhurîn çûn  
tevlî tarîyê bûn

gol bi xwezî û keser dinêre li pey wan  
di dil de kêfxweşîya tevlîbûna sîrrê siwaran

# DELÊ DAYIZÊ

Mehmet Tanrıkulu

govendek destpêdike li bilindahîyê  
xwe li ba dike pelekî ji rengê hemû zer û soran  
li ber bayê sar î payîze

tenê lerz e ew  
li vê berêvara dereng

li jêr dinêre  
li axê  
li jor  
li asîmanê ji ewrên rengerisas tikandî dinêre  
ne dest ji darê dibe  
ne dikare li hember gazîya axê xwe ragire

werr  
dudil dimîne demekê  
paşê  
xwe ber dide  
bi giranî datê xwarê

li jor dinêre careka din  
li asîmanê bilind  
li pelên mayî

bî keser radimûse axê  
û  
pişta xwe dide bayê hênik  
hiltîne serê xwe  
diçe

di dil de xembarîya refên çivîkên koçer

# GOZÊRE

Serdar Roşan

**M**in di dewêke de cayê xu girot. Heyatê min, kê min, weşî û nêweşiya min, viyarteyê min heme etya yê. Wazena verê ku ez behsê xu bikerî, bi kilmî bo zî dewê xu bidî naskerdiş. Verê ku ez bêrî dinya û kokê xu vera bidî binê 'erdî û di serê riyê zemînî de şax bidî û berz bibî, awankerdoxê cê hameyê etya ronawo û ena dewe awan kerda. Di xortaniya xu de, min reyêke waşt ez dewican ra perskerî ka gelo ê ça ra hameyê, verûcû ça biyê, la heyf min cesaret nêkerd. Min va, ê go (do) bi min bihewê; yariya xu bi min bikerê; go vacê ti kam a, yê ku heyat dawo to ma yê; ti seyîn persanê anakî ma ra kena?

Ena dewa ku ez tede wa, di qerajê koyêke de viraziyawa. Erê raşt o, no ko zehf berz niyo; la gorey dormarê xu koyêkew berz yeno qebûlkerdiş. Di qerajê koy de hîrayî ser o yew-di û dergî ser o bi qasê çend kîlometreyan raşteyêke esto. Di binê enî raştî de berziyêke -ku rêzila sî û zinaran ra viraziyêna- ze dêsêkew tebi'î di binê dewe de seraser derg biya. Eno cawo ku dewe tede hameya awankerdiş maneno sedirêke. Ti vanê qey ena dewe di serê a sedire de ništa ro; pašta xu dawa koy û lingê xu veredayê acêr. Gorey dewanê dormarê xu, dewêka pîl a. Qeybê ke serê bananê îne pê wa hameyê awankerdiş û zehf reyan dêsê kalekan (kiştan) bi şirikî hameyê viraştiş; cor ra, serê koy ra banê dewe ze raşteyêko hîra eysenê û kuçeyê miyanê banan teng ê, dûrî ra weş nêeysenê.

Zimistanan hewa serd o; vewre zehf varena; locinanê banan ra dûyêkew tenik beno berz; loma (coka) zî wexto ku yewo xerîb dewanê pey koy ra bêro û cor ra, serê koy ra banîro, eger dûyê locinan ra nêbo go niyaro xu vîrî ku dewêka pîle di binê vewre de wa.

Hinî berziyê koy bi daranê mazêran pişte yê; labelê hetê rocawanî rût û repal o. Enka zî weş yeno vîrê min, heya wextê xortaneya min, eno der û dor heme daristan

bi. Ay çaxan dewa ma zî zehf qelebalix nêbî. Di miyanê ay daristanan de heme tewir teyr û tebûrî, heywanê koyî peyda bîne. Vergê harî gege hameyne nîzdîyê dewe û zûrayne. Daristan mekanê heş û wehşanê koyiyan, liwan, kuzan, arwêşan, pilûran û gelekî bînan bi; di miyanê daristanî de enî tewir heywanî di dinyay xu de ciwiyayne. Derheqê koyiyan de zehf meseley û estanikî estê, labelê ez etya behsê îne nêkena. Bi pîlbiyayîşê dewe, vêşîbiyayîşê dewican û ramitişê 'erdan, verra verra ay daristanî biy vinî. Enka zeke sereyêkew keçel, etya û ûca çend darî mendê. Ez şîma rê sîrrêke xu vacî la yewî ra mevacê. Raştiko ez zehf tersayne; min vatêne go rocêke dore bêro min zî, go bêrê serey min zî tera bikerê; weşî û bextiyariya dinya ra min bêpar verdê; çîmkî dî verê çîmanê min de çend way û biray min bi xîzaranê pîlan kerdbî 'erd ra. Ez bi rocan bermawa. Bermayîşê min him semedê îne ra him zî semedê halê min, tersê min ra bi. La şîkir Homay rê, heta enka dore niyameya min.

Ver bi rochelât ko berziyan û dolan ra viraziyêno. Di hetê rochelâtî de, berziyê rêzilanê koy di reyêke de nêbiriyênê; hetanî des kîlometrey dewam kenê. Qerajê koyan bi rezan piştayê. Di miyanê rezan de ca-ca vamêr û miroyêrî benê berzî; hetê engure û şîrney engure ra dewa ma zehf pêt a.

Ez cay xu ra heme enî dewan û gomeyanê ku di hetê vakûrî de hamey awankerdiş vînena. Ma ra zehf dûrî niyê. Dûriya yew yewî bi pay qasê se'etêke, yê bînan zî di se'etî rehîr o. Dewê ku di pey koy de yê min ra nêyensenê; derheqê îne de ez zehf çî nêzana; labelê wexto ay dewan ra yew bi meymanî yeno dewa ma, bi nimitikî bo zî ez îne ra tanî xeberan gêna. Dewicê min û meymanê îne xu rê konê miyanê terraqe; bi se'etan yewbînî dir xeberî danê; behsê pes û dewaran kenê; 'erd, rez û bexçan ser ro qîsey kenê. Ê vanê qey hema yê xu rê xeberî danê û xeberîdayîşê îne beno vinî. La raşt niyo. Ez şahidê îne wa. Vengo ku fekê îne ra vecêno, di hewa de beno vila û pêl bi pêl reseno min. Ez zî bi enawa kar û xebata îne ra haydar bena.

Şîma zanê ez çî ra zehf hes kena? Rebenê Homay, şîma go ça ra bizanê! Baş o, bê ku ez şîma 'aciz bikerî, ez go vacî. Ez govendan û şewbêrkanê îne ra -ayê ku peyniya payîz û verniya zimistanî de yê- hes kena. Dewicî, hergû şewe di keyeyêke de kom benê û terreqnenê. Vahîrê keyî bi gorey taqetê xu meymananê xu rê bastêx, meşlûlan, eşkican û fikiyânê wişkan, lepikan, dendîkanê vaman û gozan di serê sînî de ronano. Eger di şewanê îne de dengbêjêke zî hazir bo, ay çaxan kêf kêfê min û cematî yo. Bi berzbiyayîşê vengê dengbêjî bêvengiyêke xu veradana serê dewe û merdim vano qey yew cîf (nefes) nêgîno û nêdano. Gege ez fikiriyêna vana, gelo enî dewicî çî rê ende enî dêran ra hes kenê? Eger şîma bizanê û min ra zî vacê ez go zehf kêfweş bibî... Govende. Qet mevacê. La veyveyan weştir çî esto? Wexto ku dewicî heme konê govende; cinî, camerdî, keyney, xort û tûtî heme di raştay govende de bi şayî kêf kenê; keyney û lacî bi zerêka lertzaya nîzdiyê yewbînan benê û dest di destê yewbînan de govende gênê; ez zî bi enî halê xu kona miyanê şayiya îne; bi pelan û şaxanê xu, di binê hewayêke honikî de pêl dana. Yew weşiya govendan vera yewbînan dêrvatişê grûbanê govendgêran o, yê diyîne zî di ereyê şewe de pîrodayîşê

bilûre wo. Bilûrvan (lulîbend) bi naz luliya xu taneka xu ra veceno, hêdî hêdî di miyanê lewanê xu de ca dano serey lulî û bêvengiya şewe şikneno; xeberoşkan û meselan bi bilûra xu lûrînenno. Wexto ku lulîbend qaydey vergî û kutikî ceneno ti vanê qey hanî yo pêrodaiyîşê îne di verê çîmanê heme goştaritoxan de qewimêno; wexto ku verg zorê kutikî beno, lulî bi keder û xem veng vecena; riyê îne ra fam beno ku goştaritoxî zî di binê tesîrî de yê; la wexto ku kutik zorê vergî beno, hindî lulî girêna; şayî ya, te dir riyê goştaritoxan beno a...

Ti raşte vacê, eger enî govend û şewbêrkan ra zî nêbo, di qerajê enî koy de viyartîşê wextî go zehf zehmet bo. Vera vay vakûrî û di binê vewra zimistanî de ez bi enî şayî û terraqanê îne bena germ û sebrê zera xu ana. Ay zî çînebîne Homa zano go çiqas vîşêr hucrey min bimerdêne...

Ez bi biyayîşê xu deyndarê ena dewe wa. Sayey dewican de ez esta û ciwiyêna. Loma zî ez îne ra zehf hes kena. Seyîn ez hes nêkerî? Kam di cay min de bo go ana vaco. Ez û ê ma biyê birakî. Çi baş, çi xirab, zehf çiyê ma kewtê tê miyan, ma di xidareya serdê zimistanan û kelakela amnanan de piya xu ver ro dawo; di ena dinya de yew nêşkeno ma yewbînan ra abirno. Ez îne hemine weş şinasnena. Qican ra heta pîlan, pes û dewarê îne, keyney û lacê îne heme min dir bi awayêke şirik ê. Vîstikêke çînya ku ez çîke nêşnawî yan zî nêvînî. Ez hindî şîma ra vacî çî? Şîma nanîk ê zanê ma çiqas nîzdî yewbînan ê.

Ez xu erzena wijdanê şîma wendoxan û verê vatişan biney ver bi xu tadana. Key ra ez etya wa, seyîn min etya ca girot, nîno vîrê min. No semed ra min 'efû bikerê. Şîma raşte persê ez zehf biya pîre; zeke şîma zanê, wexto ku merdim beno pîr hindî kiçî (kes) nêşkeno heme çî biyaro xu vîrî. Beno ku min bi seyan zimistan û amnanî diyê. Ez gege fikirêna; gelo mumkin o merdim heme çîyanê heyatê xu yê verî biyaro xu vîrî? Şîma min ra pers kerê, eger bi temamî nêbo zî çiyê muhîmî lezalez vîrê kiçî ra nêşînê. Ay çî di kujêke hêşê merdimî de xu danê pêser; bi sebir pabey rocê xu vîndenê. Eger si'ûdê îne bibo, rocan ra rocêke pêlê geyrayîşî û vîrardîşî resenê kujê îne û bi awayêkew zerweş yan zî xemgîn îne newe ra xulîqnenê. Bi newe ra xulîqnayîşê ay zanayîşanê kanan û ciwiyayeyan merdim reyna ciwiyêno. Tanî merdimî bi kêfweşî enî çîyan hergû roc anê vîrê xu; di çarçîbaya mezg û zanayîşî de tenî bo zî enî çîyan tekrar kenê û pê hewîya xu anê. Labelê merdim hergû hewe raştê weşî û rîndî nîno; gege bêhemdê merdimî bo zî meseley nêweşî, tahlî xu aver danê û merdimî dekenê miyanê torra xu. Bi kul û keser merdimî tê şanênê; milûl kenê. Herçiqas ku merdim wazeno gamêke verûcû te ra xelas bibo zî eno karêkew asan niyo. Cuwe ra ez neçar a ku behsê meselanê weşan û nêweşan, meselanê zerweşî û xemgînan, tahl û şîrînan hemine bikerî; ma heyat bi xu enawa niyo?

Eger mowsimanê wesar yan zî amnanî ra rocêke rehîrê şîma bi enî cayan bikewo, bêrê min hete, di binê verestîya min de xu derg kerê û goşê xu bidê min; şîma go ay deme qestê min fam bikerê. Raşta zî reyêke tenî çîmê şîma biguno min, şîma go heme heyatê min di binê qîrmiçanê riyê min de bivînê. Di binê ay qîrmiçan de

game bi game heyatê min, rocê min ê viyartey û xatirayê min estê.

De hela bêrê ez û şîma ma kışta yewbînan de roşê; henda ku ez bieşkî û taqetê min dest bido ez go şîma rê tanî xatirayan û meselanê dostanê xu vacî. La enî çiyê ku ez behs bikerî, zehf rey xu di payîzê heyatê merdimî de leqnenê. Ê zî nêwazenê bê qeyd û belge bimirê, şêrê. Cuwe ra xu tê danê û eger bi nuştîş nêbo zî wazenê bi vatiş di zanayîşê tanî merdiman de heyatê xu bidê dewamkerdiş û di rêzila vîran de cay xu bigîrê.

Gelo şîma vanê heqê îne çinîyo? Hela min rê vacê, gelo çîke yan yew esto ku bi waştîşê xu, bê ku çîke di pey xu de verdo, serey xu bigîro û ena dinya ra şêro? Eke şîma min ra pers kerê, ez bawer nêkena. Cuwe ra her çiyê ku esto, semedo ku bieşko heyatê xu bido dewamkerdiş timûtim di xebate de wo. Enî semedan ra heqê xatirayan 'erd ra heya asîman esto ku yê zî biwazê hergû hewe xu newe bikerê û bêrê vîrê ma.

Pêlê fikiriyayîşî di serey min de bi enî hewayan geyrenê. Erê ti bi Homa y kenê, ti vanê se? Enî çî konê serey to, to rê maqûl ê? Ti û kêfê xu. Eke ti meraq nêkenê ka ez go vacî se, ti wazenê hema etya, bê ku ti rêzêke tenî zî biwanê wendiş ra fek vera de, mefikiriye. Ti go bieşkê?

Belê, ez heyatê xu û dostanê xu ra şîma rê çend nimûneyan û xatirayan vana.

## 1

### HÛTÊ GOLA QORQORÎ

Tiya ra henda se serre verûcû, rocêke rocanê payîzî ra, dewicî di keyeyêkew pîl de ronîşte û di miyanê terraqêka germ de bîy. Îne behsê camêrdî, ters, cin, perî û hûtan kerdêne. Ereyê şewe de vatiş hame Hûtê Gola Qorqorî ser. Qalî derg bîy; ronîştey şî-hamey û di peynî de va yew nêeftareno bi şewe şêro ûca. Husênî miyanê cematî ra va ez eftarena. Nêeftarenê, eftarena, welhasil îne şert kerd. Dewican va eger ti meşte şan de şêrê serê Gola Qorqorî û şewe ûca bimanê, ma go di çîwalan genim bidê to. Husênî û dewican pê kerd. Ereyê şewe dewicî werîştî vila bîy, hergû yew şî kê xu.

Lazim bi ku Husên meşte şan ra heya şefeqî, tenî, di Newala Qorqorî de di serê gole de bimendêne. Ti raşte vacê Husên poşman bibi û tersayne, labelê reyêke soz dabi û ser ra zî şert kerdbi. Ciniya yê Zerê, bi heyran û qurban ci rê lavayî kerde; yê ver ro geyra la fayde nêkerd. Heya nimacê yerî Husên bi ters û heyecan di dewe de mend. Ver bi şan wişt we, tifingê xu yo qapsulin girot; di nanê tenûre, di serey piyanzî, tanî tantûr û tanî sola ku kerdbî miyanê potikêke, pêro kerdî tewrey xu û verê xu şa Newala Qorqorî.

Newale henda çewres deqîqa bi pay dewe ra dûrî bî. Di serê rehîrê xu de Husênî xu bi xu va verê ku ez şêrî newale, ez go şêrî Yeniyê Maran; beno ku si'ûdê min bibo

û ez çend zerecan bikişî û şan de di verê gole de biney şama min weş bo. Husênî rehîrê xu tada ver bi Yeniyê Maran. Rey rey ver bi şan semedê aw ra zerecî hameyne yenî ser. Husênî velg ra xu rê kozikêke viraşt û kewt miyanê kozikî, bi hêviya ku zerecan bikişo. Ba'dê wextêke, refêke zerecan di serê yenî de nişt. Husênî tifingê xu girot, qundaxê tifingî weş sîney xu şana, nişan girot û giştî xu ya destê raştî -giştî şade- di linga tifingî de şidêna. Gumiya tifingî ra çend zerecî perray û çend hebî zî di verê yenî de perpiziyayne. Husên wişt we û ver bi zerecanê perpiziyayeyan vazda; hîri zerecê gozelî tepişti. Heme hîri zî sere birnay, dekerdî tewrey xu û verê xu şa Gola Qorqorî, şî.

Tarî hêdî hêdî kewtêne 'erdî ser. Wexto ku Husên resa serê gole, hindî zehf wextê yê nêmendbi. Lezkanî biney percînî, darê wişkî û pûş day pêser û di verê gole de cay xu nişan kerd. Bêsi'ûdiya yê rê şewêka tarî û dermate bî. Merdimî nêşkayne verniya xu bivîno. Husênî biney pûşî, heste û berheste taneka xu ra vetî; bi destê xu yê çepî pûşî û di kiştî pûşî de berheste tepişti, hesteyê adirî pêtkanî da berheste ro. Ba'dê ku çend rey heste û berheste pêtkanî gunay pê ro, çiqlikan pûşî girote. Husênî ca de puf kerd û adir tê vist. Hindî dormarê yê di sayey adirî de kifş bine.

Husênî zerecî tewre ra vetî, ruçiknay; wişt we şî gole ver, zerey zerecan pak kerd û ageyra; adirî ver de ronîşt. Bi kardî hîrê hebî şivî heway şîşan semedê pewtişê zerecan ra taştî û pak kerdî. Zerecê xu sole kerdî û semedo ku sole weş tehmê xu bido goştî, zerecê bi şîşan wa di kiştî xu de siyan ser o nay ro.

Adir hindî girr bibi. Di verê adirî de ronîşte, bala yê şî kilanê adirî ser û we kewt miyanê xeyalan. Dinyaya cin û periyan, dinyaya dêw û hûtan di mezgê Husênî de xuliyayne. Xeberoşk û meselay tersî, di verê çîmanê yê de ganî bine. Tariyê şewe ze kaposêke xu yê ro piştêne; nîzdî yê bine. Bêhemdê xu, xu bineyna ver bi adirî ant; adir ci rê bibi paşmêrêke. Di ena şewa tarî de xu di ena newale de tenî û bêçare hîs kerdêne. Bala xu hina zehf da kilanê adirî. Kilanê adirî, di verê çîmanê yê de şiklê ciya-ciyay girotêne. Ciniya yê Zerê hamî vîrê yê. Gêsê Zerê di verê çîmanê yê de bine berz; bine derg; bereqiyayne; birû, çimî û lewê ya yê sûrgulî eysayne. Çimê Husênî ver bi cêr radiyay; gerdenê ya û sîney ya wo hinarîn eysayne. Husênî bi niyeto ku destê xu çicikanê Zerê ra no, destê xu ver bi ya berd; la semedê veşayîş û dicayîşî ra, yê destê xu ant û veciniqiya; bi awayêkew matmende haniya dormarê xu ra. Zege vaco ez etya se kena, ka Zerê ku ra şî? Biney badûcû xu hesiya; sozê yê û dewican û şertê îne hame vîrê ci. Axiyêka xorîne ante. Çiqas wext şibi yê nêzanayne. Adir sist bibi. Çend darî eşti adirî ser û pê adir geş kerd. Wişt we şî verê gole, sere û çimê xu şitî û ageyra hame cay xu.

Semedê pewtişê zerecan, di kiştanê adirî de sîy nay ro kuçike viraşte; zerecê bi şîşan wa dartî we û kuçike ser nay. Herçiqas yê nêzanayne la hindî erey bi û şewe nîme bibî. Şewêke bêvenge. Eke vengê veşayîşê daran û qurr-qurrê qurrqurrokan ra nêbine vengêke bînî ena bêvengiya şewe nêherimnayne.

Gola ku we ver de bî, zehf xorîn û hîra nêbî. Xorîneya gole hirî-çar, hîrayeya ya

şêş-hewt û dergeya ya zî henda des metreyan bî. Di miyanê sîyan û zinaran de ze hewzêke eysayne. Tanî awa gole dewanê corînan ra, pey dereyêke hameyne, qîsmo bîn zî di binê gole de miyanê zinaran ra veciyayne. Amnanan wexto ku dere bîne ziwa zî tim aw serê gole ra herekiyayne; ver bi cêr şîne. Amnanan xortî hameyne kewtêne ena gole, la şewan tersan ver çi kesî nêeftarayne rehîrê xu bi enî cayan bîfîno... Xura sebebê şertkerdişê Husênî û dewican zî eno ters bi.

Di a şewa tarî de wexto ku Husên di gole ver de bi, dewicî zî di keyeyêkew pîl de pabey yê bîy. Hinan vatêne mumkun niyo ku Husên weş ageyro, go ters û cinawirî yê bikişê, tanîni zî vatêne willahî cinawir-minawirî çiniyê, eger o nêterso, go sax û silamet ageyro û go di çiwali genimê xu zî qezenc bikero...

Enka bala Husênî pewjîyayîşê zerecan ser o bî; la nişka va xumiyêke gole ra hamî, to vatê qey gole kel dana. Dimacû şiklêkew 'ecêb ze dêwêke gole ra veciya û ver bi adirî hame... Homa merdimî bipawo. O çi bobelat bi! Henda hîri metreyan derg, şiklêke zey însanan û pirçin, pirço derg, heşî xirabêr; sere û çimî zî zey yê însanan la yê zî pirçin. Miyanê çimanê yê nêeysayne, la serê serey yê zey torzîneke bi. Husên hêz ra kewtbi û nêşkayne xu têbido. Waştêne werzo, biqîrro; la çi heyf ku azayanê ganê yê zey waştîşê yê nêkerdêne... Dêwo seretorzînin hame verê adirî, di qarşî Husênî de ronîşt. Haniyayne Husênî ra. Ba' dê wextêke hêşê Husênî hame sere, dest û lingê yê hindî leqayne. Vengê xu nêkerd. Nêeftarayne vengê xu bikero. Zerecanê vezdînan ra ron kewtêne miyanê adirî û veşayne. Husênî bêhemdê xu şivêke tada ku kişta bîna zerece zî bipewjiyo. Dêwî zî zey yê kerd. Her reya ku Husênî şive tadayne, Dêwî zî bêzariya (teqlîdê) yê kerdêne. Husênî şivêke girote û ronê zerece cilanê xu sawit. Dêwî zî şivêke girote û teqlîdê Husênî kerd. Bi enawa, sere ra heya verê lîngan wirdînan zî xu di miyanê ronî de verda. Husênî nişka va piskoniyêke girot û Dêwî ra na; kile yo girot û Dêw di miyanê kilan de mend. Bi qîjîyêka 'ecêbe Dêw 'orra û rema şî, di miyanê gole de bi vînî.

Bi qîjîya Dêwî, Husên tersan ver xereqiyabi. Wexto ku bi xu hesiya hindî şefeq bi. Haniya dormarê xu ra, adir tefiyabi û zerecê yê veşaybî. Wişt we, haniya gole ra, haniya dormarê adirî ra, la çîkew fewqalade nêdî. Şî gole ver, sere û çimê xu şitî; hame fekê tewrî akerd, waşt ku biney nan û rantûr boro, la nêeşka. Herçiqas ku veyşan bi zî. Wişt we, tîfing û tewrey xu girotî û verê xu tada dewe...

Zerê, di keye de bi çimanê bêhewnan pabey mêrdey xu bî. Şiyayîşê mêrdey xu ra heya serê sibay di quncikêke de xu antbi pêser û bi ters û heyecan bermaybî... Bê ku hayiya ya te ra bibo ku mêrdey cay ver bi dewe yeno.

Şefeqê Homa ya ra, di xortî, di teberê dewe de, di serê rehîrê Husênî de pabey yê bî ku piya şêrê keyewo ku dewicî tede pabey Husênî vinderte bîy. Senî ku Husên eysa xortî şî verniya yê, piya rey ra şîy, bêveng. Xortan di binê çiman ra zeke merdim hanêno 'egîdan ra temaşey Husênî kerdêne. Husên di verê çimanê îne de zey Dêwêke eysayne û bi heybet rey ra şîne...



# NOVEL

## Hesenê Metê

**L**i gor lêkolîneran novel peyveke îtalî ye û tê mana **nûçe** û **nûyînê**. Etimolojiya terma novelê bi mana nûçe, nûyînê tê zanînê û cara pêşîn di deftera rêdarên keyser Justinianus de peyda bûye. Li wir weke **novellae** derbas dibe û dibêjin di wê demê de di binê vî navê **novellae**ye de biryarên nû hatine nivîsandin.

Dûre ev terma novelê bi mana **bûyer** an jî **bûyerên nû** di antolojiyên qesrên Îtaliya kevn de derdikeve pêş. Ew novelên di wan antolojiyan de, weke nûçe û bûyer hatine nivîsandin. Tê gotinê ku piraniya van nûçe û bûyerên ha bi zimanekî çîrokî hatine hûnandin. **Il novellino** yek ji van antolojiyan e ku li dor salên 1250î derketiye. Yeke din jî bi navê **Cento novelle antiche** ye ku ew jî li dor salên 1300î derketiye.

Lê di salên 1350î de bi navê **Giovannî Boccaccio** nivîskarekî îtalî sed novelên kurt bi hunermendî û pîvanên novelên îroyîn bi awayê prosayî dinivîsîne û bi navê **Novelên Decameron** derdixe. Û herweha ev di tradisyona ewrûpî de dibe cara yekem ku bûyer, çîrok û serpêhatî bi rengekî hunereke bilind têne nivîsandin û di lîteraturê de bi navê novelê ciyê xwe digire. Ew novelên îro bi gelek reng, stil û êkolên nû û cuda hemû jî deyndarê vê **Decameron**a **Boccaccio** ne an jî em bibêjin novela hunerî ji wir, ji wê demê û ji wî belav dibe.

Formên novelên wî kurt û mijarên wan têvel in: Metranên xerifî, rahîbên doxînsist, mezinên kêmaqil û sed babetên weha... Weke tradisyon di piraniya wan novelan de motîfên çîrokên orientâlî û fablên dewra navîn hatine hûnandin. Mîna ku em pê dizanin di sedsala yanzdehan de bi awayê prosayî romanên şovalyan jî dest pê kirine. Lê dema ku **Boccaccio** di demeke humanîzmê de dest bi van novelên xwe dike, di prosayê de bi formeke **nû**, bi formeke **kurt** dinivîsîne. Ev **kurtiya** ha ji bo

novelê dibe pîvaneke bingehîn û di lîteraturê de bi navê **novelê** rûdine.

Herweha meriv dibîne ku novel jî bi romana wê demê re weke babetekî prosayê geş dibe.

Piştî ekola **humanîzmê** tevgera **ronesansê**, ekola **klasîzm** û **romantîzmê** dide pey. Lê wusa diyar e ku ji humanîzmê û heta ekola realîzmê jî guhertinên wusa radîkal di form û hunera novelê de çênebûne. Loma ev form, nav û navaroka novelê heta dema realîzmê jî bêyî serêştî û sergêjîyekê tê.

Di êkolên **realîzm û naturalîzmê** de, bi gotineke din di navîna salên 1800 û 1900î de di warê form û navaroka novelê de ronasanseke hunerî dest pê dibe. Novel bi Pûşkîn, Gogol, Maupassant, Çêxov û gelekên mîna wan di lîteraturê de dibe xwediyê cîyekî balkêş û xwe davêje sedsala dawîn.

Li gel van êkolên realîzm û naturalîzmê di vê sedsala dawîn de du êkolên bi reng û kirasên din jî derdikevin ku jê yek **expresyonîzma** Kafka, Strindberg û James Joyce e.

Bi vê êkolê re em dibînin ku bi navê **existensîalîzmê** şaxekî felsefê û ekoleke nivîskariyê derdikeve û di berhemên gelek nivîskaran de reng dide. Bo nimûne weke pêşengê vê êkolê J.P. Sartre û gelekên mayî.

Her êkol bi serê xwe reaksiyonek e, serhildaneke ekola beriya xwe ye, felsefe û tevgerê e, rewş û haletekî rûhî ye ku li ba xwediyê wan êkolan e. Û bêguman heyîna her êkolekê jî gavek e, renek e ji bo geşbûna lîteraturê. Ji ber vê yekê ye ku meriv nikane bibêje novelên kîjan êkolê çêtir, baştir, an jî xweştir in. Û ne tenê êkolên nû, di roja îroyîn de xwendevanên hemû êkolên buhurî jî hene. Li gel van êkolan îro meriv rastî gelek nivîskar û novelên wan tê ku ne tenê ekolek, herweha reng û bêhna çend êkolan jî ji berhemên wan tên.

Di kîjan êkolê de dibe bila bibe, pîvanên novelê ne **xweşikiya** novelê ye. Peyva **xweşik** peyveke îzafî ye, pûç e, hîssî ye û bêmane ye. Pîrî caran ji bo motîfa novelê tê gotin û dibêjin: noveleke **xweş** e. Ev xweşî xweşiyeke hîssî ye û ji bo wî an jî wê xwendevanê xweş e. Ev nabe pîvana noveleke **serketî**. Peyva **serketî** bêtir pîvanên novelekê dihundurîne.

Noveleke serketî ji konflikt, konsentrasyon û klîmaksa xwe pêk tê û ew jî: Dîalog, monolog, sembol, stîl, ziman, nîgar û hinek tiştên mîna van tiştan e. Ku bi hunereke bilind ev mefhûmên ha li hev werin hûnandin û bi cî û wext bibin, ji bo novelê **serketinek** e. Motîf ne girîng e. Pîrî caran motîfa noveleke serketî, motîfeke bêmane ye. Em dizanin ku jîriya hunera nivîskarekî dikane maneyekê ji bêmanetiyekê ava bike.

*Novel: bi qasî romanê rê nade nivîskar ku qelî û zexeliyan bike, cêwî an jî hêwiya romanê ye, di prosayê de kakil e, xwediyê formeke şidiya û guvişandî ye, dihêle ku xwendevan zûtir û kûrtir têbigêhîje, di prosayê de desthilatiyeke hunerî ye...*

## PROBLEMÊN KU DI NOVELÊ DE HÎN JÎ SAFÎ NE BÛNE

Li gel ku di ser nivîsandina forma novelê re nêzikî 650 sal buhurîne, lê ev term û forma novelê hîn jî zelal ne bûye. Ne di nava lêkolînerên lîteraturê de, ne di nava zimanên navnetewî de û ne jî di nava nivîskaran de.

### Forma kurtî û dirêjayiyê:

Piştî ekola humanîzmê û novelên Boccaccio heta demekê jî ew kesên ku vî babetê prosayê bi navê novelê dinavînin, wekî pîvan **kurtbûyîna** wê didin ber çavan û heta derekê li ser vê yekê zelal dibin. Lê dema ku 1800 û 1900 tê û forma novelê diherike, novel deforme dibe, a wê çaxê serê gelek lêkolîner û zimanzanên lîteraturê tevlihev dibe û heta derekê nivîskarê novelê bi xwe jî nema ji nav derdikeve. Bi gotineke din, ew pîvana tradîsyonel ku digot di novelê de karakterê bingehîn **kurtbûyîna e, ji navînê radibe.**

Ji ber ku li dor salên 1830î bi navê novelê berhemên 138, 226 û 600 rûpelîn derketine. Û di van demên nû de jî, demên ku êdî em jî pê dizanin bi navê **Duelloyê** noveleke Çêxov 170 rûpel e, **novela** wî ya bi navê **Beyarê** 121 rûpel e, **Stocholma Bavê Nazê** 122 rûpel e. Ez **Labîrenta Cinan** weke novel dibînim û ew jî 197 rûpel e. Ev nimûnên ha jî didin diyarkirin ku ji bo novelê **kurtbûyîna** ne karakterekî bingehîn e, an jî ev **kurtbûyîna** hasergêjîyekê çêdike. Ji bo ku ji vê sergêjîyê bifilitin rabûne li ser pîvana dirêjayiya novelê pêşniyar jî kirine. Em bibêjin, di nava nivîskarên almanan de hinekan gotine: Ew prosayên ku di hunera edebî de heta 50 hezar tîpî dirêj bin, em wan bi navê novelê binavînin. Lê ez bi xwe van pîvanên weha mekanîk têr nabînim û loma li ser vê yekê nasekinim.

### Ji aliyê cî û wextê de:

Îro di hunera nivîsandina prosayê de **cî û wext** jî alîkarî nake ku meriv berhemeke hunerî bi navê novel an jî romanê binavîne. Ku em bibêjin: **novel** motif an jî figurekî di **cî û wexteke** teng de dihûne, em ê nikanibin ji çewtiyeke mezin derkevin. Lewra novelên bi panzdeh salan hatine hûnandin hene. Novelên bi deşt û çiya, novelên bi gund û bajar hene. Ji aliyê din ve romanên **bêwext**, romanên tenê di nava nivînan de an jî li ber mirinê hatine nivîsîn hene û van romanan ne **cî û ne** jî **wext** girtine. Herweha ev pîrsa ha bi **cî û wexteke** diyarkirî jî safî nabe.

### **Ji aliyê avabûnê de:**

Ji aliyê **struktura** xwe de dibêjin ku novel: **Konflikt, Konsentrasyon, Klimaksa** prosayê ye. Bi gotineke din: Novelîstekî serketî nakokiya bûyerekê (**konflikt**) digire (carina ji destpêkê, carina ji nêvî û carina jî em bibêjin ji kuderê pêwîst bike) tevayiyê bal û zelalê wê bûyerê dicivîne, diguvêşe ser hev (concentration) û ber bi mebesta xwe bilind dike (climax) û ji wir bi harmoniyeke pêwîst weke sembolekê ber bi dawiya novelê dadixe.

Motîf, dîalog, monolog, sembol, fiksiyon, figur, bûyer, cî, wext, ziman, nîgar û ew hemû tiştên ku ji bo novelekê pêwîst bikin, divê di çarçoveyeke weha de nerm bibin, bibine weke hevîr û dûre mîna beryadekî were çêkirin.

Di hûnandineke weha de pirî caran gelek tiştên li kêlekan, li hawurdorê bûyer an jî lehengê novelekê vala û veşartî dimînin û divê bimînin jî. Ji ber ku novel bi xwe formeke guşandî ye, zelal û kakilê bûyerekê ye, bi desthilatiyeke hunerî daxwaza dayîna mebestekê ye. Gotin û vegotinên zêde, zimandirêjiyeke wusa ye ku kubariya novelekê nahêle. Figur, motîf û mijarên nepêwîst ji bo novelê paç û pînên serêşê ne. Li ser valayî, veşartî, pêwîstî û nepêwîstiya van tiştan Guy de Maupassant weha dibêje: «*Dema ku hunermendek portretekî me çêdike, sikeletê me rê nade.*» Û di vî warî de Anton Çêxov jî nimûneyeke weha dide û dibêje: «*Dema ku meriv bixwaze ji latekî mermerîn ruyekî çêke, wan hemû aliyên ku êdî nabin rû meriv ê bavêje.*»

Lê ev pîvanên weha di roja îroyîn de ne tenê di novelê de, herweha di romanê de û nemaze di romanên kurt de jî baştir diyar dibin. Di warê hûnandina avakirî de jî herwekî ku meriv dibîne, cudayîyeke berbiçav di navbera noveleke dirêj û romanekê de ne diyar e.

Bi kurtebirî û bi qasî ku ez bi ser ve bûme, **wext, cî**, weke kurt û dirêjayî **form**, **avahî** û heta derekê ez dikanim bibêjim **nîgara** (teswîra) prosayekê jî ne pîvanên zelal in ku meriv bi navê novel an jî romanê bi nav bikin.

### **Di warê nav û ziman de:**

Ji bo ku vê tevliheviyê piçekî zelal bikin zimanzanan li gor zimanên xwe hinek termên nû peyda kirine, lê dîsa jî ev dudiliya li ser nav û navaroka novelê çareser ne bûye. Em bibêjin novela ku me behs kir, ji bo ingilîzan **short story** e an jî **taleyê** bi kar tînin. Ji bo ku cudayîyekê têxin nava dirêjayiya prosayê navê **novelle** jî bi kar tînin. (Peyva novela ku em pê dizanin jî bi mana romanê bi kar tînin.)

Herweha di fransî de jî sê peyvikên cuda bi kar tînin: **nouvelle**, ji bilî viya **récit** û **conte** bi kar tînin. Di swêdî de: **novell, historia, berättelse**. Di tirkî de: **Öykü**, (kîsa ve uzun.)

Wek gotinên dawîn dixwazim bibêjim ku nivîskarê swêdî Ivar-Lo Johansson li ser novelê dide zanîn ku: novel, weke mana xwe ya îtalî nûçeyekê nû ye, ewqas nû ye ku pêwîstî bi lêkolîna vê nûçeyê heye. Li gor dîtinên hinekên mayî jî: Di

lîteratura pêşerojê de geşbûneke bêtir ê vê tevliheviya novelê ji hev safî bike.

Herwekî ku diyar e gelek tişt li ser vî babetê prosayê, li ser novelê hatine gotin. Ez nawêrim û min dil nîne ku ez jî tişteki li van tiştan zêde bikim. Lê ez vê gotara xwe tenê bi pêşniyarekê, pêşniyareke ji bo kurdî berhev dikim û dibêim: Ev tevliheviya norm û karakterê novelê bêguman ji bo me jî problemek e. Di warê terma ziman de ev problema ha mezintir e. Meziniya vê pobleme jê yek: Em pîrî caran peyva **çîrok** bi kar tînin ku ev peyv ne bersiveke van peyvên xelkê ne jî. **Çîroka** me **masala** tirkî ye, **sagaya** swêdî ye, **fairy-taleya** îngilîzî ye. Bi gotineke din, bûyer û lehengê **çîroka** me berhemeke kolektîf, berhemeke anonîmîtetê ye. Lê novela ku em behs dikin tişteki din e. Loma jî bi gumana min ev peyva **çîroka** ku em bi kar tînin bersiva novelê nade. Ez dizanim gelek kes peyva **serpêhatî** jî bi kar tînin. Lê ez nawêrim vê peyvê jî bi kar bînim. Bi baweriya min heta zimanzanên me di warê ziman de bi ser nekevin, weke bersiveke rastir û têrtir peyvên nû nebînin, divê em jî **novelê** bi kar bînin. Bi kêmanî ez wusa dizanim.

18.06.1995

# ŞI'REKE EHMEDÊ XASÎ

## BÎ TIRKÎ, 'EREBÎ, FARISÎ, KURMANCÎ Û KIRDKÎ (ZAZAKÎ)

Ehmedê Xasî, di 1867 yan jî 1868'an de li Hezanê -ku nahiyeya Licê ye- ji diya xwe bûye. Wî, kitêba pêşîn a bi lehçeya Kirdkî (Zazakî) bi navê Mewlûdê Nebî nivîsiye û ev mewlûd di 1899'an de li Diyarbekirê çap bûye. Mewlûda Ehmedê Xasî, di 1994'an de li Îstebolê careke din çap bû.

Şa'irê navdar Cîgerxwîn di şî'reke xwe de derheqê wî de wenî dibêje:

*"Melayê Xasî mewlûda Zazî,*

*Bi zarê Zazî çêkirîye, ne Tazî,*

*Cengnama Kurd û Ermen nivîsî,*

*Wek agir berdî me diîsî."*

Ji vê şî'ra Cîgerxwîn tê fêmkirin ku Mela Ehmedê Xasî "Cengnama Kurd û Ermen" jî nivîsiye. Baş naye zanîn ev cengname bi kîjan lehçeyê bûye lê hin kes dibêjin ku bi Kirdkî (Zazakî) bûye.

Bi Tirkî, 'Erebî û Kurmancî jî şî'rên Ehmed Xasî hene. Xasî di şî'reke xwe de bi Tirkî dibêje:

*"Bir kavm kitapsız olsa,*

*Dilsiz davara benzer."*

Yanî *"Qewmê ku bê kitêb be, mîna dewarê bêziman e"*.

Ehmedê Xasî merivekî nuktedan bûye. Hin gotin û henekên wî hîn ji di nav xelkê de tên gotin.

Şa'irê welatperwer Ehmedê Xasî, di 1909'an de sê sal ceza xwariye û sirgûnê Rodosê bûye. Wî demekê mufîtîya Licê jî kiriye. Ev pêşengê edebiyata Kirdkî, di 18. 2. 1951'ê de çûye rehma.

Di 1986'an de hin menzûmeyên Ehmedê Xasî bi hev re wek kitêbekê hatibûn çapkirin (bi herfên 'Erebî). Ez di vê kitêbê de rastî xezela wîya jêrîn hatim û min ew ji herfên 'Erebî wergerand ser herfên elîfba Kurdî ya îro (lê min misrayên Tirkî li gor elîfba Tirkî nivîsîn).

Herwekî xwendevan dibîne, xezela wî ya jêrîn bi Tirkî, 'Erebî, Farisî, Kurmancî û Kirdkî ye. Yanî wî di her beşê vê xezela xwe de bi misra 'Erebî dest pê kiriye û bi misrayên Farisî, Tirkî, Kurmancî û Kirdkî dom kiriye. Eşkere ye ku karekî wenî, bê zanîneke fireh a edebî û zimanî nabe.

M. Malmîsanij

## XEZEL

Merheben ya men 'ela bî'l-husnî teqwîme'l-beşer  
Hafêz-eş Xalêq şewed ez çeşmê bednam o nezer  
Mucid-i esbab ü alat ü ve ma minha seder  
Dil ji qeyda leşkerê xem kir reha weqtê seher  
Ah û nalînê verînî, bî vinî, nêmend eser

Faqe heqqen şe'nuhu eqranehu mîn xeyrî şek  
Xatêrê maderê pîş manendê an eshabê seg  
Ruhuma dedi revanım ben de gittim kalma tek  
Yek bibin ta yek bibînin wek du çeşmê neh felek  
Husn û xulqê bi nisbet yê, nisbetê ma xeyr û şer

Men yelumnî lem yezuq bel zaqe mîn xemrî'l-'edes  
Hoccetê û-st melam-eş kê neşod kebkê qefes  
Müflis-i sem' ü basardır o ne görsün bu ne ses  
De'weta sûretlewendê kî nebûbe nîne kes  
Ma 'eleyna van nameyê, laîmê<sup>1</sup> îbnî seqer<sup>2</sup>

Fe'lemen fellahu xeyru hafizen hale'n-newa  
Xasîya, ba sebr<sup>3</sup> şew ta nûr şewed narê hewa  
Rehberindir bil bu derden<sup>4</sup> çünkü hem odur deva  
Yawerê rindan Nebî Ehmed çi insaf û rewa  
Dûriyey yîne hevalo, kufîrî ya ey bêxeber

Mewtuhu xeyrun lehu men fi't-tereqqî lem yekun  
Hey şewed an kê bêxaned der dël-eş 'êlmê ledûn  
Ma'den-i ahval-i alemdir benim kalbim bugün  
Dewleta Şabûr û Xaqan im li ser textê hesen  
Xedd<sup>5</sup> û xalan ra eger nêbo, çi zanê ma keder

Fate nûru'l-hikmetî fî darî men fîha 'emûn  
Xasîya, xafêl meşew ba î'n meqal-et ez derûn  
Rah-ı hızla ne sülûk çok itdi erbab-ı fûnûn  
Yazî yû xettê humayûn da bi te'wîlê zebûn  
Eşkera va dîtîşey Hoday, mehal û bi xeter

Men ye'îbû dînena ehlu'l-hewa bî'se'l-cehûl  
Hêkmetê î'n rah nedaned merdê şeb-rah o 'ecûl<sup>6</sup>  
Made-i Musa'da olan nice ehbar<sup>7</sup> û fuhûl<sup>8</sup>  
Damena şeyxê şeqî girtin bi wî ra bûn xezûl<sup>9</sup>  
Sûretê yîne sîya bo, yewme tesweddu's-suwer

Fexle'î'n-ne'leyne kella tunci<sup>10</sup> min seyfi'l-melam  
Xatemê xûb o 'Ereb ra ta konem 'erzê meram  
Raşha-i hamem burada dökdü dürrlerden kelim  
Yar û exyaran ku dîtin, "aferîn" gotin tamam  
Yo sebeb ra ma zî birna pêşkerê nazî şeker

---

<sup>1</sup> **laîm**: kesê ku lomeyan dike, kesê ku zem dike

<sup>2</sup> **şeqer**: doje, cehenem

<sup>3</sup> Di 'eslê metnê deli vir herfa "waw" (û) heye, lê dibe ku ji şaşîya çapê be.

<sup>4</sup> **derden**: ji derî

<sup>5</sup> **xedd**: gep, lam, alek, dêm

<sup>6</sup> **'ecûl**: kesê ku 'ecele dike

<sup>7</sup> **ehbar**: 1-kesên zana, 'alim, zîrek, 2-zanayê Cihûyan,

<sup>8</sup> **fuhûl**: 1-hespên nêr, 2-mêr, 3-kesên baqil û zîrek, 4-kesên ku baş beyt, hedîs û rîwayetan dibêjin

<sup>9</sup> **hezûl**: bêkes û bêalîkar mayîn û perîşan bûyîn

<sup>10</sup> **tunci**: tu ji wî xelas dibî



# NE AXPEREST ÎM

Arjen Arî

Xwestibim zolek, teyarek  
bi hed çend sed 'erd  
çiyayên têr devî, geliyên bi kanî,  
tê de beriyên adan şên û har,  
ez lê birîndar, tu li ser mirî  
hêlek qefalî zozan,  
hêlek dojeh deşt radestî ezmên  
serbilind, bi al, serbixwe  
Dîjle tê de, Ferat tê de, Agrî tê de  
axek xwestibim berê rojê de,  
xwestime simbil û das  
kulîlk û buhar,  
xilç û zarok;  
li ser darên wê cot cot qumrî û kevok  
welatek xwestime.

nebêje: axperest e?  
kalên min bi kevir û heste xwe spartibin rojê  
biratî xwestibin ji bo xwe û xelkê  
gotibin: dinya têra kê tune?  
ka zanîbûn ku li Mûsil, hasil li cî dimîne.

şivanekî birame:

pezê xwe nikaribe berde geliyan,  
bizinên wî nikaribin raperikin deviyan;  
bilûra xwe azad nikaribe bikutîne  
û mîhek wî zabe, navê berxa xwe  
nikaribe bike "Şengilo".

ne ji tirsî teba, ne ji xofa gurên çiyê  
zozanên wî lê qedexe bin  
rê, rêçik lê birrîbin, pir xera kiribin  
dor pêçabin, nikaribe bimîne şevînê  
û bihejmar bin di tûrikê wî de nanê sêlê, mewîjên Torê.

şivanekî birame:

ax lê fireh, ezman lê hatibe hev...  
di axa xwe de bê ax, kerax be tev!

şivanekî birame  
navê wî: bindesto.

ez ew şivan im

min ne bilûr e, min ne keriyê mîhan e  
min ne gov e, min ne gund e, min ne warê bav û kalan e.  
min gund berdaye... himî min berda, Xweda!  
kundok dixwînin, li çar aliyan dengê sa.  
Welatê min ji talankeran re maye.

hêviyeke min maye,

hêviyeke min berxên Şengilo.

min qir bike, lo! min talan bike, lo!

do hebûme lo! îro heme lo!

rûş o, xwedî ço! naqelim, naqelim lo!

ez ê sibe jî hebim, ez ê sibetir jî, lo lo!

# HÊNDÊ LAYENÎ KULTURÎ KOMARÎ KURDÎSTAN 1946

## II

Kerîmî Husamî

Le gotarî berî da, be kurtî basî hêndê hengawî Komarî Kurdistan kira le buwarî ziman û xwendin be Kurdî le medresan û weşandinî kitêb û rojnamên Kurdî. Berê ku bême ser beşî dumahî, dexwazim şaşiyekî xo rast bikem ku le nûsînî gotarî berî da derbaz bûbû. Kurd dibêjî "Zerer le her cêyek vegere her baş e". Şaşî le vê da debînim ku aliyê kulturî Komela J. K. nehatibû baskirin.

Komela J. K., berî Komara Kurdistan, jibo bujandinewey ziman û kulturî Kurdî gavên pir mezin hawîştibû. Kovara Nîştiman, wek bilawkirowey bîrî Komela J. K., tev helbestvan û nivîskarên Kurdî le dewrî Komela kokirdewe. Nek tenê le Kurdistana Îran, belkû le Kurdistana Başûr îş nivîskarên welatparêz gotar û helbest ji bo wê dişandin. Kovara Nîştiman tenê no hejmar lê derçû. Lê em dikarîn bêjîn le dîroka weşanên Kurdî rolê xoy diyar heye. Komela J. K. cige le kovara Nîştiman çend bilawok û nivîsên din îş bilaw kiriye. Wek: Rojîmêrî Kurdî, Komelehelbest be nawî "Diyarî Komeley J. K. Jibo Lawanî Kurd", Gulbijêrêk Le Dîwanî Hacî Qadirî Koyî.

Gawek din le gawên giring û pîrozî Komela J. K. sazîrînî tiyatroy Daykî Nîştiman bû. Tiyatroy Daykî Nîştiman be ibtikarî Komela J. K. û beşdarî lawanî Kurd hate ser şano.

Legel çalakî û têkoşînî teşkilat, Komele dexwast le têkoşanî nihênî bête der û wekî rêxistineke cemawerî, klûb û yaney xo awa bika. Lew deme da VOKS (Sazmanî Teblîxatî Nêwneteweyî Sovyetî) le Taran [Tehran] encumenî peywendî kulturî Îran-Sovyetî awa dekir. Komela J. K. le karbedestanî Sovyetî xwast ku le Mehabad îş encumenî peywendî kulturî Kurdistan-Sovyetî awa biken. Karbedestên Sovyetî daxwaza Komelê qebûl kir. Le meha Aprîla (Nîsana) 1945, be beşdariya konsulî Sovyetî le Wirmê û serokî VOKS le Azerbaycanî Sovyetî, Encumenî

Peywendî Kulturî Kurdistan-Sovyetî be awayekî resmî hate awakirin. Encumen bûye cihê civata roşenbîr, nivîskar û helbestvanên Kurd û xelk be giştî.

Tiyatro Daykî Nîştiman, maweyêkî zor le bajêrên Kurdistanî azad hate ser şano û le layen xelk hate pêşwazîkirin. *"Beşt serincrakêş û berçavî vê operayê eve bû ku jinêk be nawî Daykî Nîştiman nîşan dedira ku le layen sê kesî lat û serserî, wate Îran û Îraq û Turkiya destdirêjî bo kirawe. Le dûmahî da kurrên aza û bexîret le çeng ev bêşermane rezgarî deken. Xelk be ditinî vê dîmenê, deha rojan, be awayek ku tenanet dujminên kewn îş le katêka degiryan, yektir-yan le amêz degirt û swênd-yan dexward ku toley vê daykê bistênnewe."*<sup>1</sup>

Tiyatro Daykî Nîştiman, bindestî û dagîrkirina Kurdistanî nîşan deda. Peymanîşûmî Se' dabadî diêna ber çav. Le axir da kurrên Kurd radeperîn û bezebrî şimşîr zincîrî koletî depisênin û Daykî Nîştiman-yan azad deken.

*"Le salî 1945, le layen lawên Kurd operayek hate ser şano. Le barî çonyetî û tesîrî le ser xelk bêwêne bû. Nawî opera Daykî Nîştiman û be zimanî Kurdî peyamêkî nasyonalîstî bû. Daykî Nîştiman le metirsî da û destên wê zincîr kirabûn. Tev bîneranî opera, legel dengî xefetbarî giryanî roleanî Daykî Nîştiman ku le pişt perde dehate bistin, degiryan û rondik derijandin. Jibo yekem car le Kurdistan le rêgay ev operaye bîrî qûl û tundî nasyonalîstî dehate agabûn. Berastî operayeke xembêner bû."*<sup>2</sup>

Arçibald Rozvêlt ku le serdema Komara Kurdistan çûye Mehabad û Qazî Mihemed dîtiye, le barey tiyatroy Daykî Nîştiman denûsê:

*"Le Aprîla (Nîsana) 1945, xaney VOKS -Sazmanî Teblîxatî Sovyetî- Encumenî Ferhengî Kurdistan-Sovyetî le Mehabad damezrand. Yek le bernamey serekî, tiyatroyekî nasyonalîstî Kurdî bû. Meseley 'eslî ev tiyatroye birîtî bû le destdirêjî sê kesî çepel û xerab, wate Îran û Îraq û Turkiya jibo serzemîni Kurdistan û le dûmahî da rezgarî Daykî Nîştiman le layen kurrên wê."*<sup>3</sup>

Piştî tiyatroy Daykî Nîştiman, be ibtikarî encumen le Mehabad, Mîr Mirên saz kira. Mîr Mirên, dabêkî kewnî Kurdewarî ye. Jibo kovekirina yarmetî û pîtak jibo pêkhanîna hêzên bergirî Kurdistan pîrr baş bû.

Damezrandina Encumenî Peywendî Kulturî Kurdistan-Sovyetî, gawêk bû jibo naskirina bizavî rizgarîxwazî neteweyî Kurd. Encumen bû şwênî kombûn û civata nivîskar û helbestvan û roşenbîrên Kurd û nawendî berfirehkirina ziman û edeb û kulturî Kurdî le melbendî azadî Kurdistan.

Dûmahî heye.

<sup>1</sup> Drk Kinyan, Kurdekan û Kurdistan, Wergêrranî: Birayim Yûnisi, 1992, L. 180-181

<sup>2</sup> Îgilton, Komarî 1946 Kurdistan, Wergêrranî: S. M. Samedî, 1963, L. 78

<sup>3</sup> Arçibald Rozvêlt, Şoqî Amûxten, 1392, L. 328

# DI DERHEQÊ WEŞANÊN GIŞTÎ Û NIVÎSKARIYÊ DE ÇEND RÊZ

Şahînê B. Soreklî

**D**i vê gotarê de min dil heye bi kurtî çend rêzan di derheqê weşanên giştî, nivîskarî û demokrasîyê de binivîsînim. Tevî ku weşanên Kurdî yê giştî bi sînor in jî, bawer im kat heye da merov li ser erk û kalîteya wan binivîsîne.

Rojname dibe, kovar dibe, radyo û televîzyon dibin, heta çêkirina kasetekê jî, divêt kalîteya xwe hebe. Wek hatiye gotin, têrê nake merov bibe xwediyê kemañçeyekê, ya grîngtir ew e ku merov dengê xweş ji wê kemañçeyê derxe. Tiştê girîng ne reng û qaba rojnameyekê, pirtûkekê, yan kasetekê ye, ne hebûna bernameyêke radyo ye, lê bêtir kalîteya berhemên di wan de ye.

Mafên gelê Kurd û têkoşîna wî zor girîng in û divêt neyên jibîrkin, lê divêt bête zanîn ku em beşekê vê cîhanê ne. Em nikarin tenê di nav ava tasa xwe de bijîn, divêt em xwe têxin nav ava çem û deryayan. Rojname û kovarên me divêt pirsra Kurdî û têkoşîna netewî li paş nehêlin, lê li milê din, dagirtina hemî rûpelan tenê bi tiştên ku eynî xwebêjan diyar dikin û weşandina "gotarên" tijî gotinên erzan, kilîşeyên dehsalan û heta qiseyên xirab ne nîşana kalîteya baş a rojnameyekê ye.

Di cîhana me de weqa bûyer diqewimin, weqa tiştên nû tîna afirandin, weqa guhertin cîh digirin. Rojnameya ku çavên xwe li cîhanê bigire û tenê li ava nav tasa xwe binihêre, dê nikaribe di pêşvebirina gelekî de roleke mezin bilîze, ne jî kalîteya wê dê yeke rêk û pêk be. Bindestiya me ya netewî di dil û destên me de kirine zengil. Ji ber ku em gelekî bindest in, ev ne tiştê xirab e, lê divêt em bi cîhanê re ber bi pêş biçin. Em nikarin wek jina ku dergûşa wê nexweş be û bibêje xwe "ta dergûşa min ji nisaxiyê rehet nebe, bila derketina derve li min haram be", bikin. Organên weşanên giştî divêt di hişyarkirin, têgîhandin û pêşvebirina gelekî de roleke layiq bilîzin, lê divêt çavên van organan bikaribin xwe bigihînin dervayê tasa ew tê de, da ku ev gela bikaribe ne tenê ji ava tasê, lê ji ava çem û derya jî fêhm bike.

Di bernameyeke televizyona Australî ABC de, ji Nelson Mandela, Serekê Afrîqa Başûr, hat pirsîn ku di nav hukmata wî de hin mamûr hene berê wek nijadperest, heta faşîst dihatin nasîn. Mandela got li Afrîqa Başûr wan tenê bindestî û rêkoşîna li dij wê dîtine. Xibreta wan di rêvebirina dewletekê û parastin û pêşvebirina ekonomiya welatekî de tune. Loma, ew hewcedarên her kesî ne li Afrîqa Başûr a nû, heta eger faşîst be jî. Eger Kurd ji niha ve xwe li gel cîhanê ber bi pêş nebin, ew ê her li paş bimînin û heta eger rojekê Kurdistanê serbixwe hebe jî pêşeroja wê dê ji ya welatên wek Angola, Kamboçya û Afxanîstanê ne baştir be. Pêşveçûna li gel cîhanê bi weşanên giştî yê bi kalîte, bi xwendin û zanebûn û perwerdebûnê ve girêdayî ye. Bi gotineke din, divêt medya ya bi kalîte be, cîhanê bigihîne Kurdan, Kurdan bigihîne cîhanê û kesên Kurd pêwîst e bikaribin û bixwazin li weşanên xwe yê giştî xwedî derkevin. Rojname, kovar û radyoya Kurdî divêt xwe ji gotinên erzan û şeweya propagandîst bi dûr xin. Ev metod di nav gelên nezan û paşvemayî de tîn bikarhanîn. Werin em hêvî bikin ku gelê me nema êdî bi pirranî gellekî wisa ye. Merovê têgihîştî, hişyar û entelîgent nema êdî di vê dem û dewrana me de rûpelên tijî nivîsarên bi ajîstasyonê û hezarbarekirina gotinên bi kilîşeyan dagirtî dixwîne; merovekî wisa nema dikare guhdariya bernameyeke bi propagandayê dagirtî bike, merovekî wisa nema dikare di televizyonê de rojê bi sa'etan temaşeyî rû û bejna serokê welatê xwe bike. Ev metodên wisa, ne tenê bêkalîte, lê herweha jibo amancên dûr bêsûd in. Ma gelo çend kes li welatekî wek Îraqê bi dil li televizyona dewletê dinihêrin!? Hewceya binavkirina wan welatan nake ku tê de ev metod bi dehsalan hatine bikaranîn, lê di dawîya dawiyê de li şûna heskirinê nefret di dilê xelkê de bi cih kirine.

Nivîsandina jibo weşanên giştî jî hunerek e. Yek dikare hezar rêzan li ser nebûna mafên çandî binivîsîne û berpirsîyarên dewletekê wek hov û derewîn û qatîl bi nav bike, lê yekî din dikare bi hevokêkê bandoreke mezintir ji xwendevanan bike, bi komikeke wek "qedexe bû jibo wê, da ku bi zimanê dayîka xwe li ser kartê binivîsîne: Dayê ez ji te hes dikim". Berî çend rojan min li gel hevavaleka kar, axaftina bi Kurdî ya di filimeke dokumenter de jibo televizyona Australî SBS werdigerand Îngilîzî. Di beşekî filimê de min bi îsrar got "divêt em vê gotinê binivîsînin." Hevala min li min veşerand û got: "ev wê ne bi hewceya nivîsandina çî bêjeyan e; ew bêyî çî gotin jî ji xwebêja xwe bêtir diyar dike". Bi baweriya min, rewşa ku gelê Kurd tê de ye ne bi hewceya teqereqa propagandaya erzan a wek dewletine cîhana çarem e. Tenê yê kor û kerr ê nikaribin wêneya rewşa vî gelî bibînin. Bi kurtî yek ji girîngtirîn şertên medyayê baş û pêşkerî gotina rast e, deng û wêneya bedew e û afirandina berhemên bi sûd û zewq e.



Mesûliyeta nivîskarê Kurd li hember civaka Kurd ew e ku ew bi zimanê Kurdî jibo pêşveketina edebîyata Kurdî û rewşa civakê binivîsîne. Lê ne tenê berpirsiyariya

nivîskêr li hember civaka Kurdî heye, herweha berpirsiyariya civaka Kurd jî li hember nivîskêr heye. Divêt civak li nivîskarên xwe xwedî derkeve, piştgiriya wan a manewî û aborî bike, berhemên baş bixwîne û nivîskaran li hember êrîşên dervayî û hundurî biparêze. Civakeke bêyî meraqa xwendinê û bêmesûlîyet, fersendên biserketina nivîskarên jêhatî û bi mesûliyet kêmtir dike.

Divêt çî qeyd û bend li pêş nivîskaran nebin. Hebûna qeyd û bendan jî modeyên kevn e û nîşana dewlet û tevgerên totalîter û nedemokrat e. Bila nivîskar bi azadî binivîsîne. Bila xwendevan bibin dadmend. Berhemên baş ê werin pesin dan û bimînin, berhemên nebaş ê werin jibîrkin. Li gor qeyd û bendên kilîseya ber bi sedan sal û civaka wê demê, nivîsandina ku erd guloberîn e cerîmeteke mezin bû. Di sedsala 17'em de rahibekî bi navê Jordano Bruno [Giordano Bruno] nivîsand, gerdûn bê sînor e û ro jî şûna xwe nalive. Dadgeha kilîseya Romayê ew bi saxî da şewitandin. Di eynî sedsalê de Galîleo teorîya Kopernîk, ku erdê em li ser dijîjn ne sabit e û ew û planetên din li dor royê dizivirin, bi şeweyeke ilmî îspat kir. Dadgeha kilîseyê dê ew jî bi saxî bişewitanda, lê Galîleo soz da ewê bi gotina dadgehê bike. Dadgehê ferman da ku ew li mala xwe danîşe, devê xwe bigre û tiştên "ne mentiqî û li dij gotina Xwedê" nenivîsîne. Li dû bêtir jî 300 sal, di sala 1992'an de, Vatîkanê Galîleo bi şeweyeke fermî efû kir û nivîsarên wî wek legal dan zanîn. Di sedsala 16'em û 17'em de hejmareke ne biçûk jî alim û nivîskar û merovên din bi tawanên curbecur hatin şewitandin, jî ber ku wan ne li gor qeyd û bendên otorîteya wê demê nivîsandibûn, bi dehhezaran pirtûk hatin şewitandin. Pirraniya gel jî wê demê bi otorîteya kilîseyê re bû. Dema alimek, yan nivîskarek bi saxî dihat şewitandin wan kevir diavêrinê. Qeyd û bendên ku îroj rast û di cih de xuya dikin, pêkan e sibe ne rast û ne di cih de xuya bikin. Berîdora deh salan eger min Soljenîtzîn yan Saxarov li ser taxekê bidîtibûna, heye ku min tift wan kiribûya. Bêguman bi sedan çepên Kurdan eger li ser wan bibûna dadmend, heye ku wan fermana bidarxistina wan jî dabûna. Îroj ez jî ber wan ramanên xwe ve şerm dikim. Ma gelo mafê kê heye qeyd û bendan jî nivîskaran re deyne? Yê Kilîseya Romayê, Mizgefta Mekkê, Xumeynî, Atatürk, Seddam, Hîtler, Stalîn, Pol Pot, vê partiya şoreşger, wê partiya kevneperest...!? Wek tê gotin, kesek nabêje dewê min tirş e. Îroj musulmanine şewehişk bi navê Xwedê fetweyan derdixin, qeyd û bendan datînin, nivîskaran dikujin. Lê bala xwe bidinê ku Xwedê hema çend qeyd û bend di bihuştta xwe de jibo Adem û Hewa danîbûn, lê bi ya wî nebû. Xwedê bi xwe jî, ne ew şewitandin û ne jî dan ber gulleyên reşşan. Xwedê ew jî bihuştê derxistin û warekî nû ji wan re çêkir. Ez îroj di wê baweriyê de me ku kesên xwedanmaf, divêt tirsê wan jî kesekî nebe, heta jî nivîskarên "xayîn" be jî. Feylesûfekî Almanî ku navê wî nayê bîra min, gotineke bi vê xwebêjê kiriye: Kesê ku bikaribe daxwaza xwe bi nivîs û gotin aşkere û zelal bike, ne hewcedarê bikarhanîna zorê ye.

Berpirsiyartiyêke nivîskêr a exlaqî heye, berpirsiyartiyêke herdemî û herşûnî ye. Ne jî mafê nivîskêr e ku merekeba pênuşa xwe bike pîsî û merovên yan komên

bêawan pê rezîl û riswa bike. Pêwîst e rêza nivîskêr ji nav û namûsa xelkê re hebe û bêyî çî îspatên rêk û pêk navên merovan nexe bin êrîşa neheq a pêûsa xwe. Li welatên xwedan şaristanî, qanûn merovên bêawan ji nivîsarên kesên bêberpîrsiyarî diparêze.

Bi dîtina min, nivîskarê birûmet, bi çî zimanî dinivîsîne jî, pêwîst e raman û pêûsa xwe jibo parastin û pêşvebirina merovahiye bi kar bîne. Nivîskar divêt stemkariya li kesan û koman dibe nepejirîne; divêt hewl bide da ku bi rêya berhemên xwe baweriyên teng û neadil bide guhertin. Nivîskarê neteweyeke bindest divêt bi şêweyê rasterast pêûsa xwe têxe xizmeta têkoşîna gelê xwe. Lê xwebêja vê yekê ne ew e ku ew bibe mirûdê [mirîdê] partiyekê. Nivîskarê ku jibo şoreşekê, yan hêzekê bibe mirûd û her bibêje "şabaş" û "biji", nabe nivîskarê birûmet. Dîroka kevn û ya nûjen ev yeka îspat kirine. Nivîskarê birûmet tiştên şaş û xwar napejirîne, heta ku ev tişt di nav şoreşa gelê wî de bin jî. Şoreş yan hêzek ji nivîskêr hêvî bike ku ew her pesna kirinên wê bide û rasterast yan bi metodên din li nivîskêr qedexe bike ku ew bi şêweyê serbest li ser şaşîtiyên li holê, yan metodên neçak binivîsîne, dê hêza nivîskêr bi sînor bike û heye ku tew nivîskêr neçar bike ku xwe ji şoreşê bi dûr xe, yan xwe bicemidîne û têxe sirgûniyeke hundurîn. Li welatîne faşîst, yan hinên komunîst, bi dehan nivîskarên birûmet wisa kiribûn. Stî Henan Eşrawî rewşenbîreke zana û birûmet e ku di jiyana xwe de her jibo mafên gelê xwe têkoşiyaye. Ew yek ji beşdarên destpêka guftûgoyên aşîtiyê bû di navbera PLO û Îsrailê de. Dema ji wê hat xwestin ku bila di hukumata xudmuxtariya Filistinî de cih bigire, wê got: "Na, ez dixwazim li dervayê hukumatê bimînim da ku bikaribim şaşîtiyên wê rexne bikim û eger mafên merovan ketin bin lîngan, bikaribim bi şêweyê serbixwe ji hukumata Filistinî rêzgirtina ji mafên merovan re daxwaz bikim."

Li welatên Rojhelata Navîn rexnegiriya li dewletê, yan partiyê qedexe ye. Rexnegiriya li "dijmin" jî ji rexneyê bêtir, bi pirranî bikarhanîna gotinên kêmtir û xirab e, êrîş e, rezîl û riswakirin e, propaganda û ajîtasyon e. Ji ber vê rewşê, gelên Rojhelata Navîn û yên welatên lipaşmayî fêrî demokrasîyê nebûne û heta dema ku endamine van neteweyan digihên welatên demokrat jî, ji destê wan nayê ku rêzê ji prensîpên demokrasîyê re bigrin; ne jî dikarin bi şêweyê tevhevî (kollektîf) kar bikin, ji ber ku li şûnên ew jê tî hewceya merov bi otorîteyê heye, bi serokekî heye, bi îstîxbarat û zirtan heye.

Eger em bixwazin pêşeroja Kurdên sibê ji ya me baştir be û endamên neteweya me kesên bi şaristanî bin, pêwîst e em êdî ji nuha ve xwe fêrî prensîpên rast ên demokrasîyê bikin û xwe ji metod û şêweyên zirtîtiyê û hewldana çareserkirina hertiştî bi tehdîdê, lîxistinê û bi şer, rizgar bikin. Rewşa gelê me ya li holê, nakokî û şerê di nav partîne me de û dilsariya li meydana, hemî encamên nedemokratbûna me bi xwe û mayîna gelê me di bin karbidestîya paşvemayî de ne.



# DERDÊ DEWRÊŞÎ

J. Espar

**D**ewrêş xwi ra pey Zîni ra ewniya, Zîni yê dim a ver pê ginaynî. Odey doktorî peynîya na heyata dergî di bi. Heyata leymini ra boy û buxari ameynî. Gama ki ameyî berê Bayram Begî hetî, verî ki Dewrêş bido berî ro, lengeriya xwi seredê xwi ser ra hewa nay, girewti xwi dest, gocagê çakêtê xwi tavistî, xwi ra pey Zîni ra ewniya, seki vajo ti hadira ya, ma şonî zerre. Zîni mexmela xwi ya ki murey şalînî vernayey bî raşt kerdi, çend muyê porê ya yê ki teber ra bîy binê mexmeli di nimitî û lewê xwi yê goştinî pê ser nay û wina Dewrêşî ver di vinderti. Dewrêşî teq-teq da ber ro, şîy zerre. Bayram Begî hêz da xwi, peşmiriya û va "Şîma amey? De bêrê, bêrê; xwi ra ma zî pawibê şîma bî." Bayram Begî ra teber, yewna mêrdimo ki kincê doktoran piradayey bîy pey masî di ronîşte bi; tanî kaxidan ra ewniyaynî. Zîni no mêrdimê pey masî şînasna, no sertabîb bi. Tira ver çend reyî Bayram Begî reyra amebi ya meyene kerdibî. Bayramî, Dewrêş xwi hetî roşana û yew kursi Zîni nawit, ya zî ayca di ronîştî. Zîni yew hewawo koyî, çimê xwi ode ra çarnay; odey doktorî, hema vaji veng û varit bi. Yew mase, çar kursî û dilavêk ra vîşêr ode di sewbî çî çinêbi. Çend kaxitî, di-hîrê filimî masî ser o asaynî. Lengeriya Dewrêşî destî yê di, serey yê yê ver di û pawibê qisekerdişê Bayram Begî bi. Nişka ra sertabîb, seki gayêk biorro Dewrêşî persa û va "Namey to çi yo?" Dewrêşî hêz da xwi û hema yew hewawo lezkanî va "Namey mi Dewrêş Dîcle, ez katibêko teqawitbiyaye yo". Vatey "katibî" biney pêt vatbi. Sertabîbî va "Namey to bes o, bes o!" Dewrêşî va "Mi..." Sertabîbî vatey yê fek di birna, va "Zîni ceniya to ya, nê?" Û pawibê vatişdê Dewrêşî nêvindert, persa va "Tirkî zana Dewrêş Efendî?" Vatey "efendî" weş bê Dewrêşî şî, cûka verî ki vajo "nêzana", waşt ki korfêmeya Zîni ser o çend qiseyan biko, va:

– No çend serrî yo ki key ma Diyarbekir di yo, ez memur a. Na hurmi yew qiseya Tirkî nêmusay. Ti vanî qey.....

– Dewrêş Efendî, ti ay qalan ca verdi, nika nêzanayîşê yay hina rind o. Zîni, hewteyêk o ki tiya ma hetî di ya.

Gama ki wina va, Bayramî ra ewniya seki vajo ”raşt a ya nê?” Bayramî serey xwi tê şana.

– Belê, ma hetanî ewro nêşaynî deraqê nêweşiya yay di zaf çî vajî, la nika neticey heme tehlîlan amey.

Wina va û kursiyê xwi çerexna, raştaraşt ver a xwi taday Dewrêşî. Dewrêşî zî herdi destanê xwi reyra lengeriya xwi sênedê xwi şanay, pašta xwi reyra milê xwi yo derg zî raşt kerd û fekdê sertabîbî ra ewniya. Sertabîb seki vatişê xwi xwi vîrî biko, kaxidan ra ewniya, destê xwi biney tê fereknay û va:

– Nika mi weş bigoştari!...

Na rey namey Dewrêşî xwi vîr a kerd, herunda yê di yew qali geyra, va:

– Efendî, nika mi weş bigoştari! (Dewrêşî xwi bineyna ant pêser.) Nêweşiya ceniya to gelekî xidar a.

Ay hing di çimê xwi heta Zîni ra çerexnay. Zîni, tena destê ya yê ki verî munda yay ser o bestey bî, ebi fesali çokanê xwi ser nay. Gama ki dî sertabîb ti ra ewniyêno, şerman ver nêzana se ka, lingê xwi bêhemdê xwi rayêk-di pê sawitî.

– Ez zana helbet çendi zor a, ma şiyaynî to ra nêvajî; la ma pê mişewriyay û ma va ”rind a ya ki ma to ra vajî”. Cenîya to kanser biya! E, cenîya to kanser biya! Nêweşî, leşda yay ra vila biya. Darû-marûyê na nêweşî çino. Labelê reyna hêvî Hûmay ra nêbiriyêna.

Wina va û werişt pay, heta berî ra şî, ber akerd ki şêro; a gami yewna çî ame yê vîrî, destê yê yo raşt ber di, ageyra Dewrêşî ra va:

– Ha, mi xwi vîr a kerd ez vaja, eke ti biwazî nêweşî şêna tiya bimana.

Dewrêş, tena yê dim a ewniya. Ne rengê yê vuriya, ne zerra yê tengi bî û ne zî veng ti ra vejîya. Yê, hissê xwi nika sey sîrrêko keyen nimitîbî. Bayram Begî destê xwi çokê Dewrêşî yê wişkî ser na, ebi vengêk nimizî, seki bilebiyo va:

– Dewrêş Efendî, to heme çî eşnawit. Nika ra pey ma tena dermananê dejbirnayîşî danî bide, ma veynî Hûmay key emaneta xwi gêno.

Dewrêşî pîzze ra hesrêk anti û va:

– Begê, key to awan bo! Hûmay to weş verdo! De qey çarêdê yay di zî wina nusiyayo. Ma se kî! Qeder o, qeder!

Dewrêşî nê qalê xwi endî rehet vatî ki to vatinî veynî Zîni ceniya yê niya, yê cîranan a.

Yînî Bayramî ra xatir waşt û teber kewtî. Yew deme bê ki wit bikî şî. Dewrêş fikiriyaynî gelo Zîni ra se vajo? Demêk raket-naket kerd, la ti ra pey qerar da ki Zîni ra heme çî raşt vajo. Zîni ay beyntar di çend reyî Derwêşî persay veynî doktoran se vato. La Dewrêş zaf goş pa nêkewt. Hinî gama ki amey berdê odedê xwi ver, Zîni va:

– Qey veng to ra nêvejiyêno, wî? Bî des rey ez to perseno! De xwi ra ez zana ez mireno, mêrdekan nêva ez key mireno?

Dewrêşî pîzzedê xwi di va "No çend serrî yo ti wina vana, la na rey ti raşt a zî mirena". Peşmiriya û vengê xwi zî biney nimz kerd, va:

– Zînê, şo zerre, şo! Ti raştî persena, mêrdekan va, la nêva key. Werrekna bivatinî.

Zîni va qey Dewrêş reyna yariyanê xwi bide keno, va.

– Ti Hûmay kenî ti raştî vajî, se va doktorî?

Wina va, nalay û leheyfê xwi hewa na, goşedê cilda xwi ser o ronîşti. Dewrêşî zî yay hetî xwi 'ard ra na. Fesali reydi lengeriya xwi balişnaya Zîni ser o ronay, destê xwi eşt tanekda xwi tizbihê xwi vetî, dest pey kerd hêdî hêdî antî. Yew deme wina mend, tira pey va:

– Doktoran va ki nêweşiya to xidar a. Zînê, hewl-xirab ma piya yew' emir viyarna. Hezey di wesniyan bo zî, çewres serrî ma zerrey yew keyî di bî. Mi rê helal biki! Nefes o, to hin dî ki şî û nêame.

Nê qiseyan ra pey, lewê Zîni recefiyay; dindanê ya yê verîn ê xişnî teber kewtî, qîç bîy; çimê ya yê ki seki pey esteyanê alişkanê ya yê berzan di nimatey bî, hîy bîy, bermi qirikî ro pêşiya û hilp-hilp bermay. Yew deme him bermay him zî bêkeseyda xwi ra, bextê xwi yê sîyay ra lomey kerdî. La Dewrêşî fahm kerd ki hema haya Zîni derbida yay ra çina. Cuwe ra waşt ki de rê hina eşkera vajo. Dewrêşî çî rê endî lez kerdinî, yê bi xwi zî nêzanaynî. La hema seki yew ti ra vajo "Lezi vajî, beno ki Zîni tersan ver gamê aver bimira!"

– Zînê, ti Hûmay sînena fek nê qalan ra verra di! No çewres serrî yo ebi nê qalanê xwi to pîzzey mi zaf masnayo. Kanser nêvano "ti keyna kê ya û kotî ra ya?" Hûmay na nêweşî nêdo gawirî! Şarê ma billasebeb tira nêvano "rêşa mêrdimwerî", mêrdimî wena, wena!

Zîni senê ki namey "rêşa mêrdimwerî" eşnawit, qêrînêk bide ginay û xereqiyay. Dewrêşî dî ki qalanê yê cay xwi girewto. Dest û lingê yay têşanay, goşê xwi berd fekdê yay ver veynî cîf yay ver o vêjyêno yan nê. Veng da, va "Zînê, Zînê!" Ney herê, Zîni wişk û wa'd bibî.

Ay hing di Zîba Pasûriji -ya zî nêweş bî, odedê Zîni di mendinî- û Doktor Bayram Beg piya kewtî zerre. Doktorî senê ki Zîni ay hal di dî, vazda şî, serey yay hewa na, qelbê yay goştarit, venga hemşîran da, pêro amey yay ser o pêser bîy. Zîni hêdî hêdî çimê xwi akerdî. La bêxebîr qalî kerdinî û bê ki çimanê xwi bikuwa, norûdora xwi ra ewniyaynî. Leşa yay sey tura meyvi recifiyaynî, pirnika xwi ya koli û verini ra pêser o pêser o nefes daynî-girewtinî. Mexmela yay kewtibî, porê ya yo sipî ereq di mendbi. Ereq qirmîçanê çarêdê yay ra sey layanê barîyan herikiyaynî. Hil û gami vatinî:

– Wey Dewrêşooo! Mela ti nimac nêveynî mêrdek! To ez kerda wayirê derdî! Mêrdeko, mela qeseba to bihelesiya ki to qeseba mi helesnaya!



Demewo ki Dewrêş Zîni hetî ra raymend, nîzdî yerî bi. Yê nardîwanan ra yew hewawo xayîleyin war kerd. Nêweşxane biney xewle bibi. La boya dermanan, boya gûnî, boya gî û hilmê nêweşan tê miyan qelebiyaybî; cîf mêrdimî ver o nêvejîyaynî. Pakkerdoxanê nêweşxanî, paspasanê xwi yê nêşutan û geziyanê boçdergan reydi gend û gemara nêweşxanî antinî pêser. Gama ki Dewrêş ame qato binên dî ki dewijêkê yê, paspas sey mecîrfey vewri pîzzedê xwi şanayo û ay cayan paspas keno. Ay beyntar di zaf nêşibi ki çimê dewijê yê zî Dewrêşî gina, paspas dêsî ver o na, destê xwi dekerdî tanekandê xwi û fikna û heta berdê teberî ra şî. Hetanî Dewrêş berê teberî resa, dewijê yê ageyra. Ki Dewrêş dî, ver a ame û va:

– Wey Xal Dewrêş! Ti û nê cay! Xeyr o, cay emr-memrê to?!

Dewrêş peşmiriya, destê xwi da paştey yê ro va:

– Ti û gedey xwi weş bî wariza! Xalcinîya to nêweş a. No hewteyêk o, qatê hîrini di manena.

– Mevajî! Hewteyêk!?

– Ti senîn î, gure-murey to senîn o?

– Gurey çî yo xalo?! De ez nê cayan ra geyrena. Gege doktor-moktoran rê ardim kena. Ti yay mevajî, to doktorî ra nêva ”Mîrza dewijê min o?”

Mirzay dora çisekerdişî nêday Dewrêşî:

– Ez û Bayram Beg, ez û ti senîn î, ’eynî inawa yî. Ez nika şono ti ra vano. Metersi xalo, xalcinî weş bena.

– Weşeya xalcinî xwi ra çina wariza!

– Qeyî?

Dewrêşî hin dî ki Mîrza çimanê yê ver ra vîni bi. Polê xwi yê raştî ser o xwi ra pey ewniya, eke Mîrza paspas dest di, da-vîst mitro ti ra durî ha xebetiyêno. Mîrzay ra daşt, hîrê doktorî -yîni ra yew Bayram Beg bi- ver bi Dewrêşî ameynî.



Aşma amnanî ya peyen a. La germ hema serdest o. Perrê daran nêleqeno. Dewrêş bexçe di bê ki bizano se keno biney geyra, ca bide nêkewrinî. Nişka ra xebera mergê Zîni yû kerdbi se gayo ki sews bibo. Gama ki hewşê nêweşxanî ra teber kewt, raşt keye xwi çim a kerd. Hezeki yew gurey yê yo zafferz bibo, lingê xwi hewa nay. Çaxo ki ame Fabrikaya Reqî ver, boya reqî amey bide, serxoşeya yê ya verîni û peyeni reyna amey yê vîrî. Ay wext xort bi, xwi ser o bi, Zîni zî hema nêardibî. Yew şewi şimitibî ki şimitibî! Mêrata reqî, senê hêş sere ra berdbi. Dîna çimanê yê ver di bîbî hinda yew kulinçî. Dabi piro şibi Mehlaya Cêrêni, reya verîni û peyeni şilabendê xwi yewa namherami rê akerdbi. Herçiqas çend serrî ra ver reyna şibi, la no Mirzayo ki gama bîni bide persabi wica yû dîbi û amebi Qehwedê Berdê Koy di şarî ra vatbi. Yew deme Qehwey Berdê Koy di namey yê bibi ”Dewrêşo Kerxaneçî”. Helbet şarê xerîbî derdê yê nêzanaynî. Yê zî nêşinaynî şarî ra vajo ki cila Zîni de rê sey sînorê

mayîkerdî ya. Çewres serran ra nê des serranê peyenan keydê yîni di hema hema hergû roj herb bi. Helbet semedo ki bidî pêro sebebêko maqul lazim nêbi. Yewbînan bidîni de'way yîni hadire bî. Labelê amnanan herb biney sist bîni, çimkî zafane heyani wextê hewnan hewş di ronîştîni. Wina asayni ki peyniya herbî ameybî û Dewrêş ser kewtbi.

Mektebê Me'liman resabi, la boya reqî hema zî ameynî bide. Çewres serrî ra pey reyna nêr kerd ki ewro yew şuşa bierino. Şiyayni çarçîba ra Xizali ra zî biewniyo. Teqilê yê sivik bibi, seki keyfê yê zî bêro. Çend gaman ra pey ame vîrî ki Şemdîn Wista keye di yo. Pîzede xwi di va "Rind a ya ki ez şero Qehwedê Berdê Koy di roşo. Nika Wisê Qirroy, Hesê Çepoy û Sîmsar Sedo ayca di ronîştî pîştî kay kenî. Ez yîni rê qalê nêweşiya Zîni keno û bêminet çaya xwi şimeno. Tira pey ma veynî se bena."

Wisê yê qehwedê nêbi. Vîstêk xwi 'ard ra na, pîlotê qehwî, çay dest di heta yê ra ame. Ganê Dewrêşî ame qirikda yê, ay hing di vengê qîrrî û qelebalixî sey Xoca Xizirî ardimdê yê resa. Şar heta heykelî ra ewniyayni. Dewrêş werişt û heta ki veng yeno a het a şî. Wexto ki hoka Bedenê Tekî taday, ewniya rayirê Seyrantepî ra eke gillî ra mêrdimî yo. Dewrêş wina yew deme ameyoxan ra ewniya, çiyoy anasarên nêdîbi. Goşê xwi ronay veynî se vanî. Di vatanê Tirkî - "Kahrolsun!" "Yaşasın!" - ra vîşêr vatey bîni fahm nêkerdîni. Labelê yîni nê "kahrolsun" û "yaşasın"î reyra sewbî gelek çiyê bîni zî vatinî ki Dewrêşî caran nêşnawitîbî. Ay wext biney xwi ver kewt. Halbîko yê vîst û panc serrî memurey kerdbî. Çend aşmî hewnê şewan xwi ro herimnabi "Mînyelî Abdullah" zî wendîbi. Rojo ki teqawit bibi, hakim Korkut Begî "Nutuk"ê Ataturkî heze xelati dabi bide. Herçiqas ki "Nutuk" ra çimê yê tersabi, nêwendbi, la keye di ronabi. Rojnameyê belaşî bidîni gege rêzê girdî wendîni. Reyna şikir kerd ki Wisê Qirroy nika yê hetî niyo. Sewki yê hetî bibîni û bide bipersayni ki nê se vanî, ka çî gi borû.

Şar, meydanê Berdê Koy di pêser bibi. Hemîni tê reyra gege vateyê xwi yê ebi "kahrolsun"î û gege zî yê "yaşasın"î vatinî. Şar yîni ra durî vindertîbi, temaşe kerdîni. Nuşteke (cînegê) zafîni hezey lacedê Şemdîn Wistay Yadi, derg bî; zimbêlê yîni fekdê yîni di bî. Gama ki ame vîr ki mena nuştekan û zimbêlan zano, bawereya yê bi yê amey, xwi pîzde di va "Werrekna nika Wisê Qirroy tiya bibîni, ez ka bide persa, Wiso ti zanî nê çî rê nuştekanê xwi wina derg kenî? Wisî xwi ra nêzanayni, ez ka vaja Fekmalêz, na pîştî niya ti zexeley kenî û çay mi ser o maneni! Rind biewnî, nuşteke hemîni herfa L'y maneni. L, yanî Lelîn -qestê Dewrêşî Lenîn o-; Zimbêlê yîni çî rê acêrdaye yî û serey yîni yenî hetanî estedê çenêdê yîni ser? Wisî reyna nêzanayni, ez ka reyna vaja Fekmalêz, biewnî zimbêlê yîni herfa M'y maneni. M, yanî Mayo -qesdê Dewrêşî Mao yo-." Yew deme norûdora xwi ra ewniya ki veynî cay Wis yê çiman ver a nêkeweno.

Pêserbiyayoxan miyan ra yew-di tenî vejîyay yew cadê berzî ser û qisey kerd. Dewrêşî qisekerdişê nînan ra tanî çiy fahm kerdî. Qalê serekwezîrê keyeni Nîhat

Erîmî, qalê Suleyman Demirelî kerdinî. Behsê neheqey, pêtey û xizaney kerdinî; gege kelîma Kurd zî goşanê Dewrêşî ra kewtinî. Şarî hil û gami yîni rê çepikî kutinî û qîrraynî.

Hinî Dewrêşî rê yew qene'et hasil bibi. Xwi pîzze di va "Bibo nêbo nê anarşîst î. Orisan yê xapênay û ardî seredê ma rê kerdî bela. Peynî peynî nê na dewleti rijnenî û ma veynî ay çax me'aşê min ê teqawitey kam dano." Yê zaf eşnawitbi, nê heme wina yî; qalanê zaf weşan û raştan kenî. Wina kenî ki şarî biyarî fikirdê xwi ser, la eke kes reyêk bikewo damayînî, hinî xelaseya yê çina. Gama ki wina fikirîya, xewfêk dekewt pîzzedê yê, xwi pîzze di va "Ez teqawit bibo zî ez memurê hukmatî hesebiyêno." Raymend, hetanî Çetalêrayiran xwi ra pey nêwniya. Him şî him zî pîzzedê xwi di va "Hero teres, kamî to ra va şo temaşêdê anarşîstan?" Demewo ki kiştâ Onur Palasî ra, kuçe ro şîni biney sakin bi.



Xizali, qando ki tikê honik bibo, amnanan hergû yere hewş şutinî. Demewo ki Dewrêş berdê teberî ra ame zerre, Xizali peya yay hetey berdê teberî ra, dereyaya bî; yew destê yay di satilê aw, destê bîn di gezi, hewş şutinî. Semedo ki pancey yay hîy nêbî, heyane binê çokan xwi werantbî. Çaqê yay ê sur û sipî, sey roşneya çilay Dewrêşî ra asay. Heme reyeyê yê yê ingilisyayey rayêk di tê geyray, heyecanêkî yû girewt. Gillî yê yê werdî sey ibrişimî bereqiyay. Zîni, anarşîstî, heme çî ca di yê vîr ra şîy. De'ey kerdî ki mela Xizali bide nêaqiliyo, lingê xwi hêdî hêdî ronay, la Xizali çîpiya lingan lez eşnawiti û pancey xwi verra day, mexmela xwi raştî kerdî, va "Wîî Xalo, ti yî?" Dewrêşî ebi fekweşey va "E, Xizala mi ez a, ez a!" Ver bi berdê xwi şî, vengê Xizali reydi apey ageyra.

– Xalcinî senîn a? Biney rehet nêbiya?

Dewrêşî ebi hewayêko derdin va:

– Xizala mi, willay halê xalcinîya to çino!

– Wîî xalo, na çi qal a?

– Ez zaf derg nêka û serey to nêdejna Xizala mi! Xalcinîya to kanser biya! To dî ki eşmo-şewna serey xwi rona. De qey nan û sola ya zî na dîna di endî biya. Ez se ko, ti se ka?

Hesranê Xizali sey varanê wesarî war kerd. Çimê yay ê sîyay ê xişnî surî bîy. Serey xwi tada, pey goşedê mexmela xwi hesrê xwi esteritî. Pîzzey yay Dewrêşî veşa, xwi pîzze di va "no feqîr ko se bo?" To vatinî qey Dewrêşî zana ya a gami çî fikirîyaya. Zîq ewniya miyanê çimanê Xizali yê hesrinan ra û va:

– Xizala mi, xalciniya to xwi rê mirena xelesiyêna, la ez se beno, ez?

– E willay xalo!

Dim a Dewrêşî weziyetê Zîni de rê derg û dila va. Heme hereketê Zîni yew bi yew amey çimanê Xizali ver: Geyrayişê yay, weriştiş-roniştişê yay, qalê yay, saxekey

û deluaney yay, hergû roj pêrodayişê yay û Dewrêşî; xwixereqnayîş û xwimergnayîşê yay, çîmanê yay ver ra nêşînî.

Xizali Dewrêşî ra hema di gamî daşt ronîştî. Xwi Dewrêşî ra nêpawitinî. Serra ki mêrdey ya binê makîna di mendibi û viyay mendibi, key vistewranê yay wayîrey bide nêkerdibî, ya zî mecbur mendibi ameybî key birayê xwi Şemdînî. Çend serrê verînê hêvî kerdinî ki Hûmay qedere biko xwi rê bizeweciya. Nêbi. Nê serrê peyenî hinî teseliya yay kewtibi. Herçiqas ki derdan ver yew yew muya porê yay sipî bibî zî Xizali hema xwiser o bî. Riy yay dekerde, sur û sipî, pîrnika yay werdî, fekê yay sey qutî bi. Giley ya yê dergî hema vaji ameynî kuliyanê ya yê berzan ser. Tena yew qusirê yay estbi -eke ayo zî qusir bo- çarey yay pat bi. Nê serranê peyenan di biney qelew bibî, la meşkini nêbî. Dekerda, gan û goştini, têkuta bî; demewo ki rayir a şînê ard binê linganê yay di lerziyaynî. Şîrini bî, mêrdimî hes kerdinî ki te de qalî biko.



Xizali, hadirekerdişê şamî ro xejelijaya. Şemdîn Wîsta û Guli kura bibî nika yenî; şiyê 'ezada Çewlîgijêki ki nê rojî dîna xwi bedelnaybî. Dewrêş, sedirê hewşî ser o ronîştî, dekweto xeyalanê neqşinan miyan. Zîni ra ebi rispênay pak beno, ti ra pey zî Hûmay kerîm o. Ay hing di Xezali zerre ra vejîyay û sekuy ser o, ver a Dewrêşî ronîştî. Çimê Dewrêşî Xizali ser o yî. Xizali ki ronîştî, yê va:

– Ez vana Xizaley mi -Dewrêşî verî Xizali ra vatinî "Xizala ma", la ewro cêko ki amewo keye, "ma" kerdo "mi"-, cîraneya ma çend weş a! Ehende serrî yo ma yew hewşî miyan di yî, rojê kesî vengê ma nêşnawito. Ma bîy heze yew keye.

Xizali nê qîseyê menedarî weş fahm kerdinî. Ya, saya dari bî ki herkesî çîwaya xwi ver bide daynî. Eke yewdê hêşkewtî û erjayî nê qîseyê anasarênî bikerdinî beno ki weş bê yay zî bişînî. Çi heyf ki bextê yay sîya bi. Verê ki çî vaja pîzede xwi di va "No bêmirad de'way çî mi di keno?" Be'cê yay ti ra amey ki çend se'etî ra ver nêweşiya Zîni hesiyawo û nika ra rayiran weçînenno ki bizeweciyo. Endi bêbextey zî nêbînî! Çewres serrî mêrdim yew çîwa zî xwi di biçarno, gama ki vînî biko îllehîm yew deme bide geyreno. Xizali viyedê yê yê dergî ra, alişkanê yê yê dekwetan ra, riy yê yê qîrmîçiyayî ra ewniyay, hêrsî zerredê yay di pêl da, waşt hema warda cay çî bida seredê yê ro. Bê ki Dewrêşî ra biewniya, va:

– Xalo, cîraneya ma xwi ra weş a; ti vanî xalcinîya Zîn a feqîri se kena nika?

– Xizala mi, xalcinî mirena! Ez destê xwi dano Kelam Qedîmî ro ki xalcinî mirena. Ti yay mevaji, ez se beno, ez? Si'udê mi zî sey ê to çîno. De biewnî ti zî wina cahîl û ciwan a, borani manena. La qey to zî gune niyo? Hûmay ra 'eyan a, keyfê mi ti çendi vaja endi to rê yeno. Şemdîn Wîstay rê, Guli rê zî yeno helbet!

Şerman û hêrsan ver alişkê Xizali surî bîy, bîy se çeyle. Dewrêşî lingê xwi zaf dergî kerdibî. Çîyo ki zaf zor bê Xizali şînî, nêşaynî di qîsey nê dodoy rê bika.

Qederê yay wina bi, siba beno ki mecburê yewî biba ki ney ra xirabêr bo. Gilangan fikiriyaynê: "Siba keko Şemdîn zî nêaso ez se kena? Serey xwi gêna kam het a şona? Ewro hema baş o, biqewimiya ez şêna xelaqeya şarî bika. La pêrey esta, nêweşey esta!" Nika gama ki Dewrêşî wina qisey kerd, nê çiyê anasarênî heme reyna amey yay vîrî. Werîştî, bê ki Dewrêşî ra çî vaja, şî zerre. Bermî yay pê pey ginabi, mirda xwi bermay û biney reheti bî. Heme de'eyê ki zanaynê kerdî, qedênay. Gamîna teber ra vengê Şemdîn Wistay ame. Xizali vazday berî ver. Guli, di torbeyê ki tarr û turr te de bi day Xizali dest û hema berî ver di ronîştî.

Şemdîn Wista hewşî miyan di pay ra vinderte, aw waştî ki dest û riyê xwi bişo. Vengê yê qalîn bi. Cili miyan di Guli ra bivatinê "şo a heta", kuçe di eşnawiyaynê. Xizali vazday, tulumba reyra bîr-bîr hewşî miyan di bi- ra aw anti. Şemdîn Wistay şewqa xwi eşti sedirî ser, Dewrêşî hetî. Porrê yê sipî û gîrî bi. Riy yê tinci ver a veşabi. Dest û riy xwi ki şutî, destê xwi birewanê xwi yê qalînan û sîyayan ser ra çend rey berdî-ardî û kîştî Dewrêşî di ronîşt. Qam û qelefetê Şemdîn Wistay tamam bi, zinarî mendinî. Nêmey sedirî girewt. Şabey yê weş, destê yê xişnî, miyanpolanê yê verin bî. Pey viyedê yê di qirmîçê xurînê asaynê. Hema raşteraşt ridê Dewrêşî ra nêwniyabi, Dewrêşî newe ra merheba day bide û xwi hadire kerd ki mesela Zîni rovejo. Waştinê Şemdîn Wista bide perso, yan zî qe nêbo Xizali biney mesela ako ki yû ay wext hinê weşî biko û biney pîzzey Şemdîn Wistay xwi biveşno. Şemdîn Wistay çî nêva. Halbiko cêko ki Zîni şîbî nêweşxane, Şemdîn Wista hergû roj halê Zîni, Dewrêşî ra persaynê. Helbet qaydê Dewrêşî rê nê, pîzzey yê Zîni veşaynê. Pêrodaişê Zîni û Dewrêşî di, Şemdîn Wistay heq-neheq timû desta Zîni girewtinê. Yê nê dodoy-Şemdîn Wistay ti ra wina vatinê- ra hes nêkerdî. Gege ki zaf hêrs bînê, Xizali û Guli ra vatinê "Hûmay wexto ki dîna xeleqnaya, no dodo verî heze heywan xeleqnawo, dim a melaîketan hûmaritî ki yew mêrdim kemî yo, vato de ney zî bikî mêrdim wa şêro! Labelê gurey melaîketan ay hing di vêşî biyo, zaf goş pa nêkewtî. Çi ki kewto yîni dest pê ser nayo û no dodo ti ra vejîyayo. Şîma ra nêaseno milê yê hezey milê 'el'eloy o, pîrnosê yê hezey pîrnosê luyî yo; mundî ra cor derg, mundi ra cêr kilm o. Goşê yê sey goşanê merrî yî. Şîma caran mêrdimo anasarên diyo?"

Dewrêşî sebir nêkerd, va:

– Şîma şîbîy key meyîtî, nê?

Şemdîn Wistay vengê xwi nêkerd, Guli va:

– Laa Xal Dewrêş, to bidînê way mêrdêkî senê bermaynê! Vajî hurmê to ehendi qalî senê pê ardinê! Ma şî nêşî, fekê na bêmcali nêvindert; de wina weş vatinê, adir devistnê qesbada mêrdimî.

Guli ki wina va, Dewrêşî mergê ma û piyê xwi, seyekey û yewekeya xwi, eskereya xwi ardî xwi vîr; gama ki dî ki qirika yê debîya, çimê xwi piloznay, hesranê yê war kerd û va:

– Key mi xerepiya Şemdîn Wistawo, key mi xerepiya!

Vengêk wina nişka ra Derwêşî ra vejîya ki, Şemdîn cadê xwi ra vir bi. Şermizar



bibi. Dewrêşî ra va:

– Liya ti nêşermayenî? Ti dar û camêrd î! Qey ti nişnê hezey mêrdiman vaji, se biyo?

– Rêşa mêrdimweri, qesebaya xalcinîya Zîni ro ameya. Helak a. Ganî ver di ya.

Bermi qirrika Xizalî ro pêşiya, nêşay peyniya nê qiseyanê xwi biyara. Guli da çokanê xwi ro. Şemdînê destê xwi berd qutiya tetunî, veti, cixara xwi pîştî, panay û yew-di cîfî day pi ro, seki qiseyanê xwi bisenco, tek tek û zerri ba safî ra va:

– Heyfê Zîni, heyfê Zîni ki kewta no hal!

Şemdîn, seki kes hewş di çinêbo, dêşî ra ewniya, çend reyî pê ser o nê vateyê xwi tekrar kerdî. Nê vatanê Şemdînê hemînê di tesîr kerd. Bêvengeya hewşî, ebi qalanê Guli heremiyay:

– Ez nika vaja, şima ko vaji ”qey çi bi?” Bêmcali rojo ki şînê nêweşxane, key xwi şut, rut û veng mi da va ”Gulê, Gulê waya mi, biewnî na nalmikiya şima key ma di menda”. Mi nalmikî yay dest ra girewti û ma vîstê wina lingan ser o vindertî; ez halê yay ra ewniyaya, rengê yay heremiyabi, to vatinê qey Gangêrî xwi bide nawito. Abîşo zî mi ya hewnê xwi di dî. Mi nimajî Xizalî ra zî va (Xizalî yew hewa ewniyay ti ra, seki vaja ha riy mi ha riy to), mi dî ki ’eynê a herunda Xal Dewrêşî di ronîşt a bî, porê xwi şane kerdinî; fistanêk çîlipî piradaye bi, mi ay fistan caran pira nêdibî; gêsê xwi nimitî û va Waya mi, ti zana mi emşo Hewa Lewçurri hewn di dî (ay cematî di hemînê bawer kerdinî ki kam Hewa Lewçurri hewn di veyno, ay keye ra îllehîm yew meyît vejîyêno). Ez çi zurî bika, gama ki yay wina va, leşa mi recefiyay, ez persaya mi va Zînê, to Hewa Lewçurri hewş di dî yan ameybî keydê şima? Va Willay linga ya ya yew zîfêra ma ser o bî a bîni teber ra bî. Ewro ca mi nêkewtinî, mi zanaynî ki no hewş di ko çî biciriyo.

Guli tira pey namey çend Çewlîgijan yew bi yew hûmaritî ki yînê senê Hewa Lewçurri hewn di diya û tira pey ca di merdî. Şemdîn Wîstay ebi vengê berzî eşheda xwi ardi, Guli fahm kerd ki eke ya bineyna dergi bika, Şemdîn Wîsta seki hewr bigurro, piro qîrreno.

Dewrêşî zî va:

– Gula ma, tê medi, nê rojanê peyenan Zîni zaf vuriyaybî. Mi bi xwi zî te de tey vetbi ki cay çî yeno yay serî ser di. De şima xerîbî niyî, ma heze yew keye yî. Şima bi xwi dîy, Zîni gureyê gureyênê ardî mi serî ser di. Biewnî, herunda ki Zîni miqlê dawo piro hema zî beylu yo (Dewrêşî cawo şikite reyna hemînê nawit). Labelê nê rojanê peyenan gama ki ez nêweşxane di şînê yay hetî, şima bawer kenê Zîni mi ver ra werîştinî pay, hetanî ki ez nêronîştinî ya wina pay ra vindertinî. Tira pey ez şîret kerdinî, vatinî ”Dewrêş, ez keye di niya, guney mi to rê ki ti pîzze peran biveşnî; weş xwi biewnî, ti pîr î, feqîr î, to gunek o.” Mi zanabi ki ya serey xwi wena. E, gege vengê ma vejîyaynî, labelê cenîda sey Zîni hinî lezalez raştê mi nîna.

Emşo no hewş di qali qala mergî bî. Dewrêşî ra teber, ay bîni heme nika mesela Zîni reyra mergê xwi zî fikiriaynî. Gangêro ki nê rojan bibînê mêmânê Zîni, rew

yan zî erey, rojê berê yînî zî kutinî. Gangêr! Çi namedo giran o. Kesî nêwaştinî namey yê biyaro ziwane xwi ser. La yû seya mergî bi. Hergû gama ki kes mergî fikirîyaynî, yû kesî ra asaynî. Nika zaf durî nêbi, hewşî miyan di çengileki kerdinî. Rayêk biameynî nê hewşî miyan, tirê tena pey Zîni qayil bînî? No pers seredê pêrunî di estbi. Şewî hemînî rê hina dergî bîbî, emşo tarî hina tarî bibi. Estarey çendi çiringenî wa biçiringî! Vayo honik pêl bi pêl bêro zî, yînî rê nazî biko û riy yînî bilêso zî, şarê hewşî milul bi. Yew-di seetî, bêxeynca "Xizalê nê çîy beri, ay çîy biya" sewbî qali kesî fek ra nêvejiyay.

Şemdîn Wistay persa lacê xwi Yadî kerd veynî çî rê nêameyo keye. Yê ki behsê Yadî kerd, newe ra xortê nuştekerdê Berê Koy amey Dewrêşî vîrî. Yê tenay xwi dêsî dariti, lingê yê 'ard ra biriyay; qando ki cay xwi weş biko yew linga xwi binê xwi ra kerdî, Şemdîn Wistay ra ewniya û nalayîşî reydi va "Te'm nê cayan di nê mendo Şemdîn Wista!" Şemdînî cîfo peyen da cixara xwi ro, qota yay eşti, va:

– Qey Dewrêş, se biyo nê cayan?

– La hema se bibo? To yerê Berê Koy bidînî! Anarşîstî ay meydan di pêser biy, neng û nengşori nêverday hukmatî çînay.

Xuy Şemdîn Wistay zaf teng bi, yew çengê aw di xeneqiyaynî. Anarşîstî -caran nêşaynî na kelîma raşt vajo, vatinî analşîstî- yê rê lazim nêbîy, la ki Dewrêşî va "neng û nengşorî hukmatî çînay" ca di xwi eşt polê yînî, va:

– Se kerdinî, se kerdinî?

– Wazenî ki Oris bêro Tirkîya bigîro. Ne mamus bimano, ne zî dîn!

Guli nê qalan ra zaf çî fahm nêkerdî, la 'edetêk ya bi, gama ki çî bivajiyaynî illehîm ya zî dekwetinî miyan. Va:

– Wîî Xal Dewrêş! Hûmay nêko, nê çî qalî yî! Oris pîs o!

– Ez nêzana Guley ma, ez anarşîstan rê vaja, ez Kurtçîyan rê vaja; mi zî şaşkerda!

– Nê çî wazenî gidî!

– Dişmenê dewleti yî. Dişmen, dişmen, dişmen çî yo Guley ma!

Şemdîn Wistay hinî nêva Zîni nêweş a, mirena. Va:

– Dewrêş, Dewrêş nika ti wekîlê dewleti yî?

– Qey, dewleta ma niya? Wa anarşîstê şarî bêrî birijnî û ma vengê xwi nêkî?

Nê qiseyanê Dewrêşî ser ra, Şemdînî emşo reya verîni ver a xwi taday Dewrêşî. Xizali û Guli zanaynî ki Şemdîn Wista hinî reyna meselaya Têlî û Yadê Began Dewrêşî rê vano. La yînî xwi pîzze di vatinî mela mesela kilm bibirno. Çimkî eke hewawo ki gilangan keno, gilana behsê Şêx Şerîfê Govderî, Şêx Evdilayê Melekan, Şêx Se'îd Efendî biko, şewî qediyêna. Şemdîn Wistay engîšta xwi rêşanay û va:

– Hero mi ra biewnî! Liya mi to ra hizar reyî vato, mi hetî qalê na dewleta xwi meki! Mêrdimo ki 'esl û fêslê yê çînêbo xwi ra wina yo! De rê ha vaji ha vaji! Ti qirbanê ceniya Yadê Began, Têlî bî! Yay bi a ceniye yda xwi, ver a dewleti ceng kerd. Ti 'eteriyênî ki çirê şar nengan dewleti çîneno. Ez teqeno ki ti zî xwi camêrd hesibnenî! Hero ez se ka! Yew na qula banê mi nêrînenî ki ez to ra bixelisiya!

Şemdîni emşo zaf kilm birnay, la qalê yê wişkî bî. Reng-meng Dewrêşî di nêmendbi. Şemdîn Wistay yû rezîl kerdbi.

Dewrêşî va:

– Xwi ra to di qalî nêbenî. Nika Gulê mi se va ki Şemdîni ez endi bê'arz kerda? Nêzana çend serrî ra ver çi biyo, çi şiyoy! Çi biyo, biyo! Ewro ma pêro binê bêraqa Tirkîya di yî, wessilam eletemam!

Şemdîn Wistay hêz da xwi, werişt û va "Mi miza kutikî ver a bêraqa to daya" û şî zerredê keyî. Gama ki şî, xwi bi xwi vajiriyaynî: "Bêraqa yê esta! Bêraqi bigîri xwi biperni!" Qalê anasarênî Şemdîn Wistay caran Dewrêşî ra nêkerdibî. La Dewrêşî zî çi ray de rê qalê bêraqi nêkerdbi.

Guli na mesela bêraqi weş fahm nêkerdi. La gelekî şad bî ki Şemdîn şî zerre. Çimkî riy Şemdîni siya w sot bibi, hêrsan ver destê yê recifiyaynî. Şiyaynî bido Dewrêşî ro. Xwi ra Dewrêşî di gan çinêbî, qelbê yê zî nêmcet bi.



Nêmey şewi bi, Dewrêş cili miyan di qewqiziyaynî, hewn çimanê yê nêkewtinî. Hin dî ki kuçe di yew babagundî û şemate yo... Serey xwi hewa na. Ay hing di "req, req, req" berê teberî kuwiya. Wina daynî berî ro ki eke ber qasidî nêbînî nika parçe parçe bibi. Dewrêşî xwi pîzze di va "Zîni merda, amey xeberi danî mi". Cili miyan ra çeng bi, vazda, hetana ki çengalê berê zerrî rona şî diwar, na rey paşkilî berî ro ginaynî. Dewrêş qîrra va "Lila şîma harî bîy, ez ha yena yena!" Senê ki yê çengalê berê teberî rona, yînî ber nuski da, o pey berî di mend û yew bolê polîsan dekewt hewşî miyan. Yê ki amey zerre, qorrînî berê Dewrêşî yo akerde xwi çima kerd, raşt ramit zerre, qorrî zî destê çepî ser o şîy berê Şemdîn Wistay ver. Şemdîn Wista, pirên û timanê sipî piradeye, hema newe vejîyabi teber ki polîsêkî yew nuçiki dekuti bide, Şemdîn sekuy ser ra vir bi hewşî miyan. Yewna polîsî zî pey berî di Dewrêş dî, çengiley yê tepîşt kaş kerd. Hinî demewo ki zerrey keyan di gurey yînî qediya, Guli û Xizali zî xwi ver şanay ardî teber. Şemdîn Wistay gama ki dî ki cilê Xizali û Guli piradayey û serqotî niyî biney pişîka yê nişti. Hêrsan ver lewê xwi gaz kerdîni, to kardî bidaynî piro gûnî tira nêameynî. Nuçikê xwi endi şidênaybî ki nengûy yê yê dergî salda destê yê ra şîbî. Polîsan norûdora yînî di helqa bestî û yê sey hêşîran dekerdî xwi miyan.

Komîsero kej o derg, destê yê şeşderbê yê ser o, hemînî ra yew bi yew ewniya, şî Dewrêşî hetî vindert. Hema komîser Dewrêşî ra çî nêpersabi, Dewrêşî qalê xamî yê Tirkî heme hadire kerdî û waşt ki hemînî binawno -illehîm zî Xizali- veynî yû wayirê çi hunerî û qudretî yo. Va: "Ez Dewrêş Dîcle, katibêko teqawitbiyaye yo. Keswerendaşî di wina memele nêkeno. Mi vîst û panc serrî dewletî rê xizmet kerdo. Ez hakiman û sawciyan reydi weriştî-roniştî, wina nêbeno canim!" Komîser vindert, fekdê yê ra ewniya. Dewrêş Xizali ra ewniya, senê ki serey ya yo dereyaye

dî, yewrayî xwi tik kerd, va "No çi hal o? Nêmey şewi, şima ma cenî û camêrdî tiya pêser kerdî, çi heqê şima ma ser o esto?" Komîserî xwi şidêna, çiqasa ki ti ra amey pêt, yew lekmati binê goşdê yê ra visti, Dewrêş cadê xwi di çerexiya. Pey ra paşkilêk zî werd, serey yê dêso daştên ro gina. Komîserî va:

– Law, ma emşo endî mêrdimî amey tiya ki ti ma rê nituq bancî? Kutikzay kutikî! Katib, him zî teqawitbiyaye! Herî ra kewte, ti katib nê lacê Hûmay bî se beno? Lezi şo ay lacê xwi yê anarşistî mi rê biya! Nêki ez emşo hetanî nimacî estanê to te'nen!

Dewrêş werişt, destê xwi reyra fekê xwi yo gûnîbiyaye esterit û ebi vengêko zaf nimz va "Lacê mi çino Komîser Beg, ez wecaxkor o!" Komîser piro bi giraney Dewrêşî tepîşt, tê şana, va:

– Nika zî ti ma xapênenî hêê? Lezi şo cuzdanê xwi biya!

Polîsêkî ra zî va "Ay kaxidî bidî mi, ma veynî!" Polîsî kaxid da dest, komîser ewniya, va "No çi tewir name yo? Şima nêzanî nameyêk zî raşt binusî?" Polîsî va "Raşt o komîserê mi, namey yê wina yo!" Komîserî serey xwi berd-ard va "Wina name beno?" Yew-di rey hêdî fekdê xwi di va, hêşdê yê nêkewt. Venga Dewrêşî da, va "Law katib, to no name kotî ra ardo?" Vîr a şibi ki Dewrêş şiyoyê cuzdanê xwi geyreno. Dewrêş ame berî ver, viyey xwi xwi ver na, va "Komîserê mi, willay mi nêdî!" Komîserî va "Hero, eke keye di bibînî xwi ra ma ka veynî, kermicino pîs! Qey gillî ma nêrişay! Bê tiya bê!" Dewrêş se takêş ame, destê xwi yê ver di bestî, milê xwi çewt kerd û vindert. Komîserî va "Biwani nê namî ma veynî!" Dewrêş ewniya perrê kaxitî ra, name destî reyra nusiyabi û Dewrêşî nêşaynî weş biwano. Nika na derbi ra pey, yewrayî hêş sere di nêmendbi. Komîserî va "Biwani!" Dewrêşî va "Wendişê mi biney kemî yo!" Komîserî destê xwi day pêro, têq têq huwa, ewniya Şemdînî ra û polîsan ra, va "Nika ney şima heti nêva Ez katib o! Him zî teqawitbiyaye!" Polîsî binê lewan ra huway. Komîserî va "Katibo nêwende! Hero gurey to wendiş û nuştîş o! Ti senê nêzanî biwanî?" Dewrêşî va "Komîser Beg, ez bi xwi mubaşîr biya, serra peyeni hakimana ez kerda katib (a gamî fekê yê pîrrê gûnî bi, hêdî tuf kerdî) û ez katibey ra teqawit biya". Komîserî rê hinî gure vejîyabi, to vatinî veynî ameyo tiya pey Dewrêşî kay biko. Va "Hero ti katib benî, mubaşîr benî, çi gi benî bibi! Ti senê namey lacdê xwi nêzanî?" Dewrêş xînt bibi. Nêzanaynî se vajo. Komîser heta Şemdînî ra şî, cor ra hetanî cêr cilanê yê yê sipîyan ra ewniya, va "Lacê nê teqawitbiyayî çino?" Şemdînî va "nuç" û seredê xwi reyra zî îşaretê "ney" kerd. Komîser reyra hêç bi, kaxidî ra ewniya, senêwa nusiyabi ayawa wend, va "Pekî no Yad lacê kamî yo, Yad?" Şemdînî Tirkîya xwi ya nêmcetî reydi va "Yad, lacê min o". Komîser qîrra va "Şikir Hûmay rê, ma bawkê Yadî ca kerd! Yad, yanî çi?" Şemdînî zî yew hewawo sakin va "Yad yanî Yad. Namey lacê mi Yad o". Komîserî va "Yanî ez vana me'na Yadî çi ya? Mesela lacê mi namey yê Alpaslan o. Alpaslan namey yew padîşayê ma yo. No Yadê to çi yo?" Şemdînî pîzzedê xwi di va "Kura bari yo wa ewra di biqerifiyo. Mi xwi şinasnayo nêşinasnayo mi teresey nêkerda,

ez ko vaja, se beno wa bibo” û va ”Komîser Beg, serekeskerêk ma zî bi, şarê ay cayanê ma bi, zaf camêrdek bi, tira vatinê Yadê Began. No Yad, namey ay Yadî yo!” Rengê Dewrêşî zerd bi, bi hezey şima. Komîser fikiriya, fikiriya, va ”Hella, hella! Mi namey yew serekeskerê anasarênî nêşnawito!” Şemdînî witê xwi nekêrd. Dewrêşî pîzzedê xwi di va ”Şemdîno ehmeq, ti de'ey biki ki ti weş Tirkî nêzanî û komîserî 'ma'yê ro ra çî fahm nêkerd. Nêki ez zana se bînî to!”

Komîserî bineyna gefî wardî û çend rey giraney Şemdînî repîşt tê şana û behsê Yadî kerd ki senê Berê Koy di sloganî vatî.

Demewo ki komîser ber ra teber kewt Şemdînî ra va ”Hero timanderg, eke ti siba lacê xwi niyarî qereqol, de hinî ti zanî ez se keno to!”

Torzînî zimbêlê Şemdînî nêbirnaynî. Çimê Guli û Xizali di bibi sey Koy Sipî. Endi berz û bi heybet. Bêguman mehkum biyayişê Yadî ver kewtinî. Tena serrêka yê mendibî ki fakulta biqedêno. La reyna ebi camêrdekeya Yadî zaf şad bibi. Ebi nê fikiran û xeyalan serey xwi rona, xwi di şî.

Guli Dewrêşî rê bîr ra biney aw anti, Dewrêşî dest û riyê xwi şutî. Dindanê yê, lewê yê yê cêrênî ro şîbî, lewê yê şeqnabi. Alişka yê ya çepi di herunda engîştanê komîserî hema zî asaynî. Paşkilo ki komîserî dabi qinestedê yê ro, Dewrêş kerd bi se şênîyo xirabe. Guli, hetî ra Dewrêşî rê ardim kerdinî hetî ra zewtî daynî Komîserî ro.

Dewrêşî ca da tefralê ki polîsan zerrey keyî ra vila kerd bi û rakewt. La Komîsero Kej çimanê yê ver ra geyraynî. Xwi cili miyan di tada, kişta yê jan kerd. Serey yê bibi sey kuy. Dêrdê serê derdan, qelbê yê zî tîri kerdinî. Biney qelbê xwi vilêna. Çimê xwi pê ser nay, dî ki unîformaya yê ya mubaşîrey piradaya ya û berdê mehkema ver di şono-yeno. Dewijê ki ameybî mehkema, binê çiman ra tira ewniyaynî. Tanî peşmiriyaynî, waştinî silam bider dîy. Dewrêşî miruzê xwi tirş kerdinî, çarey xwi qirmîçnaynî. Peşmiriyayişê yînî seki ridê yînî ra bicemediyo, wina mendnî. Ameynî xwi eştnî bextê yê ki yû gurey yînî veyno. Yê destê xwi pey qinda xwi di bestînî û pîyase kerdinî. Dewijî yê dim a vazdaynî û pereyê ki destê yînî di bîy, hêdî dekerdinî taneka yê. Dewrêş senê peran ra ewniyaynî hin dînî ki komîserî xwi pelek nayo û yeno bide. Cili miyan di xwi tada polê bînî ser, exxa û puffa. Nişka ve ra çimê xwi akêrdî ki dîna hema tarî ya.

Hewt hebî Qullowellay wendî û çimê xwi newe ra paday, hêdî hêdî figurê leyminî lezkanî çimanê yê ver ra viyartî, ver ra ver ra werdî bîy û peynî di vînî bîy. Dî ki yû û çend embazê xwi ha beyntarê Dara Hênî û Çewlîgî di yew ko ra yî. Yû heze serekê mehkuman, tîfingêko modelî dest di yo, mundî ra cor heme leşa yê ebi rextanê fişekan xemelnaya ya. Xencerêk munda yê ver di yo, destey yê kateyên o. Gama ki tînci dana piro, bereqiyêno. Kelawêka neqşên a ki Xizali de rê bi destanê xwi neqşênaya û Şemdîn Wistay ra pinanî de rê erşawita yê ser o ya û durbunê yê yê viye di yo. Ko ra, pompola Dara Hênî-Çewlîgî asena. Dewrêş û embazê xwi wazenî rayanan ser o bikî. Yew neqêbo teng di, çend kerreyanê girdan gindir danî

rayirî ser û vindenî. Yew cîpi asena. Luliyane tifingan tadanê cîpi, cîpi vindena. Çar kesî cîpi ra peye benî, destê yînî seredê yînî ser o kaş ro ser kewenî yenî Dewrêşî hetî. Yê ki nîzdî Dewrêşî benî, Dewrêş ewniyêno ki çi biweniyoyî! Yînî ra yew komîsero keş o. Dewrêş vano "Hero ez asmênan di to geyraynî, Hûmay ti 'ard di day mi! Ti hinî mi dest a se ra şonî?" Komîser xwi erzeno bext û namusê yê, lebêno. Dewrêş paşkilêk dano qînda yê ro û vano "Sey herî bizirri!" Komîser zirreno. Vano "Sey kutikî bilawî!" Komîser laweno. Vano "Hero to ra lewey ay koy aseno? Ganî ti mi wegîrî hetanî ayca!" Dima yew sêxi virazeno û komîserî wenîşeno. Çend gamî şonî, Dewrêş sêxi dekweno viyedê komîserî, komîser loqan erzeno. Dewrêş ser ra vir beno, serey yê yew tehti ro gineno.

Nişka ve ra Dewrêş cili miyan di çeng bi xwi ser, destê xwi berd seredê xwi. Nê hewnî ra pey teqilê yê gelekî sivik bibi, zerra yê weş bîbî, keyfê yê amebi ca. Kelawa neqşêna ki Xizali viraştîbî yê vîr ra nêşînî. Tena kelawî nê, nika Xizali zî kewtibî yê vîrî. Waştînî nika yay veyno. To vatinî qey Xizali waştayê ya serran a û yê ser o aqil pernayoy. Pîzdedê xwi di va "Tirê nika hewn di ya, yan haya ya?" Yê caran ya hewn di nêdîbî. Xizali virara xwi di xeyal kerdî. Zanaynî amnanan Şemdîn û Guli heyatî di rakwenî, va "Ya îllehîm zerre di ya". Yû ay ode di zaf ronîştîbî, ode ard çîmanê xwi ver, xwi pîzde di va "Nika cila xwi çarçîba ver di vista. Semedo ki germ o, zaf kincî zî pira nêgirewtî. Pirênêko tenik o sipêloç û citey pirênbazê surek ê şeytinî pira yî. Semedo ki pirênbazî bizmeyinî niyî, pancey şîy qayme, çaqê yay heyânî çok virran î. Qula pancî ra hêtî ya yê sipî asenî." Fekê yê ziwa bî, rayêk-di aliya xwi dequltnay, bala xwi day pirênê yay, dî ki heme hîrê gocagê pirênî akerde yî, çijey yay sey di beşîlanê deresayan pê ver ra kewte yî. Çala naki binê pirênî di zî beylu bî. Şilabend ki tira asa, tira qelbê yê xeyalê yê kerdî se şuşaya ki bigino kerra ro û bibo werdi werdi. Rakewtişê Zîni ame yê vîrî: Fekê yay o akerde, nekê ya yê girdî, pîrnika yay a koli, hilmê ya o boyin, reyey destanê ya yê ki sey xetanê trîni binê postî di asaynî. Ay halê Zîni çîmanê yê ver ra şî û ame, şî û ame, mirûzê xwi tîrş kerd, xwi pîzde di va "Tirê mirena?" Xwi tada heta dêsî ra û çiyê ki doktoran ti ra vatîbî, ser o newe ra fikirîya. Hinî wexto ki bawer kerd ki mirena, xwi weş besetna, yew-di fekulay piro ginay, xwi tada polê bînî ser û xwi hetî va "Gelo ez mergê Zîni bipawo yan ez nika ra Xizali biwazo? Eke ez nika ra çend mêrdîman bîrşawo Şemdîn Wîstay hetî, çi zîrarê yê esto? Laeke Şemdîn 'eynadey biko? - Zanaynî ki keno zî.- La eke Xizali vaja ney? Xwi ra sewki ya vaja ney, Şemdîn Wîsta caran razî nêbeno. Na mesela hel bika Guli kena. Guli zî wazena Xizali ra pak biba." Yew deme wina pê ver na, rijna; pê ver na, rijna; peynî di bawer kerd ki na mesela serê xwi gêna. Mêrdîmanê ki erşaweno Şemdîn Wîstay hetî zî beylu kerdî û hêdî hêdî xwi di şî.



Guli û Xizali weriştîbî, hewş şutinî. Wina şutinî ki mêrdîmî vatinî qey vanî wa rêça linganê polîsan kerranê hewşî ra nêmana. Ay hing di berê teberî abi, herdiyan piya serey xwi hewa na ki Zîni ha miyanberan di vinderta ya. Herdi zî matmende Zîni ra ewniyay. Zîni bê ki vajor biba çend gamî awa hewşî ser ra eştî, ver bi yînî amey. Bêvengeya Zîni yê hina şaş kerdî. Qando ki sewlê yay hîy nêbî Zîni cawo ziwa ra hêdî hêdî ameynî. Guli Xizali ra va:

– Keynê willay na Zîn a!

Zîni va:

– Rebbîyo, ti kesî nêfînî destê nê Gawiran! Eza weş û wari vista çi hal! Tanî mendbi ki ez aqilê xwi biperna. Ya Rebbî, mi emşo çi dî, çi nêdî!

Zîni çi ray nêvatbi ”Eza weş û wari”. Guli va:

– Qirbanê to Hûmay biya! Na belengazi çi gunê kerdo? Qey rêşa mêrdimweri bes nêbî, to ya aqilê serî ra zî kerdî?

– Herê Gulê, qey ti bawer nêkena ki ez weş a? Mishefê Key Şêxî mi kor ko ez weş a! Rêşî-mêşî mi ro nêameya. Rêşî, rêşa Zîba Pasûriji bî. Serey xwi boro namey na nêweşî çi bi! Ha, Zîba Pasûriji qansor o, qonser o, biya. Namey mi ebi şaşey kaxidê yay ser o nuştî û yê yay zî yê mi ser o nuştî. Keyxeripiyayeyan emşo yew barê daruyan da mi, hêş mi sere ra şî. Zîba belengazi zî hetanî nimacî qîrray, dosere ra doktorî amey ma ser o pêser bî, newe ra gûnî ma ra girewti, ez me'yene kerda ki ez nêweşî niya. Ti vanî veynî sucê min o, hema çengiley mi girewt ez teber kerda. Ay hûmaygirewte kotî yo, qey vengê ma nêsono bide? Ez vizêr ay hal di weyra ca di verdaya, nêva ”Na kutik a, mêrdim a”.

Dewrêşî zerre di nê qiseyê peyenî eşnawitî, verî va qey hewn vînenî. Goşî ronay ki ney, vengê Zîni yo. Zîni se gramafona fosi, nê vatey xwi çend reyî pê ser o vatî. Dewrêşî hêz da xwi, nêşîya wardo. Seki xencerêk serê zerrida yê di rojanaye bo. Çimê yê nêbirna reyna bicerebno. Zoran ver, pencurrî 'ard ro bi. Çimê yê tarî bîy, dewqa yê şî, zerra yê qelebiyay. Dejê qelbî, nefes piro peysnabi. To vatinî qey binê siya arê di mendo, nêşaynî xwi têw do. Serey yê feteqiyaynî. La hêşê yê hema yê sere di bi, waştinî veyno raştî Zîni ya, Zîni niya û çiyê ki vana raşt î. Waştinî biqîrro. Qelebna. A gami ra pey hêşê yê yê sere ra şî. Reyey qirrikida yê bîy sey çuwan, leşa yê ancîyay pêser, lewê yê sîyay bîy, bîy sey teney. Leşa yê cor ra cêr bî sey kulavî. Çend reyî sêney yê berz bi, nimiz bi, seki ti fekê meşka vakerda akî, puffîyêk tira amey. No cîf cîfo peyen bi. Çimê yê ver bi ber, wina akerde mendîbî.

# "SİYASİYEN ME NEBÛN"

## II

**V**êca go em hatin, em çûne cem Şêxê Teyya.<sup>1</sup> Kirîvê me bû, em li xwe girtin. Û Feransa ji me ra dijmîn a. Me [ji] Feransa kuştîya. Du Musteşarê 'Eşayira hatne cem Şêx, gotne go:

– Haco û zaryê wî, me divê tu bidê ma. Tu nedê ma, emê dijmunaya te kin û sed zêrî jî [ku wek] me'aş em didine te her heyv, emê qut kin.

Şêx go: – Wele, bi Xwedê ez nadim. Ne usûla 'eşîra ye û kirîvê min e. Ez nadim. Hema hûn çî dîkin, bikin.

Me bihîst, bavê mi bihîst. Rabû şîyande Mûsilê. Hakimê şîyasî li Mûsilê ye. Zilamik şîyand û mektûb danê û halê xwe jê ra got. Go "Hûn mi bihewênine Îraqê, em êne cem wa".

Qasidê me veqerreha, gote bavê mi "Wele gotiye em te nahewênin. Lê bi wî şertî go tu hezar tivingî û deh hezar fişek, pakêt bidê, emê te hewênin. Tu mişaxa ve diçê,<sup>2</sup> şêr bi hikûmeta ra dikê. Bi Xwedê em te nahewênin. Û bi wî şertê tu here Bexdayê ya Besrayê."

Êdî bavê mi go "Ne ez diçime Bexdayê û ne ez diçime Besrayê, hema ezê çime Feransa". (Mebest ji Feransa, herêma ku di bin destê Frensayê de ye, Sûriye. – H. Kilicaslan)

Vêca eskerê Feransa hatibû. Ez jî bi bavê xwe ra. Hesên birayê min î ji mi mestir bû. Bavê mi û Hesên û ez û Ûsif, em her çar suwar bûn, em çûn. Bi serê bavê te, em çûne binê çadirê. 'Eyn bavê mi li mihîna Rogan<sup>3</sup> ê go me li vir kuştî, li mihîna wî suwar bû. 'Eyn li mihîna wî. Eh, em çûne binê çadirê. Têcîrman [tercuman] yekî Mêrdînî bû, î nas bû. Goryê go:

– Ma ev kî ya?



Go: – Wele Haco û zaryê xwe na, hatina dexaletê.

– Ûh, ûf!

Musteşar wilo cifilî. Bavê mi go:

– Hema sebir bika, pênc deqqa ez ji te ra biştexilim, tu çi dikê bika. Ez hatima dexaletê.

Ewraq bi bavê mi ra hebûn. Hemi bi navtêdanê Tirka. Û kûçikbavê Tirka digota hikûmeta Feransa: "Kurdê çiya na û bêyî me diçin Feransa dikujin û ewa dikin."

Vêca evqa cebilxana go dane ma û ewa di bin emza [îmza] wa da. Ya [îmza] Mursil Paşa, Cahfer Teyyar Paşa hetaa bi Mustefa [Kemal] Paşa. Heta bi weslê [meqbûzê] tivingê go dan, fişekê go dan û qaweta go dane ma û em dihatna Feransa, bi navtêdanê wa. Go "Got[in] 'hûn neçine Feransa emê te û zarwê te [bi]kujin', vêca em dihatne we.

Fillehê təcîrman [meqbûz] xwend. Hingî nivîsandina eskî ya Tirkî bû. Xwend, xwend û jê ra got go:

– A va ye hal û mesela Haco ev a. Haco cebir kirina û wî [di]kuştin, go bi ya wa [Tirkan] nekrana.

Berqî [telgraf] da Bêrûdê, Mufewiz,<sup>4</sup> go "Va ye Haco hatiye dexaletê. Hal û meselê wî ev in, ev in. Ka bê emrê te çi ya?"

Bi lasilkî [bêtelê, têlsizê] xeber da. Xeber vegereha bi lasilkî, go: "Haco û refîqê wî, di vê medda Feransa da hemi 'efû."

Êdî em 'efû kirin. Îja qedrê bavê mi gelkî girtin. Me'aş jê ra girêdan û gelekî. Heyvê çil û pênc zêr didanê. Axirê ev gund hemi dane ma. Ah vêca nuha ji ma standin.

– *Bextê Feransîz ji ê Tirka çêtir bû?*

– E. Me [ew] kuştin û [wan] em 'efû kirin. Çawa ne çêtir bû? Me [ji Tirka re] xizmet kir, fermana me rakirin. Wele, bi serê bavê te, mesela me wiha bû. Em mecbûr çûn. Em [bi] cebir şiyandin. Ji xwe, 'ewil go "Werne Nisêbînê, Nisêbînê bihimênin [biparêzin]". Em çûne Nisêbînê, go "Yellah herne Diyarbekir". Û em çûne Diyarbekrê, go "Herin têlxurafê çêkin". Vêca heta em çûne Sêwregê.

– *Berê mala we li kuderê bû?*

– Li Torê<sup>5</sup> bû. Badim<sup>6</sup> heya, gundik e. 'Eşîra ma, gundê ma hemi li banî (li gora Sûrîyê, li jor-H. Kilicaslan) na. Ma em kî li vir in? Pêncsed gund Hevêrka<sup>7</sup> heya. Pêncsed gund, bi jimar. Hemi mezinê wa[n] ya em bûn, ya kurramê [pismamê] me bûn. Ê Serhan û Çelebî bû, ya bavê min û 'Elîk bû.<sup>8</sup> Eh, me ji hevdû dikuşt, me jî berberî pev ra dikir, li axatîyê.

– *Ew kuştin, ji bo axatîyê bû?*

– Erê Welleh, jiboyî tamayê û axatîyê bû. Hê nû vê taliyê em pê hessehan, hema êdî çû. Go hingî hema çar axa destê hevdû bigirtana, wî berdine Tirka ji welatê ma. Her axakî, qeweta wî weke a hikûmetkê bû. Vêca me nizanîbû. **Siyasiyê me nebûn,**

Welle siyasiyê me nebûn.

– Ê baş e apo, nuha siyasiyên me jî hevdin dikujin.

– Hii?

– *Siyasiyê me jî nuha hevdin dikujin!*

– Wele nuha tu mezin nemana. Hema dûtî ruwê te, sêwelek in. Ma ne ew hevdû dikujin. Erê bi serê bavê te, mezin jî nemana. Bûne deh, duwazdeh partî. Vêca hevdû dikuşt, hin gittin, hin kuştin, wî tevizî ne.



Sal: 1926, Haco Axa bi Musteşarê Frensîzî re û keşeyek  
(Fotograf ji Konê Reş hatiye girtin.)

– *Em jî di riya mezinê xu da dimeşin apo.*

– Hi?

– *Mi go! Em jî di riya mezinê xu da dimeşin. Di rêça mezinê xu da em dimeşin.*

– Aa... Tu zani, ew rê wele çûya. Go aqil hebê, hingî nebû, qewmîyet nebû, ev tişt nebû. Wey li wî go xwe bi hikûmetê [gihîne]. Digo "Axayê go neçê hikûmetê, hikûmet ê wî nas nekê, ne axa ye, nabê axa". Heh, ma emê çi [bi]kin? Birazê, [li Sêwregê] î mezin [he]bû, gote min. Ez hingî zaro bûm. [Î mezin] go "Nuha hûn ji kû ne? Hûn ji kû hatine?"

Mi go: – Em Midyatî na. We navê wê nebihîstîya?

Go: – Belê.

Mi go "em ji Qeza Midyatê na" û halo û halo ya.

Go: – Ê hûn hatina şerê Şêx Se'îd. Ma yek ji we ji bavê xwe nîna go hûn tivingê li ser vî axayê xwe [Haco Axa] nadeynin û navegerine mala xwe?

Mi go: – Ma em karin? Pismamê wî zahf in, kurrê wî hena. Welatik li piştta wî [Haco] ya. Ma kî ji me karê wî bikujê? Qaweta kê dighêye da?

Ez hatim, mi gote bavê xwe hal û mesele. [Min got: ] "Evê em di nav wa da, bi Xwedê hemi ne dost in."

[Bavê min] weke Tirka, em îçtîma' kirin [û] go: – De pakêtê ji tivinga dermexin û heke dest me da, emê kuştinê kin. Bera xelk bêje "Welle milletek hate vê dê, me qeland. Wa jî heqa [ewqas] ji me kuştin."

Û bi serê te, me xwe himmand [parast].

– *Yabo, di wî şerî da, çend ji we hatne kuştin? Wextê hûn çûne Şêx Se'îd, çend ji we hatne kuştin?*

– Yek [jî] nehata kuştin. Û şer me kir ha! Wa hemuwa bazdîda û di pişt wa da, me şer dikir. Weka şerê welatê xwa. Hinî rûnin û hinî çin, wilo, Allawekîl. Dîsa, piştî wê qasê, wextê go îdî ji Qerebaxça wê de em bi nav hevdu ketin, dîsa me ê xwe xelaskirin û [alîgirên Şêx Se'îd] dused û pêncîh ji wa Zaza û Dumbila girtin. Hikûmetê [jî] eskerê Şêx Se'îd girtin. Em xelasbûn. Û hersîh neferê peyade jî girtin.

– *Ew kuştin? Ew êsîr kuştin?*

– Na Welleh, me nebihîst go kuştin.

– *Tu divê [dibêjî] "em du cara çûn Tirka"?*

– Bi me ra soz dan, go "werin".

– *Kî?*

– Va xelkê ma. Mala Saroxên û hetaaa wa axalerê banî jî. Bavê mi mektûb şandin. [Wana] go "Hema tu bê, tu li wa xe, emê rabin". Heta Dêrika Çiyayê Mazî, timam, yanî mektûbê bavê mi ji wa ra çûn. Û bi serê bavê te, em çûn. Her du cara go em diçûn, ê pismamê ma, ahlê ma, 'eşîra ma rahiştina tivingê xwe, dihatne ma. Bavê mi go "Ez hatima Tirka bikujim. Ma ez hatima Kurmanca bikujim? Emê ji ber wa rabin". Û cara talî jî, Feransa gote bavê mi go "Çima tu bêyî ma, tu diçê tecawizî hudûd dikê?" Rabûn bavê mi teb'îd [surgûn] kirin. Û Hesen û Ez û Cemîl<sup>9</sup> jî. Em jî birne teb'îdê, birne Şamê. Lê ew sozê go bi bavê mi ra dabûn, dîsa birne ser û gund dane ma û me'aş dane bavê mi. Piştî go em teb'îd jî kirin ha! Ev çîrokê ma tarîxheyatka 'ecêb a. Berî go em herne Tirka, bavê mi çû Mufewiziyê. Şandna pey, çû. Mufewiz gote bavê mi go:

– Di neqeba 'Enqerê û Parêz [Parîs] da sulh çêbûya, li ser ta.

[Bavê mi] go: Li ser mi, çima?

[Mufewiz] go: – Divê tu ji hidûd pêncîh kîlometrî dûr kevê.

Bavê mi go: – Emê vê bikin. Berî nuha jî neqeba mi û wa da kuştin çêbûya. Heta zaryê mi, timamê bazdin, çûna Turkîya, kes namênê. Axir heyata min a.

Go: – De emê pênc tîsta ji te ra [bi]kin, vê gotnê qebûl bike. Go tê qebûl bika, hema tu bi tenê teb'îd [bibî]. Ji te pê va, ne kurrê te, ne 'eşîra te, tu kes. Heyvê çil û pênc zêra emê [bi]dina ta û pêncsed zêr jî emê [bi]dina ta îkramî. Go hema tu bi ya me bikî, tu pêncîh kîlomitir ji hudûd dûr [bi]kevê.

Bavê mi hat. Hesen go: – Yabo, ma çi xam [xem] a? Hema bira te teb'îd bikin. Em di cihê xwe de na û di gundê xwe de na û gund dane ma.

[Bavê min] go: – Heta ez poşkê<sup>10</sup> li Tirka nexim, bi Xwedê em naçin. Vêca carke dî me esker çêkir, em çûn. Bi serê te, me tiving jî ne peqand. Kurmanc hatne ma. Pismamê ma, kurramê ma hatne ma, em vegerehan. Em teb'îd kirin. Vêca ew her pênc şertê go bi bavê mi ra gotin, kirin: Pêncsed zêr îkramî danê, her heyv çil û pênc zêr, pênc sala jî 'eşîra me mi'af [bû], heçî gundê ma hemi. Û kurrkî, Osman ji, ê Hesen,<sup>11</sup> ew jî meccanen [bêpere, belaş] li Bêrûdê dane xwendinê. Axir her pênc şert birne ser. Em teb'îd jî kirin û dîsa qencî kirin.

– *Yabo! Hûn jibo qewmîyatê diçûne Tirka?*

– Erê Welleh, xas qewmî.

– *Ew ]Kurmanc] çima dihatne pêşya wa (we), şerê wa?*

– Ê Kurmanc dihatin hevaltîya Tirka dikirin. Yek nerrabûn. Ne ê Dêrka Çiyayê Mazî, ew li wê derê. Kurrê Brahîm Paşa û yek ji wa xelkêd mala Cemîl Paşa di wê ra çûn. Çûn, dîsa berdane wa, hatin. Û em di vir re çûn; Celadet Beg -rehma Xwedê lê be- û bavê mi û em di vir re çûn. Ê Kurmanc hatne ma.

– *Yabo, hûn çiqê hebûn?*

– Ma xwene mi jimartiya ez zanibim. Em gellik bûn. Em çarsed, pêncsed zilam hebûn û ê dî jî hevalê me bûn, 'eşîra me bûn. Me digo "ê me na". Vêca ê banî, belkî çar hezar hebûn. Me go wê arî me kin. Ma me zanibû? [Şêx] Mêhdî<sup>12</sup> û Şêx Evdirrehîm<sup>13</sup> jî hatin li vê dê, li cem bavê mi bûn. Îja Şêx Evdirrehîm rabû [tevî] çend zilam, Cemîlê Seyda,<sup>14</sup> nizanim kî û kî, go[stin] emê çin nav wa 'eşîrê banî û emê sewrê [şoreşê] [bi]kin. Çûn, dîsa Kurmanca xayintî li wa kir, îxbarî li wa dan, hemi kuştin, yek jê neberdan.

– *Yabo, tu karê çîroka wa bêjê?*

– Na yabo. Ez ne di nav wa de bûm, lê ez zanim di nav genimkî de xwe veşartin û zabitkî Tirka hat, xapandin, ew jî bi wa ra bû. Wî go "[ez di]çim xwarin ji we re bînim". Ew di nav gênim da bûn, xwe veşartin. Ew çû xeber dane mexfera,<sup>15</sup> hema hemû li wa dera kuştin. Vêca ew Şêx Mêhdî, qederkî li cem bavê mi ma, pişt re êdî 'efû jê ra hat. Malik ava, Tirka 'efû danê, çû. Nizam ne hê dimênê ne na.

– *Yabo, hûn çilo bi qewmîyetê hissehan?*

– Yabo, wextê go Ekrem Beg<sup>16</sup> û ew negirtin, navê wî çi ya? 'Evdilkirîmê 'Eliyê Remo,<sup>17</sup> mixaletê (kurrê xaltiya) wî bû. Cem'iyetek li Stembolê çêkiribûn. Hemze Beg<sup>18</sup> bû, Ekrem bû, digotine yekî Şêx 'Evdilqadîr,<sup>19</sup> nizam kî. Axir çendek hebûn, wilo civatek çêkirin. Hikûmet bi wa hisseha, hin girtin, kuştin û ê dîtir bazdan. Vêca Hemze çû Mûsilê -nuha tirba Hemze li vir, li cem me ya-. Eh, çû Mûsilê, ji

Mûsilê hate cem bavê mi. Ji bavê mi ra got. Û mixaleryê Ekrem Beg, Ekrem Beg girt da Tirka.<sup>20</sup> Mala Cemîl Paşa zengîn bûn. Panzdeh hezar zêr bertîl dane, ji 'îdamê xelas kirine. Vêca em ji Hemze û vir de pê hissehan. Heme ji wê cem'iyeta wana û vir de, êdî me hay ji Kurdîtîyê heye.

Li Taqa,<sup>21</sup> ['Elî Saîb] şanzdeh roja... Esker gelik hate kuştin, gelik telefata çêbû û dîsa Kurmancê ma, 'eşîra ma di ber re ve girtin, hema em mane bi tenê. Em û çend pismamê xwe. Em hatin ketne Dêrmelkê.<sup>22</sup> Tê da dêrek asê hebû. Ûsi<sup>23</sup> ji bawî bû. Nikarîbû ji vir herrê. Te halo kiriba, dengê wî li ba Xwedê disekinî, qarrîna wî. Em hatne girêdan. Hema bavê mi çû Cizîrê, cem wa Hecacyê Cizîrê<sup>24</sup> wana. Axir xatrê wa hebû, nizam çî hebû. Vêca wa Hecacya wana, berqî dane Kemal [Atatürk]: "Haco hatîya, dexaletê dixwazê û ev axaler hemi ê welatê wî, hemi dijminê wî ne".

De ji xwe heft axa, ya xwe li me kire yek, Allawekîl.

– *Kî bûn yabo?*

– De ma di nivê wê. Ma ez ji vê biqerrim? Ezê talî bêjim. Vêca berqî dan: "Haco hatîye dexaletê dixwazê." Berqî vegereha, go: "Dexalata wî, me qebûl kirîya. Bere bê xwe teslîm bikê; du hezar zêr bidê û sed pezî, taştîya esker û sê tiving, ê Teyyarê Osmanî, ew jî ji zabîta ra. Bere bidê û me 'efû kir, bere bê."

Bavê mi hate Dêrmelkê. Zabitik hat, digo[tin] Nûrî Weysî.<sup>25</sup> Em bi bavê mi ra, em çûn, me dî va ye Nûrî Weysî hat, go:

– Tu dexaletê dixwazê?

Bavê mi go: – Erê.

Go: – Va ye tu qebûl kirina. Du hezar zêr tu bidê û telefata esker û ewa esker wana.

Bavê mi go: – Ez ê [bi]dim.

Rabû Hisênê Ferho<sup>26</sup> -te dî, kurramê bavê min e- go: – Ez nahêlim tu herrê. Tu herrê, wê tivingê li ser te dînin, wê te [bi]kujin. Hema li vir, di nav ma da ba. Tê çawa, tê çilo înan dibê malxirab?

[Bavê mi] go: – Ezê çim.

Û bi serê te, bavê mi çû. Du zilam em li hespê xwe suwar bûn em pê re çûn. Û çû dexaletê, çû Midyadê. Ew kûçikbavê 'Elî Saîb, nav di eskerê xwe da, go "Haco li sûkê bikuje". Ev Nûrî Weysî, pê hisseha, gotyê "Welahil'ezîm, go hûn li tengî Haco bidin, emê xwe bi xwe hevdû biqelênin.

Esker bû du şeq: Ê Nûrî Weysî û ê 'Elî Saîb. Êdî bavê mi rabû çû cem Alayî Qumandarî. Wî gote bavê mi go "Herre Êstilê,<sup>27</sup> li vir nemîna. Înşîqaq (dubendî) kete nav esker da".

Êdî bavê mi hate Êstilê û ji Êstilê... Vêca Cemîl, hingî hêz kir ku... Bavê mi, go hat, em belabûn li deyna[n]. Her yek ji ma bi deverkê da çû. Ma hezar zêr da hev û hezar ma. Îja em hatne nav 'Ereba, a nav va Cewwala.<sup>28</sup> Pezê ma hebû, zahf bû. Rabû, zêrê pîreka hemi kirin cemkî xurçîkê û cemê dîtîrê jî zêrê go me dabûn hev

û mecîdî, ew tev da. Yanî, xeynî ê xişrê<sup>29</sup> pîreka hezar zêr çêbû. Ew jî bi xwe ra bir û Cemîl çû, suwar bû, bi xwe ra bir li cem Alayî Qumandarî danî. Vekir, lê meyizand. Pere hijmartin, hijmartin; cemê xurçikê vekir, ê pîreka.

Rabû têlxuraf da Mustefa Kemal, go "Haco bi tamamî anîya û bi zêdebûn. Lê nêvî jê xişrê pîrekê wa ya, zêrê pîreka ya. Ê pîrekê wî na, ê bûkê wî na, ê wa ya." Go "Jê ra tecîl bika, heta salke dî bera bidê".

Vêca me Feransa kuştin. Teşqela-meşqela me gelek kirin. Rabû têlxuraf dane bavê mi, go "Ew jî xatirê ta". Êdî, ew jî nestandin, her hezarê talî.

---

1 **Teyya:** 'Eşîreke Ereban e. Şêxê Teyya, serekê 'eşîrê ye.

2 **Tu mişaxa ve diçê:** Tu, li serê xwe suwar dibî. Tu ber'eks diçî, muxalefet dikî.

3 **Rogan:** Zabitê Frensî ku di navbera Tirbesipî û Dugirê de hate kuştin. Di wê demê de xweha Rogan li Frensa xwedîrûmet e, bi helikopterê tê heta Tirbesipiyê. Haco Axa jî qedrekî mezin ji wê re digre û alîkariya wê dike da ku bizanibe birayê wê çawa hatiye kuştin. Jinik, ji gerra xwe memnûn vedigerre û ji xwîna birayê xwe dibuhure. (Beşîrê Serhên)

4 **mufewiz:** Nûnerê Frensiya ye bilind. Komîserê bilind.

5 **Tor:** Bakurê Kurdistanê li ser bingehê cografî dibe du beş: Serhed û Tor. Tor bi xwe dibe du beş: Tora Banî û Tora Jêrîn (Xwar). Ji ava Dijle (Eskîfê) heta dighêje Çiyayê Mêrdînê û berjêr heta bi ava Cexcex (li Nisêbînê), Tora Banî ye. Ji Nisêbînê ber bi rojava de, tevli Berrîya Mêrdînê, Torra Jêrîn e. Navê Mîdyadê ye kevn Torabdîn (Tûr Abidîn) e. Mumkun e ku navê wê ji navê Torê hatibe.

6 **Badib:** Navê gundekî li Tora Banî ye, nuha bi Nisêbînê ve girêdayî ye. Ev devera ku gundê Badibê lê ye, navê wê Devera Çomera ye. 'Ezbetêke bi navê Çomerî jî di nav benda Hevêrkan de heye.

7 **Hevêrka:** Ji êlêbêtir, rêz e. Navê Hevêrkan hertim bi navê Dekşûriyan ve hatiye gotin, weke di nav Omeriyan de Mehmûtkî û 'Etmankî, di nav Mihelmiyan de 'Îsabegî û Xelîlbeğî hene. Herweha Hevêrkî û Dekşûrî jî du bend in. Mala 'Eliyê Remo, tevli ku Çêlik têne binavkirin dîsa li ser benda Hevêrkan têne jimartin.

8 **'Elîk:** Wek 'Elîkê Bettê tê naskirin. Di sala 1919'an de li ber dewleta Tirkan asê bûye. 'Elîk, Haco, Serhan û Çelebî pismamê hev in û ji Osmên in. Hisênê Ferho pisê pismamê wan e.

9 **Cemîl:** Kurrê Haco Axa ye. Kurrên Haco ev in: Hesên, Çeçan, Ûsif, Cemîl, Brahîm, Mihemmed Şerîf, Ekrem, Nayif û Haco.

10 **Heta ez poşkê li Tirka nexim:** Heta ez bi Tirkan re şerr nekîm. Gava beran şer dikin, bi quloçan têne hev. Poş li hev xistin: wek beranan bi hev re bi mêranî şerkirin.

11 **Hesen:** Kurrê Haco Axa ye. Osman kurrê Hesen e.

12 **Şêx Mêhdî:** Birayê Şêx Se'îd e.

13 **Şêx Evdirrehîm:** Birayê Şêx Se'îd e.

14 **Cemilê Seyda:** Cemil kurrê Mihemed Hadiyê Seyda ye. Mihemed Hadî Seyda kurrê Sebhetullah û Sebhetullah kurrê Resûl Paşayê Sor ê birayê Mîrî Kor e. Mîrê Kor, yanî Mîr Mihemedê Rewandizîyê Sor di dîroka Kurdistanê ya nêzik de, bi çêkirina pereyên xwe (pereyên bi navê xwe) û bi asêbûna xwe li hemberê Osmanîyan xwediyê cihêkî taybetî ye.

Havîna sala 1937'an, Cemilê Seyda, Selhedînê Seyîdxanê Üsîbê Seydo, Şêx Mizbeh, Hisênê 'Elî Begê Stewrî û Şêx 'Evdirehîm (birayê Şêx Se'îd) li dora Sînanê -di navbera Bismil û Batmanê de-, di nav genimê li ber çîrînê de, ji aliyê leşkerên Tirkan ve hatin şewitandin û şehîd bûn.

15 **mexfer:** qereqol

16 **Ekrem Beg:** Cemil Paşazade Ekrem (Ekremê Cemil Paşa)

17 **'Evdilkerîmê 'Eliyê Remo:** Yê ku Ekremê Cemil Paşa girt û da destê Tirkan. Lê di pey vê "xizmetê" re 'Evdilkerîm ji ji aliyê Tirkan ve hat kuştin.

Evdilkerîm gelek neheqî li derûdora xwe dikir. Piştî ku hat kuştin, tu kesî nema wêrîbû xwe li wî bikira xwedî. Jina wî Siltanê, heta beriya sê-çar salan sax bû, çûbû hecê û li Hîcazê xwe dabû xizmeta dînî. Ji Dekşûriya -ku mala Mahmed û mala Nahroz in- jina Mihemed Şerîfê Nahroz, La'lê, xweha 'Evdilkerîm bû. (Fayîq)

18 **Hemze Beg:** Hemzeyê Muksî (Hemzeyê Mîksî) ye. Ew, yek ji mensûbên Kîrdistan Tealî Cemiyetî, herweha mudirê berpirsiyar ê kovara Jînê (1918-1919) bû. Kemalîstan deh sal ceza hepsê dane û ew li Hepîsxana Kastamonuyê maye. Dû re çûye Sûriyê, bûye endamê Xwebûnê (Xoybûnê). Li 'Eyndîwerê û Hesîçeyê mudiriya xwendegehê kiriye, li Hesîçeyê çûye rehmet û gorra wî li Dugirê ye. (Binêre: Malmîsanîj, "Jîn Gazetesi", Berhem, Stockholm, no: 4, Sibat 1989, r. 12-13)

19 **Şêx 'Evdilqadir:** Seyîd 'Evdilqadir (kurrê Şêx 'Ubeydullahê Nehrî)

20 Li gor ku Ekrem Cemil Paşa di biranînên xwe de dinivîse, ev bûyer di 1922'yan (an jî di dawîya 1921'ê de) de qewimiye. (Binêre: Ekrem Cemil Paşa, Muhtasar Hayatım, Brüksel Kürt Enstitüsü Yayınları, Brüksel, 1989, r. 57-58)

21 **Taqa:** Gundek li mintîqa Bazînê Taqa ye. Gundê Yêzîdiyan e. Ji Dalînê berjêr, ber bi Nîsêbînê de ye, lêbelê danûstendina wan bêtir bi Mîdyadê re ye.

22 **Dêrmelk:** Gundekî Mîdyadê ye.

23 **Ûsîf:** Kurrê Haco Axa ye.

24 **Hecacyê Cîzîrê:** Kesên dîndar, 'alîm û şêx ên ku li Cîzîra Botan diman. Dîyar e li ba dewletê bi rûmet bûn.

25 **Nûrî Weysî (Nurî Veysi):** Efserekî (zabitekî) Tirkan ku li bajarê Mêrdînê kar dikir.

26 **Hisênê Ferho:** Pisê pîsmamê Haco Axa ye.

27 **Êstil:** Bajarê Mîdyadê du tarrên mezin in: Mîdyad û Êstil. Li Êstilê bêtir ew Fillehên ku bi şûr Misilman bûne û ji wan re dibêjin Mihelmî rûdînin. Bi 'Erebiyeke sarocftê yanî 'Erebiyeke col (tevlîhev) dipeyivin.

28 **Cewwala:** Di nav 'eşîra Teyyan de 'ezbeteke 'Ereban e.

29 **xîşr (xîşir, xîşil):** Zînetê ji zîv û zêr, jîbo xemla jinan e.

# NARS Û NARSÎZM

Laleş Qaso

**L**i gor ku ilimzan dibêjin, berî zayînê li welatê Yûnanê bi navê Nars mirovek hebû. Ev mirov rojekê diçe ser golê û li avê temaşe dike. Ew sîha xwe di avê de dibîne; li sîha xwe ecêbmayî dimîne û dibêje: Wey bavo ez çiqasî bi huzn û cemal im! Gelo kesekî weke min wilo sipehî heye?.. Nars aşiqî xwe dibe. Ji wê rojê pêve karê Nars ji sibê heta êvarê biçe ser golê, li sîha xwe binere, bikeribe û ji eşqa xwe balêse. Ev eşqa Nars serçelqî dike, nexweş dike û dixê nav livînan; lê belê ew dimre, ya jî namre ez nizanim. Bavê zanîna psîkolojiyê Freud jî navê vê nexweşiyê narsîzm datîne.

Narsîzm nexweşiyêke xwezayî ku bi her mirovî re heye. Ev nexweşî hîn ji malzarokê de xwe raperî ser goşt û xwînê dike; bi nav de dipejile dikeve mejî û bi mejî re tê dinyayê. Narsîzma destpêkê weke zarokê ku hîn xav û dûrîxlaq e; devliken e, digrî û tinaziyan dike. Şêrîn e, bêzerar e. Li gor Freud, di vê pêvajokê de mirov dikarîbû narsîzma zarokî berdestî xwe bikira û wilo bêzerar bigîhanda qonaxên xortaniyê. Narsîzma ku di van qonaxan de wê kesaxa xwe î talî bikira û bibişkuviya; bi giştî heta mirinê wê dîsa wilo bêzerar berdewam bikira. Belê Erîch Fromm wê hinekî pêşdetir biçe; Freud ber bi hêl û berhêlan de bibe, bûyerê gel civakê bijênîne û derdorên vî zarokî jî têkilî nav vê lênerînê bike.

Narsîzm nexweşiyêke piralî ye. Belê hemû jî di hindurê qalibekî de li hev dizivire, xwe bi kelemên jiyane ve diçirîne û dijî. Jiyane geh wî har û dîn, geh silûk û geh jî dike qirdik. Ji bona ku mirov jî vê kompleksê fêm bike, çarçik bigire ber xwe û lê temaşe bike, îcar pêwîst nake ku mirov psîkolog be. Ji bilî zîrnarsîstan, bi giştî herkes hinekî bi narsîzma xwe agedar e. Qîz birûyên xwe radike, şodra û bodra di lêv û rûyê xwe dide; xwe di fistên de diziqiziqîne û mîna qitîkê tenatena xwe li



ba dike. Çima ev qîz wilo balkêşîya û keftûleptê dike? Di vir de dilbijokiyek heye. Zilam ji vir û wir mûyan ji xwe diçelpisîne, simbêlan bi ser lêvê de dike boq û di hinê de diguvêşe, pêşenîkê bi ser anîyê de ber bi jêr û jor ve xelekî dike û bi serê lêvan diliklikîne. Ev zilam çima wilo kenê mirov bi xwe tîne? Dilbijokiyek di vir de heye. Mêr ji jinikê re pesnê mêranîya xwe dide, jinik jî ji mêrikê re pesnê kebanitiya xwe dide. Ne mêr mêr e, ne jinik xweşkebanî ye û herdu jî bi vê yekê dizanin. Çima ev mirov hevdu dixapînin? Di vir de jî dilbijokiyek heye û gelek tiştên veşartî tê de hene. Bi kurtî, hin weke Nars heyranên bejn û bala xwe ne. Ji ber mirêkê ranabin; di mirêkê re xwe berdidin deryaya eşqê, benîşt dicûn û bi civatê re dikevin şewetê. Hin heyranên deng û xebxeba qirika xwe ne ku seraqet bitewirînin û herkes li wan guhdar bike. Hin heyran in mêraniya xwe ne ku hertim mezin baxivin û mirov jî ji wan re li çepikan xîne. Hin heyranên ku bibin berdoşekçiyên xurtan; kurtêlan bixwin û ji wan re mitirbîyê bikin. Û hwd. Ev hemû kompleksên narsîzmê ne. Yanî nexweşî ne.

Mirov narsîstan çawa nas dike? Narsîst pir pozbilind û bi paye ne. Ji xwe razî, qurre û pivikî ne. Xerabe du celeb narsîst hene: Celebek xwe gamêş, derûdorên xwe mêş, xwe aqilmendên herî mezin û herkesî jî bêhiş û zarok, xwe ji Ûsif Pêximber sipehîtir, belê însên jî bi carekê ve gurî û gendelî dibînin. Dinyaya wan mij û xumamî dibe. Bêper di nav ewran de difirin, ji vir li dinyayê temaşe dikin û mirovan dinitirînin. Mirovan weke heywên û carnan jî heywên weke mirovan dibînin. Li camcamkan dixînin, dikwîtînin, lewitî xeber didin û gazî mirovan dikin. Mirovan weke pez dibînin. Celebek jî heye ku xwe weke kêzikan dibînin; li xwe dinerin û dibin heyranên xurtan. Gava ji xurtan re li çepikan dixin, wilo baweriyê pê tînin û lê dixînin. Pesnê wan bidin û bibin berdoşekçiyên wan. Bawer dikin ku wê bi wî awayî derkevin pêş, di civatê de bête qanê û cihê xwe bigrin. Psîkolog van mirovan hîn ji zarokiyê de digirin ber xwe; pêvajokên ku di xweşî û nexweşiyê de derbas kirin berûpalî hev dikin, vediçirînin, sedeman dibînin û mejî li hêwin dixînin. Li gor hin psîkologan, wê pir çewt ba gava mirov ji hindurê malê terbîyek rûniştî nesitendiba, bihata perçiqandin, bêderûdor û di nav tunebûyîne de mezin bûba û neba narsîst. Terbîya malê, derûdor, dibistan û abûrî însên difesilîne û qarakter didê. Narsîzm li ser esasê van hêmanan geş dibe û diçilmise. Narsîst dînen weke bîaqila ne.

Bêjeya zirnarsîst di psîkolojiyê de weke psîkoz narsîst derbas dibe. Ji ber ku ev bêje li kurdî bi vî awayî xweştir rûdinişt, min jê re zirnarsîst got. Bila zimanzanayên me bibexîşînin.

Serkêşê psîkologan Freud bi zirnarsîstan re dernakeve serî. Dîsa li gor wî, narsîstê ku hîn neketibû dewra alozê û şizofrenîk nebûbû, digel palûtek mezin mirov dikarîbû ew ber bi civakê de bikişanda û hinekî hedayet bikira. Lê belê mirov dê nikarîba bandor li ser mirovê zirnarsîst bikira. Ji ber ku her tişt di derbareyê narsîzma wî de li hev diqulipî û weke bûjen dinitirand. Ew textoriya te qebûl nake;

ji ber ku xwe textorê herî mezin dibîne. Gava tu şîretan lê dikî, ew bi şîretên te dikene; te weke dijmin û xwe jî şîretkirê herî mezin dibîne. Dema tu behsa heyvê jê re dikî, ew xwe raperî ser stêrikan dike. Wexta ku tu bi metodên îlmî diherî ser û jê re tiştan rave dikî, îcar durvên wan tiştan bi te dixîne û bûyerê vediçirîne. Yanî ger te qala dikî jê re kiribe, wî jî zû de xwe dikî, tu jî mîna mirîşkê dîtîye û ber bi te de hatiye. Di navbera keftûlept û ramanê wî de pîvan namîne, mejî dibe sergo û tiştan bi teşwikî dixurbilîne.

Narsîst dema ku di civakê de cih digrin û dibin xwedî hêz, îcar narsîzma wan digihê bandevê, dibin zirnarsîst. Ew mirovê ku xwe gamêş didît, di vê demê de tam dibe tirsonek. Mîna ku civakê bi carekê ve xwe lê kiriye yek helsegane dike, bi şik li herkesî dinere û di bin de dijminayî dibîne. Nefretê ji rexnan dike. Rexneyê, di qedexê de weke dilopên jahra li ber devê xwe dibîne ku vexwe wê pê bimre. Gotinên xwe dike qanûn. Jîr û zanayên civakê û hevalên nêzî xwe dijminên xwe yên herî mezin dibîne û wan dide kuştin. Ji tirsan nikare razê, kabûsan dibîne; digirî, dike hewar hewar û bi gezan dev li xwe dike. Piştî demekê, ew kes êdî ji heywên û zarokan jî ditirse. Zarokan di dinyaya xwe de dijminên raketî dibîne. Zarok sibe dikarin wî bikujin, loma jî zarokan dikuje. Heywan dikare pênekê lêxîne û bi vê pêne bimre. Lewra heywanan dikuje. Hîtler zirnarsîst bû. Seddam jî wilo. Seddam di zarokîya xwe de ji qantirê pênek xwaribû. Îcar roja ku Seddam dibe mîr û amîr, bi deh hezaran qantir, ker û hespên Berzaniyan dikuje. Li Sovyetê di salên 1938'an de, li derdora 15 milyon ker, hesp, qantir, ga û coneqa hatine kuştin. Hîtler jî bi milyonan heywan kuştin!.. Narsîzm dijminê her tiştî ye, nexweşîyeke bêderman e û îro vê nexweşiyê ji hemû nexweşîyan bêtir xwe daye pêş!..

# ŞÊX Û MELA

Mehdî Özsoy

Ey xalê mi, Xalê Hese!  
Şêx, melay ma geyren parse  
Fitr û zika xwi r' ken hîsse  
Çehergûm vazden cûyi\* dîy se.

Ey xalê mi, Xal Remezû!  
Qey ti ina mendî nezû?  
Şêx, melay ma geyren bizû  
Wenê kergû, mûnen kuzû.

Ey şêxê mino rilişte\*  
Ti ma r' kenê qûm û nuşte  
Tue Kird xwi r' kew yew helquşte\*  
Ti şew û ruc\* he y ser ruenişte.

Ey şêxê min feqşuelaqi\*  
Çi ben însû pey exlaqi  
Kirdi r' nî heyon nûn tueraqi  
Ti wen nîm leşê bueraqi.

Benû umnû qîjen mele  
Kird şin bajar ben 'emele  
Dewûn d' xelû, cewû kenû cele  
Şêx, melay ma ben qimul\*, mele.

Şêx, melay ma şinê dewû  
Wenê kergû, dîkû; şimin çayû, qehwû  
Çim ginen veywû\*, ciniyû  
Qirrik qurtne, liesen lewû.

Ti sera\* şin? Ti sera şin?  
Ti cezme\* kuwen, hewa ra şin  
Ti sey fuzû, teyara şin  
Tue Kird kew pird, ti ser ra şin.

---

\* **cezme:** cezbe

**cûyi:** cuwen, ciwen, ciwîn

**fekşuelaqi:** fekgilêjgin, fekmalêz

**helquşte:** Tirkî di "tahterevalli"

**qimul:** qumili

**rilişte:** keso ki riyê yê amewo liştîş

**ruec:** roj, roc, roze

**sera:** kura, kure, kotî, ça, komca

**veywi:** veyvi, vêwe

# KÛRT TALEBE HÊVÎ CEMİYETİ (KOMELEYA XWENDEKARÊN KURD HÊVÎ)

Zinar Soran



wendekarên Kurdan cara pêşîn di sala 1912-an de, bi navê "Kürt Talebe Hêvi Cemiyeti" (Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvi) komeleyek ava kirin. Ev komele li Stenbolê hatibû avakirin û bi kurtayî bi "Hêvî" dihate bi nav kirin. Di hinek çavkaniyan de, nav û tarîxa damezrandina vê komeleyê cihê hatiye nivîsandin. Li gor ku Bazil Nikitin û M. Emîn Zekî dinivîsînin, ev komele di sala 1910-an de hatiye damezrandin. Bazil Nikitin li ser nav û tarîxa damezrandina vê komeleyê weha dinivîse:

*"Tirkên Ciwan di sala 1909-an de, komele û dibistana Kurdî ya ku li Çemberlî[taş] dan girtin. Teva vê yekê jî, di sala 1910-an de grûbek xwendekar û huqûqnasên ku di komeleyeke nû ya bi navê Heviya Kurd de civiyabûn, dest bi weşana kovareke mehane ya bi navê Rojî Kurd kirin".<sup>1</sup>*

Zinar Silopî yek ji damezrenêrên "Kürt Talebe Hêvi Cemiyeti" bû. Ew li ser damezrandina vê komeleyê weha dinivîse:

*"Ez di sala 1911-an de ketibûm Dibistana Bilind a Ziraetê ya Halkaliyê. Bi hevalên xwendekarên Kurd yê li dibistanê ku eleqeyeke mezin nîşanî pîrsa neteweyî didan, peywendiyên me hebûn. Di wê demê de, memûrê muhasib yê dibistanê Xelîl Xeyalî Beg bi dîtî û rênîşandayîna xwe hestên me yê neteweyî xurttir dikir. Me bi hevalan re biryara damezrandina komeleyeke xwendekarên Kurd da. Piştî ku ez, Umer Cemîl Paşa, lawê mebûsê Wanê Teufîq Beg, Fuat Temo û Cerrahzade Zekiyê Diyarbekirî bi rojan di camiya dibistanê de civiyan û me bi navê "Hêvî" nîzamnemeya komeleyeke xwendekaran amade kir, me di sala 1912-an de, bi awakî resmî destûra pêwîst ji hukûmetê stend û damezrandina Hêvî yê îlan kir".<sup>2</sup>*

Di *"Beyanname Civata Feqîhê Hêvî Kurdan"* ya bi munasebeta vejîna "Hêvî" yê de ku di hejmara 21-an ya kovara *Jînê* de hatiye weşandin jî, tarîxa damezrandina "Hêvî", 1912 hatiye nivîsandin. Ango, ew tarîxa ku Zinar Silopî dide û ya ku di vê beyannameyê de hatiye nivîsandin, hevdu digrin. Ji ber vê yekê jî, em dikarin bibêjin ku tarîxa ku Bazil Nikitin û M. Emîn Zekî nivîsandine ne rast e.

Robert Olson dinivîse ku gava "Tirkên Ciwan" hêviya ku ji *"Kürt Terakki ve Teavün Cemiyeti"* dikirin nedîtin, ev komele di sala 1909-an de girtin. Di sala 1912-an de bi navê "Hêvî Kürt Cemiyeti" rêxistineke duyem hate damezrandin. Damezrandina rêxistineke duyem, îşareteke reqabet û cihêtiya nav Kurdên li Stenbolê bû. Hêvî, rêxistineke xwendekarên Kurd bû. Beşekî wan xendekaran jî dibistanên Hemîdîyan ku ji aliyê Sultan Evdilhemîd ve hatibûn avakirin, dihatin. Li gora ku Martin Van Bruinessen jî dinivîse, endamên *Hêvîyê*, *"zarokên mîr û begên bajarî yên ku bûbûn Osmanî bûn. Ew û gelek Tirkên Ciwan ji eynê tebeqeya civakî bûn. Neteweperweriya wan ya romantîk, dişibîya ya neteweperwerên Tirk..."*<sup>3</sup>

Heta ku kongreya "Hêvî" yê çêdibe, bi awakî muweqqet Umer Cemîl Paşa dikin sekreterê berpirsiyar. Ekrem Cemîl Paşa û Memduh Selîm Beg, ji destpêkê ve dibin endamê "Hêvî" yê û beşdarî xebata wê dibin. Herweha, gelek xwendekarên Kurd bi heyecan û daxwaziyek pir germ dibin endamê "Hêvî" yê û di demek kurt de hejmara endamên komeleyê gelekî zêde dibe. Zinar Silopî navên Kemal Fewzî, birayê wî Ziya Wehbî, Necmeddîn Huseyîn yê Kerkûkî, Babanzade Ezîz, Şefîqê Arwaşî, Hemzeyê Muksî, Teyîb Eliyê Xarpêtî, Evdilkerîmê Silêmanî, Asaf Bedirxan, Mistefa Reşatê Diyarbekirî, Dr. Mistefa Şewqiyê Mehabadî, Dr. Fûad û şa'ir Evdirrehîm Rehmiyê Hekarî weke çend endamên berbiçav yên vê komelê zikir dike.<sup>4</sup>

Lê Malmîsanij di derheqê endametiya Kemal Fewzî û xebatên wî yên di rêxistin, rojname û kovarên Kurdî yên wan salan de, ne emîn e û dudilî ye. Ew di vî warî de weha dinivîse:

*"Gava ku li helbestên Kemal Fewzî yên ku di pirtûkên wî de ne û em dê li jêr li ser rawestîna bête nêrîn, wê zahmet be ku mirov qebûl bike ku Kemal Fewzî di wê demê de di rêxistinên Kurdan de xebitîye, di kovarên Kurdî de nivîs nivîsandiye û heta di wan salan de xwediyê bawerî û zanestiyê neteweyî bûye. Ji ber ku di helbestên ku wî di eynê salan de û heta salên piştî wan salan de nivîsandiye de, bi tevayî bîr û baweriyê cihê di giraniyê de ye û di pirtûkên wî de carekê jî navê Kurd ya jî Kurdistanê derbas nabe. Li gor min, Kemal Fewzî ancax di dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem de şexsiyeta xwe ya siyasî û rastîn bi dest xistiye û di dema Mutarekeya Mondrosê, anga piştî 1918-an di rêxistinên Kurdan de bi awakî aktîf xebitîye, di rojname û kovarên Kurdî de nivîs nivîsandiye. Bi awakî zelale diyar dibe ku heta Şerê Cîhanê yê Yekem ew di bin tesîra îdeolojiya Osmanî, Tirk û Muslimaniyê ya ku di temenê zarokî û di dibistanên leşkerî yên Osmanî de di serê wî de hatibû xwendin û di dema karbidestiya Îttihad û Tereqqî de hatibû stewardin de bû."*<sup>5</sup>

Piştî ku "Hêvî" li Stenbolê tê damezrandin, nav û dengê wê li Kurdistanê zû belav dibe. Tîn û tesîrêk wê ya taybetî li ser xort û xwendekarên Kurdan çêdibe. Teyîb Elî hewl dide ku li bajarê Erziromê şûbeyeke "Hêvî" ava bike. Li wîlayetên din yê Kurdistanê jî xwendekarên Kurd entereseyek taybetî nîşan didin û peywendiyên bi navendiya "Hêvî"yê re datînin. Di sala 1913-an de jî, li Lozanê şûbeyeke "Hêvî"yê tê ava kirin. Li ser avakirina vî şaxî, Zinar Silopî weha dinivîse:

*"Piştî demekê ji bona xwendinê ez çûm Swîsreyê. Ji "Hêvî"yê bi dûr ketibûm. Di sala 1913-an de, li Lozanê bi hevalên Kurd Ekrem, birayê wî Şemseddîn Cemîl Paşa, Babanzade Recaî Nuzhet, Selîm Sabitê Dêrsimî me şûbeyeke Hêvîyê damezrand û razîbûna navendê girt. Armanca me, bi hevkarîya xwendekarên Kurd yê li welatên Ewropayê, belavkirina bîrûbawerîya neteweyî û bi Ewropîyan danasîna milletê me bû".<sup>6</sup>*

Dr. Celîlê Celîl li ser firehbûn û tesîra "Hêvî"yê ya di nava gel de, weha dinivîse:

*"Bizav û xebata Komela Hîwa ya di nava gel de, ji ya Komela Hevkarî û Pêşketin pirtir bi nav û deng bû. Beşê Erzurumê ku di dibistanek navendî de hatibû damezrandin, bizav, xebat û rewşekî wê ya pir eşkere û girîng hebû. Serokê wê beşê Teyîb Elî bû. Beşekî komelê jî, li derve li Lozanê hebû".<sup>7</sup>*

Armancên Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî di bendên duyem, sêyem û çarem yê destûra wê de, weha hatine diyar kirin:

"Bend 2: a) Xwendekarên Kurd bi hevdu bide naskirin û di nav wan de têkilî, biratî û yekitiyê pêk bîne. b) Ziman û edebiyata Kurdî bi awakî serûber bike kitêb û pêşve bibe. c) Di warê bicîkirina di dibistanan de, rêberîya xwendekarên Kurdên ku wê werin paytext bike. d) Alîkariya kesên ku rewşa wan ya aborî ne baş e bike da ku wan di dibistanên ku li gor wan in de, bidin xwendin. e) Bi kurtayî, wê ji bona pêşketin û pêşvebirina zanyarî û civakî ya Kurdan hewl bide.

"Bend 3: Ji bo vê armancê; wê li wîlayetan şûbeyan ava bike, kovarek bi kurdî û tirkî biweşîne; di warê bîrûbaweriyên cûrbecûr û bi taybetî ji bo dibistanên destpêkê pirtûkên ku xwedî agahdariyên bikêrhatî ne biweşîne; ders, gotûbêj, listikên tiyatroyê amade bike û bi metodên cûrbecûr û li hinek deran dibistanan veke.

"Bend 4: Armanca Komeleyê hew zanyarî û civakî ye û ji derveyî siyasetê ye".<sup>8</sup>

Di rastiya xwe de, "Hêvî" ne li gor benda çarem ku di destûra wê ya resmî de hatibû nivîsandin dimeşîya. "Hêvî" jî, weke hinek komeleyên Kurdan yê wê demê, ji siyasetê dûr neketiye; ji bo şiyarkirina neteweyî û geşkirina niştimanperwerîya Kurdî, gelek xebatên heja û bi rûmet kirine. Tevî ku "Hêvî" weke komeleyek xwendekarên Kurd û di pêşengîya xwendekarên ronakbîr yê Kurdan de hatibû avakirin jî, têkiliyên berpîrsiyarên wê, bi niştimanperwer û siyasetvanên Kurd yê wê demê yê bi nav û deng re gelekî xurt bûn. Weke ku tê zanîn, gelek ji wan xwendekaran bi xwe jî, ji malmezînan û feodalên Kurdan dihatin û giraniya siyasetvanên wê demê jî ji malmezînan û feodalên Kurdan pêk dihat.

## ROJÎ KURD, HETAWÎ KURD Û YEKBÛN

Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî ji bona şiyarkirina neteweyî û pêşdebirina kultura Kurdî dixebitî. Di 6-ê hezîrana 1913-an de "Hêvî" dest bi weşandina kovara "Rojî Kurd" dîke. Rojî Kurd kovareke mehanî bû û weke organa Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî bi kurdî û tirkî dihate weşandin. Midûr û perpirsiyarê vê kovarê Evdulkerîmê Silêmanî bû. Li gor agahdariyên ku Dr. Celîlê Celîl dide, sê hejmarên vê kovarê derketine. Hejmara duyem di 6-ê tîrmehê û hejmara sêyem jî, di 1-ê tebaxa 1913-an de derketiye. Lê li gor ku Dr. Kemal Mezher Ehmed dinivîse, hejmara çaran ya Rojî Kurd jî derketiye û ev hejmar di 30-ê tebaxa 1329 /1913-an de hatiye weşandin.<sup>9</sup> Cemal Xeznedar, sê hejmarên Roja Kurd di sala 1981-ê de ji nû ve li Bexdadê çap kiriye.

Tevî ku kovara Rojî Kurd ji aliyê komeleyeke xwendekaran ve dihate weşandin jî, gelek kesên siyasî û navdarên Kurdan weke Necmeddîn Kerkûkî, Salih Bedirxan û Evdilal Cewdet alîkariya derketina kovarê kirin. Ji name û pîroznameyên ku ji Kurdistanê hatine diyar dibe ku Rojî Kurd digihaşt nav Kurdistanê jî. Li gor ku V. Minorsky dinivîse, Rojî Kurd li cihên dûr weke Silêmaniyê jî dihate belavkirin. Rewşenbîrên Kurdan daxwaza belavkirina kovarê û geşkirina pirsê neteweyî dikirin.<sup>10</sup>

Armanca bingehî ya kovarê propogandaya rewşenbîrî, zanistî û şaristaniyê bû. Kovarê, bi awakî sergirtî li dijî dewletê jî nivîsiye û di warê pirsê neteweyî de rexne li siyaseta nîjadperest ya Tirkên Ciwan girtiye. Lê di kovarê de, bi awakî êşkere doza serxwebûna Kurdistanê nehatiye kirin. Ev, ji rewşa wê demê dihat. Di destpêkê de, meyla bîr û baweriyên berpirsiyarên kovarê, ber bi bîr û baweriyên Tirkên Ciwan ve diçû. Wan bawer dikirin ku wê Tirkên Ciwan soz û biryarên xwe yê di warê mafên neteweyî di bin nîrê dewleta Osmanî de bi cîh binin. Lê li bervajiyê vê, karbidestên dewletê tehemmulî xebatên weha kulturî û mutewazî dahî nedikirin. Xebatên komele û kovarê ji nêzik ve kontrol dikirin û zordariyeke mezin li ser berpirsiyar û nivîskarên wê dimeşandin. Ji ber nivîsên ku ne li gor dilê dewletê hatibûn weşandin, Rojî Kurd qedexê kirin û bi pê berpirsiyar û nivîskarên kovarê ketin. Loma jî, tenê çar hejmarên kovara Rojî Kurd hatin weşandin.

Di çirya pêşîn ya 1913-an de, Salih Bedirxan ji ber nivîseke xwe ya li dijî siyaseta dewletê hate girtin û hepskirin. Qanûna di warê weşanan de gelekî hişk bû û desthilatdariyek mezin dida destên karbidestên herêmî. Li gor vê qanûnê, eger karbidestên mehelli ya walî, di rojnameyekê ya jî kovarekê de nivîsekê li dijî dewletê bibînin, dikarin hem sernivîskar, hem jî xwediyê nivîsê bigrin û çapxanê bidin girtin.<sup>11</sup>

Kovara Rojî Kurd giraniyek taybetî dida ser pirsên zanistî, rewşenbîrî û şaristaniyê. Di kovarê de rewşa civata Kurd ya wê demê jî, weha hatiye diyarkirin:

*"Divê Kurd îtiraf bikin ku ew çawa ji şaristaniyê dûr in, herwisa ji zanistî û*



*rewşenbîriyê jî dûr in*". Hinek nivîskarên kovarê jî li ser vê rewşê rawestiyane û pêwîstiya xwendin û zanistiyê weha diyar kirine: *"Berî her tiştî Kurd dizanin ku xwendekarî di nav wan de pirr kêr e û bi vî tiştî hisyane. Ji ber vê, dizanin ku pêwîstiya wan bi zanistî û xwendinê heye. Pêngava yekem a riya şoreşgerên Kurdan xwendewarî ye. Niha şefeqa hêviyê avêtîye. Em dikarin bi dil û giyan bêjin, zordarî hêdî hêdî namîne. Di nav Kurdan de, me du meş'ale hilkiyîye, an jî me du riyên hişyarkirinê çêkiriye: Hêvî û Rojî Kurd".*<sup>12</sup>

Evdilah Cewdet yek ji wan nivîskaran e ku di kovara Rojî Kurd de li ser rewşa civakî, siyasî û neteweyî ya Kurdan nivîsiye. Wî di nivîsa xwe ya bi navê *"Bir Hitab"* (Xîtabek) de, nivîsiye ku Kurd di qonaxa avabûna neteweyê de ne. Neteweyekî ku ne xwediyê şexsiyeta xwe be, ji birek heywanên bêhiş û nexwende pêve nabe tişteki din. Netewe ne dîrokeke monoton û sekinî ye. Ew ji nebatekî di bexçê me de, darekî di çiyana de ku pelên xwe bi aliyê hejandina bayê de xwar dike pêve ne tişteki din e. Sedsala ku em tê de dijîn ne henek e, sedsala 20-an e. Neteweyekî ku ne xwediyê mejî û pêşeroja dîroka xwe be, ne xwediyê xwe ye. Netewe û kesên ku ne xwediyê xwe bin, wê kole bin, malê kesên din bin.

Evdilah Cewdet bi vî awayî xwestiye ku pirsra neteweyî, pêvajoya ku neteweyê Kurd tê de derbas dibe, girîngiya xwedîderketina li netewetiya xwe û tehlûkêyen li pêşiya neteweyê Kurd raxe ber çavên ciwan û xwendekarên Kurdan. Herweha wî xwestiye ku armanc û daxwazên Kurdan yên di warê pirsra neteweyî de zelal bibin. Wî nivîsiye ku divê em bizanibin bê em çi dixwazin. Em dixwazin serbest û azad bin, ya jî di bin siya Împeratoriya Osmanî de bijîn? Eger em naxwazin di çarçeweya Împeratoriya Osmanî de bimînin û bi çi awayî dibe bila bibe em bighêjin vê armanca xwe, divê em xwendewariyê û şaristaniyê di nav neteweyê Kurd de belav bikin.<sup>13</sup>

Li gor ku Celîlê Celîl dinivîse, Evdilah Cewdet bi awakî objektîf li ser rewşa siyasî, civakî, aborî û sedemên paşdemayina neteweyê Kurd nivîsiye. Bi dijarî welatparêz û têkoşerên Kurdan rexne kirine ku ew ji Kurdistanê dûr in, li Stenbolê li ser navê neteweyê Kurd dipeyivin, bi devkî xebatê dikin û ji bona ku neçin Kurdistanê nexebitin, xwe li van deran vedişêrin. *"Wir deşt e, pir warên gul û çiçekan ku bûne goristan û di wan zeviyên bi xêr û bereket de ku birçîtî û feqîriya xwediyê wan tê de heye". "Tenê bi hêvî û ramana baş serbestî bi destên Kurdan nakeve. Riya rastî û çareserkirin, tenê vegerîna nav netewe, nav Kurdistan e". "Axaftin, munaqêşe û destgîrêdana li vir, li Stenbul, bê mane ye. Qet feydekê nagihijîne wan gundan ji bo nanê paxaç, şîrvexwarin, gundî hişyarkirin û handana ber bi şaristaniyê. Belê, eva ye wezîfa li ser milên ciwanên Kurd".*<sup>14</sup>

Evdilah Cewdet ev nêrînen xwe di kovara "Hetawî Kurd" de jî nivîsandine. Ev nêrînen wî yên ku li ser pêwîstiya çûna Kurdistanê, bûne mijarê gotûbêjeke di nav wî û Mewlânzade Rifat de. Evdilah Cewdet, di hejmara yekem ya kovara "Hetawî Kurd" de, bisernivîsa *"Hetawî Kürd Gazetesi Yazarlarına"* (Ji Nivîskarên Rojnameya

Hetawî Kurd re) weha nivîse:

”Bê guman ji bo xizmeta Kurd û Kurdayetiye hûn xûdan û hubrê dirijînin. Lê rojname ji bo neteweyên ku xwendin û nivîsandina wan hene tê derxistin. Lê mixabin, ez bawer im ku hejmara Kurdên xwendin û nivîsandina wan heye bi tilîyan tê hijmartin. Bêguman hûn dixwazin ku Kurdan weke qewmekî medenî, ronakbîr û guhertî bibînin. Bêşik her kesê xelkekî ku parêzgarîya Împeratoriya Osmanî yanî quwet û qudreta wê dixwaze, divê hurmetgirtin û ronahîkirina xelkê xwe bixwaze... Divê bismillaha şerefa neteweyî û tevgera wî, bazdana ber bi Anadoluyê be. Şik tune ye ku ji çengbetilandin û qelem çerixandina li vir, li Stenbolê tiştek dernakeve.

*Ber bi gundan! Ber bi gundan! Divê bi 'ezm û mêrxasiyek bêkêmanî, xwarina nanê garisî, vexwarina şîrê bizinan û xwedîkirina gundiyan bi nûr û medeniyetê bête xwestin”<sup>15</sup>*

Mewlanzade Rifat, di warê şandina xortan ya ”Anadolu”yê de weke Evdilah Cewdet nafikire. Li gor wî, ji ber ku armanceke zelal tune ye, ev daxwaz û pêşneyara Evdilah Cewdet bêwext û zû ye. Gava armanceke zelal tunebe, wê çûna ciwanan hewldaneke vala û bêber bimîne. Ji ber vê yekê jî, divê pêşî mirov giraniyê bide ser pêşketina zimanê Kurdî û şiyarkirina Kurdan. Ew, di hejmara duduyan ya kovara Hetawî Kurd de, bi sernivîsa *”Ji Berêz Avakarên Rojnameya Hetawî Kurd re”* nêrînên xwe yê li ser pirsê Kurdî û nêrînên Evdilah Cewdet weha dinivîse:

”Hetawî Kurd hewl dide ku wezîfeyê gelek bilind û pîroz pêk bîne. Ji bona ku Kurdên reben, vê girseya şeş heft milyon merivan ji jibîrkirinê xelas bike, hewl dide. Ji ber vê yekê, li ser navê Kurdan, ez pîrozkirina berpîrsiyarên wê wezîfeyê dibînim.

Di vê navbeynê de, di warê başkirina Wîlayetên Rojhilatê de, hewldan û tevgerên ciddî tînin hîskirin. Hevnişadên me Ermenî li hebûnê digerin. Divê em van hevnişadên xwe bizanibin û wan ji nêzîk ve taqîb bikin...

...Wezîfeya ku niha dikeve ser milên me Kurdan ev e ku em bi xwe li çara serê xwe bigerin. Bê guman, tu Kurdek naxwaze ku nijada wî bimre, di nav merivatiyê de vemire, ji aliyê hemnişadê xwe ve bê daqurtandin. Ji ber vê yekê, divê her Kurd bi hevoka 'Em bi xwe li çareya serê xwe binêrin' re bin.

*Şiyarkirina Kurdan, nasîndina hebûna wan û mafên wan yê jiyanê, birêxistina pêşketinê bi çi ve girêdayî ye? Ez, ne bi nêrînên berêz Dr. Evdilah Cewdet re me: Gava li wê derê armanceke berbiçav tunebe, şandina ciwanên Kurdan ber bi Anadoliyê ne pêwîst e, wê bêber û vala bimîne. Ev pêşneyar gelekî zû ye. Ji bona şiyarkirina Kurdan, nasandina hebûn û mafên wan yê jiyanê, birêxistina pêşketinê, pêşî ziman pêwîst e. Ji bo başkirin û bigiştîkirina zimên ku bi awakî rêk û pêk ji armancê re xizmet bike jî, nivîsandin pêwîst e. Ji bo ku zimanê Kurdî baş bê nivîsîn, hînkirin û hînbûna wî hêsan bibe, divê herfên me yê kevî, yanî herfên Urdu [Urartu] bînin vejandin û başkirin. Bi herfên ku îro em bi kar tînin, em nikarin zimanê xwe bikin zimanekî*

*nivîskî. Ji ber vê yekê jî taqîbkirina armanca me dijuar û bêber e. Eger em bikaribin tîpên xwe yên kevn vejînin û tekûz bikin, bi wan herfan ji gewmê xwe yê ku di rewşa prîmîtîf de ye re li gor metodê nû pirtûkên xwendin û gramerê û ferhengekê diyari bikin, wê pêşiya armanca me vebe. Pêkanîna van esasan, divê ne bi qasî ku tê bawer kirin zahmet be. Hemd [ji Xwedê] re ku iro di nav Kurdan de gelek kesên zana, xwedîfêzîlet û zimanzanayên me hene. Divê ew bêne civandin û encûmeneke zanistiyê pêk bê. Xebat gerek ji gotinê bi hêztir be. Ez hêvîdar im ku mutesebbîsên Hetawî Kurd vê wezîfeya neteweyî ji xwe re bikin armanc. Damezrandina vê sazûmena zanistiyê li Stenbolê wê bêtir kêrhatî û bi eqlê be. Di vî warî de, ez dikarim hemnîjadên me Ermeniyana weke nimûne nîşan bidim. Gava wan pêwîstiya şoreşa neteweyî û civakî his kirin, ciwanên xwe yên ronakbîr li gundan, li Anadoluyê belav nekirin. Pêşî zanayê wan li bajarekî Ewropayê civiyan. Li ser tiştên ku wê bikin fikirîn, biryar dan û dûre ji bona belavkirina armancên ku wan li ser biryar girtibûn, lezandin hatin navçeya me. Em ji weha bikin. Pêşî, em armancên xwe bidin civandin û bi awakî baş amade bikin. Em amade bikin û dûre herin Kurdîstanê”<sup>16</sup>*

Di kovara Rojî Kurd de, Dr. Evdilah Cewdet li ser pirsgerêkên alfabeya Kurdî jî rawestiyaye. Wî nivîsiye ku alfabeya Erebi têrî zimanê Kurdî nake; divê Kurd alfabeya xwe biguherin û bi herfên Latîni binivîsin. Ji derveyî Evdilah Cewdet, hinek nivîskarên din jî li ser pîrsa alfabeyê rawestiyane û dane diyarkirin ku alfabeya Erebi têrî zimanê Kurdî nake. Mesûdê Silêmaniyê yek ji wan kesan bû. Endamekî Hêvîyê, memûrê posteya Stenbolê Faîz Begê Diyarbekirî jî hewl dida û dixwast bide nîşandan ku alfabeya Latîni bêtir li zimanê Kurdî tê. M. S. Ezîzî [Salih Bedirxan] jî, ji bona guherandin û birêkûpêkkirina alfabeya Kurdî programekê pêşniyar dike. Ev pêşniyar, jibona çekirina alfabeya Kurdî û rastnivîsandina Kurdî bal kişandiyê. Alfabeya ku Salih Bedirxan pêşniyar dikir, li ser bingehê alfaba Erebi hatibû ava kirin. Wî dixwast ku heşt herfên din li alfabeyê zêde bibin û bikevin ser herfên bêdeng. Lê pêşniyara Salih Bedirxan, di warê xebatê de hêsan nedihate dîtin. Salih Bedirxan doz li Kurdan dikir ku ew li ser meseleya alfabeyê rawestin, têkiliyê bi hevdu re deynin. Herweha wî ji Rojî Kurd daxwaz dikir ku kovar jibona çareserkirina vê pirsgerêkê quncikeke taybetî veke.<sup>17</sup>

Ji van nivîsan diyar dibe ku rewşenbîr, welatparêz û siyasethavên Kurdan, di wê demê de ji programeke siyasî û civakî pêpar bûn. Wan giranî dane ser meseleyên xwendin û zanistiyê. Lê hewldanên ku di vî warî de hatine kirin jî, bi Kurdên Stenbolê ve sînor kirî mane.

Ji ber siyaseta nîjadperest ya ”Tirkên Ciwan”, kovara Rojî Kurd nebûye xwediyê jiyaneke dirêj û ji aliyê hukûmetê ve hatiye girtin. Piştî girtina Rojî Kurd, vê carê Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî dest bi weşandina ”Hetawî Kurd” kiriye. Hejmara yekem ya Hetawî Kurd di 23-ê çiriya pêşîn ya 1913-yan de hatiye weşandin. Di derheqê Rojî Kurd û Hetawî Kurd de, Zinar Silopî weha dinivîse:

”Armanc û hewldana Roja Kurd ew bû ku bi pêşvebirina kultura Kurdî, zimanê

Kurdî di nava Kurdan de bîne rewşa xwendin û nivîsandinê. Beriya Îslamiyetê edebiyateke dewlemend ya Kurdan hebû. Kurdan piştî Îslamiyetê û nemaze di dema sultanên Osmanî de, ji ber bawerîya bi sêdaqet ya bi xelîfetiye, taybetiyên xwe îhmal kirine, weke zimanê nivîskî dev ji nivîsandina Kurdî ku zimanekî dewlemend yê edebiyatê bû berdane. Tevî vê yekê jî bi zaravên Soranî û Kurmancî gelek berhemên hêja hatine afirandin. Edîbên mezin weke Feqîyê Teyran, Mela Ehmedê Cizîrî, Mela Ehmedê Xanî dîwanên hêja nivîsandine. Bi zaravê Soranî jî şairên mezin gelek berhemên giranbiha afirandine...

*...Piştî ku kovara Rojî Kurd ji aliyê hukûmetê ve hate qedexekirin, di berpirsiyartiya Hemze Begê Muksî de kovara Hetawî Kurd dest bi weşanê kir. Di wan kovaran de, xortên Kurdan bi germî nivîsên hêja dinivîsandin. Bi taybetî nivîsên edebî yên şair Evdirehîm Begê Hekarî, ji aliyê her kesî ve dihatin pesinandin...*

*...Hetawî Kurd û Komeleya Hêvîyê heta îlankirina seferberliga 1914-an çalaki û weşana xwe domandine. Ji ber ku bi îlankirina şer, pîrrianiya endamên Hêvîyê di çarçeweya seferberligê û xizmeta leşkerî de kirin leşker, mercên weşandina kovarê nemabûn".<sup>18</sup>*

Komeleya Hêvîyê ji derveyî van herdu kovaran, di sala 1913-an de bi navê "Yekbûn"ê kovarek derxistiye. Ev kovar jî bi Kurdî û Tirkî hatiye weşandin. Musa Anter di nivîseke xwe de dide diyarkirin ku hejmarên 2 û 3-yan yên Yekbûnê li cem wî hene û ji hejmara 3-yan ya Yekbûnê van agahdariyan dide:

"Li ser rûpela pêşîn a rojnama Yekbûnê, bi herfên xweşik em nivîsa 'Yekbûn'ê dibînin. Hejmara 3. çar rûpel e û bi Kurdî-Tirkî ye. Abonetiya salê 35 quruş, abonetiya mehê 20 quruş, nusxeyek wê 10 pere ye. Di hefteyekê de du caran derdikeve, têkilî siyasetê nabe. Mudirê mesûl Îbrahîm Kurdî ye. Armanca vê rojnamê: Di nav koma civata Osmanîyan de danasîna Kurdan û bilindkirina qedr û qiymeta wan e.

Sergotara wê, bi îmza Muncî Kurdî xîtabî xortan dike. Nivîskar di vê nivîsa xwe de hin şîretan li xortan dike. Em li vê derê ji wê nivîsê bi kurtî çend pasajan bi zimanê îroyîn pêşkêş dikin:

1- Ji ber ku di nav Kurdan de hejmara xwendeyan gelek kême, divê elfabeke hêsan bête çêkirin.

2- Divê ku xort nekevin nav îhtirasa siyasî.

3- Divê ku xort, xizmeta ji bo milletê wek şerefa herî bilind bizanin.

*Yekbûn, şî'r, gotar, fiqre, gotinên pêşiyên û bi nivîsên din ve xemilandî ye...".<sup>19</sup>*

Em vê gavê nizanin ku bê çend hejmarên Yekbûnê hatine weşandin. Lê ji agahdariyên ku hene tê zanîn ku hejmara 2-an di 19-ê îlona 1329 /1913-yan, hejmara 3-yan jî di 30-ê îlona 1329 /1913-an derketiye.

Li gor agahdariyên ku Zinar Silopî dide, Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî ji destpêka avabûna xwe heta îlankirina Şerê Cihanê, her sal bi awakî rêk û pêk kongreyên xwe civandine, komîteya birêvebir hilbijartîye û ji bona xebatên

pêşerojê biryar girtiye. Piraniya mesrefên ji bo birêvebirin û weşanê bi riya Seyîd Evdilqadir ji xebatkarên Kurdan yê li Stenbolê dihatin temînkirin. Hêvîyê ji ber tengbûna cih, navenda komeleyê neqlî cihekî li hemberî Otêla Meserretê kiriye.

Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî, di sala 1913-yan de bi munasebeta salvegera damezrandina xwe û bi teşwîqa Şukrî Mehmed Beg, li Şehzadebaşi cihekî mezin kirê dike û li wê derê kongreya xwe çêdike. Mebûsê Diyarbekirê Pirinççizade Fewzî Beg, Pirinççizade Zulfî Beg, Dr. Şukrî Mehmed Beg jî beşdarî vê kongreyê dibin. Sekreterê giştî yê Hêvîyê Memduh Selîm Beg di axftina xwe de, gîlî û gazinan ji mezinan dike ku ew di warê pirsra neteweyî de hessasiyeteke pêwîst nîşan nadin. Kemal Fewzî Beg bi axaftineke dirêj û germ piştgiriya axaftina Memduh Selîm Beg dike. Ziya Wehbî Beg jî, ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî qesîdeyekê li ser pesnê Kurdan dixwîne. Mebûsê Diyarbekirê Fewzî Beg li dijî gotinên Memduh Selîm Beg derdikeve û dide diyarkirin ku divê ciwanên Kurdan bi siyasetê mijûl nebin, bi dersên xwe mijûl bibin. Fewzî Beg qesîdeya Ehmedê Xanî ya ku li ser pesnê Kurdan xwendibû jî li gor nêrînên xwe şîrove dike û dibêje ku ev nayê maneya daxwaza serxwebûna Kurdistanê. Li ser van gotinên Fewzî Beg, Dr. Şukrî Mehmed Beg îtiraz dike û dide diyarkirin ku mezin di warê pirsra neteweyî de xemsar dimînin. Ji ber vê xemsariya mezinan jî ciwanên Kurdan neçar mane ku bi siyasetê mijûl bibin. Xelîl Ramî Beg û Şefîq Efendiyê Arwasî jî piştgiriya peyvên Dr. Şukrî Mehmed dikin. Loma jî Fewzî Beg bi awakî xeyidî civînê diterikîne.

Piştî vê bûyerê, hukûmet bi îddiaya ku Hêvî ne li gor qanûnê hatiye damezrandin endamên komîteya birêvebir dide mahkemeyê. Di dema ku vê dawê dewam dikir, seferberlik hate îlan kirin. Hukûmetê endamên komîteya birêvebir jî bi vê wesîleyê şandin eskeriyê û bi vî awayî ev dawê jî ji ber xwe ve ket. Ji ber van hoy û sedeman, berpirsiyarên Hêvî biryar girtin ku bi awakî muweqqet xebat û çalakiyên Hêvîyê rawestînin. Ji xwe karbidestên dewleta Osmanî ji destpêka damezrandina Hêvîyê bi kerb û dijminayî li Hêvîyê mêze dikirin. Zalimê bi nav û deng Cemal Paşa çend caran zordarî li endam û berpirsiyarên Hêvîyê kiribû û sekreterê berpirsiyar Umer Cemîl Paşa xistibû zîndana "Bölüka Bekirağa" yê.<sup>20</sup>

Di 17-ê çeleya pêşîn ya 1912-an de, sekreterê giştî yê "Kürdistan Teşrik-i Mesai Cemiyeti" Evdilah Sadiyê Paloyî ji "Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî" re nameyekê dişîne û di vê nameya xwe de pêşniyara yekitiya herdu komeleyan dike:

*"Ji ber vatiniyên ku komeleya me ji xwe re wek armanc hilbijartiye û hewldanên pîroz yê ku Hêvîya me ya muhterem dixwaze pêkbîne, hevdu digrin; li gor prensîba ku (piçûk bi mezinan ve girêdayî ye) û di demek weha nazik û girîng de, eger daxwazî û armanc cihê bin jî, ji bo gihastina armancên ku hatine tesbît kirin, pêwîstiya bi hevdu re, bi xûn û yekitiyê, bi navendek meşrû û hevbeş heye."*<sup>21</sup>

Li gor ku Nesîmî Fıratlı dinivîse, li ser vê pêşniyarê herdu komele dibin yek û di sala 1328/1912-an de, bi navê "Kürt İrşad ve İrtika Cemiyeti" (Komeleya Rênişandan û Bilindkirinê ya Kurd) komeleyeke nû ava dikin.<sup>22</sup> Lê di gelek

çavkaniyên ku behsa Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî û kovarên ku ji aliyê "Hêvî" de hatine weşandin dikin de, tenê navê "Hêvî" derbas dibe. Di van agahdariyan de nehatiye nivîsandin ku ev herdu komele bûne yek. Herweha, em ji agahdariyên ku hene dizanin ku "Hêvî" xebat û çalakîyên xwe heta îlankirina seferberliga 1914-an domandine û piştî Şerê Cîhanê yê Yekem ji nû ve dest bi xebata xwe kiriye.

## VEJÎNA KOMELEYA XWENDEKARÊN KURD HÊVÎ

Karbidestên dewleta Osmanî ji destpêkê de zilm û zordarî li ser berpirsiyar û endamên Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî kêm nedikirin. Piştî îlankirina seferberliga 1914-an jî, piraniya berpirsiyar û endamên "Hêvî" şandine leşkeriyê. Bi vî awayî, hem pêşî li ber xebat û çalakîyên "Hêvî" girtine û hem jî gelek ciwan û xwendekarên Kurd di vî şerê qirêj de telef kirine. Memduh Selîm Beg li ser wê demê û rewşê, di nivîsa xwe ya bi navê "İki Eser-i Mebrur" ku bi munasebeta damezrandina "Kürd Kadınları Teali Cemiyeti" (Komeleya Bilindkirina Jinên Kurd) û vejîna Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvîyê, di kovara Jînê de weşandiye de, weha dinivîse:

*"Hêvîya ku bi xebatên xwe yê sê salan di cîhana Kurdîtiyê de hêvî û baweriyên mezin pêk anîbûn, di şerekî ku ji aliyê hukûmetekê felaket bela dikir û felaket dicivand de hatibû derxistin de, gelek endamên xwe yê di çapa dinyê de hêja wenda kir. Berî çar sal û nîvan, gava ku hemû pehlewaniyên ciwan û mejiyên ciwan ji bona şandina nava êgir li Meydana Harbokuluyê hatin civandin, bi sedan mejiyên ku li Stenbolê 'Hêvî' didan jiyandin jî li wê meydanê li hember zincîrên milîtarîzma bêhay û bibîrs, serî tewandin. 'Hêvî' di himbêza du ciwanan de emanetî Xwedê bû. Rojek hat ku 'Hêvî' weke hêviyeke ronak ya pêşerojê, tenê di dilan de jiya".<sup>23</sup>*

Vê bûyerê li ser jiyana "Hêvî"yê tesîreke gelek negatîf kiriye û valayîyeke dirêj xistiye jiyana xebat û çalakîyên wê. Piştî wî şerê kolonyalîst û gemarî, di destpêka havîna 1919-an de, "Hêvî" bi destên kadirên nû ve, dîsa dest bi xebata xwe ya komeletî dîke. Em vê mizgînê, ji nivîsa Memduh Selîm Beg ya ku me navê wê li jor nivîsandibû dibihîzin. Ew nivîs, di 26-ê gulana 1919-an de hatiye nivîsandin. Piştî wê agahdariyê, "Beyanname Civata Feqîhê Kurdan" ya Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî, di hejmarê 21-ê ya kovara Jînê de hatiye belavkirin. Beyannameya bi Tirkî ya "Hêvî" jî di hejmarên 21 û 22 yê kovara Jînê de hate weşandin. Belavoka bi Kurdî, ji ya Tirkî kintir e. Di belavoka Tirkî de, pêşî behsa damezrandina "Hêvî"yê, xebat û çalakîyên wê yê berê û zilm û zordariya ku endamên wê dîtiye, hatiye kirin. Bi dûre jî hatiye diyarkirin ku wê "Hêvî" xebat û hêza xwe ya bingehîn bide ser ziman, edebiyat, berhevkirina berhemên edebî, bûyerên dîrokî û heta mumkun be di demeke kin de zimanê Kurdî bike zimanê nivîsandin û xwendinê. Ji bo wan xebetana jî, li gor bendên destûra komeleyê wê "Tamim-i Maarif Heyeti"

pêk bîne, şûbeyên komeleyê li her derê Kurdistanê ava bike û ji bo hînbûna medeniyeta hemdemî wê endamên xwe bişîne Ewropayê. Ez "Beyannama Civata Feqîhê Kurdan" ya bi Kurdî jî weke orîjînalê wê li jêr dinivîsim:

## BEYANNAMA CIVATA FEQÎHÊ HÊVÎ KURDAN

Va civat, sala 328 [1912]de ji aliyê lepek feqîhê Kurdan vebû. Berî me, yê ku di nav civatê de xebitîn wan gelek şixul dîtîn. Li wî zemanî de çavê Kurdistanê li vira bû. Çi çare kî Şerê Mezin hat; hinek ciwanê Kurdan çûn seferê, hinek bela bûn. Îttîhadçiyê xêrnexwazyan civat bela kirin. Îro ji me zarûyê Kurda lazim e ku wê civata mibarek di nuh da bijînin.

Îşte bi hîmmeta heval û feqîhê Kurdan, me dîsa ji nuh da rakir. Em hêvî dikin kî dîsa bi hîmmeta hemû Kurdan ew civata yê dewam bike. Meqseda me wekî berê ye:

Feqîhê Kurdan li hevdin naskirin din, ji bêxwedîya ra yardim bikin, edebîyat û tarîxê Kurdan qeyd û berhev bikin, sin'et, zîraet û tîcaretê wan pêşda bibin. Liboy vê şixulê "Civata Ta'mîm û Neşrê Mearif" vekir. Me va şixula mezin û bixêr li ser ustîyê xwe girtîye.

Elbet ku hemû Kurdan bi çavê rindîyê li me mêze kin, em dixwazin ku her şehr û qesebê de şu'be vekin. Gişk zanin ku sebeba halê me yê hazir ji nezaniya me yî. Weqtê şûr derbaz bû. Nuka çaxa qelem û zanîn e.

Şixula "Hêvî" bi civatê dina tune. Sîyaset ji wê dûr e. Mezin û maqûlê mena bira bi wî şixulê sîyasetê da bixebitin. Meqseda me mileta Kurdan, wetena Kurdan, îlm û îrfana Kurdan bilind bikin.

Her millet li bin destê miletekî din da demekê dirêj dimîne, zulm dibîne, esîr dibe, malê xwe, heya canê xwe winda dike. Feqet qet'iyen mehû nabe, ji ortê ranabe. Eger tarîx, edebîyat, zivanê xwe, ewladê xwe veşartibe se, kînga weqt'î bê ew'ê dîsa hurriyet û serbestîya xwe bigire. Mîsal dixwazin? îşte Lehistan, îran, Bulgar, Yunan, File, Ereb...îlx.

Vana her yek sed, du sed sal...îlx. li bin desta man. Feqet mewcûdîyeta mileta xwe winda nekirin. Îşte îro roj, li dinyayê miletê hakim jî ew in.

Elhemdulîllah, em jî xwedîyê zivan û edebîyatekê fire, tarîxekê kevn, nufûsekê pirr, welatekî mezin wekî cinet in. Erdê kesekî qwasê ya me tunîne. Ji qurûnê ûlayî heya nuka zivan û adeta xwe winda nekir. Li bin dest û zulmê xelkê da mewcûdîyeta xwe veşart. Dêmek ku her tiştê me heyî. Dil dixwazê ku em hişê xwe berhev kin serê xwe, doralîyê xwe mêze kin.

Ah, tiştêkî me tune ku vava pirr mezin e, ji me ra pirr felaketek gir e. Ew jî îttîhad û îttîfaqa me ye! Vîya bîr mekin ku, eger em mehûbûna xwe naxwazin, gelî biran berhev bin ser hev, şerê bêmane û bêsebeb berdin. Ji nîfaq û şîqaqa me xelkê cîranê me îstîfade dikin. Lazim jiboy me ku em hişyar bin. Necata me li îttîhad û

li îtrîfaqê ye. Îşte meqseda "Civata Hêvî" yek jî, vê îtrîfaq û wehdetê temîn bike. Welhasil, vîya bizanin ku, xewa ku em tê da sersem, bêhiş manin, eger em ji wê ranebin, çavê xwe venekin se -Xwedê sitar bike- dawî mirina kûr e. Mezinê mena gotine:

*Ez bi te, tu bi bi min; em her du bi Xwedê.*<sup>24</sup>

Di 27-ê tîrmeha 1919-an de, Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî heştaliya damezrandina xwe pîroz dike. Bi vê munasebetê merasimek taybetî çêdike. Di vê merasimê de, gelek ciwan û xwendekarên Kurd û nûnerên avayiyên Kurdan beşdar dibin. Li ser navê xwendekarên Kurdan, Tewfîq Hamîd Begê Diyarbekirî dipeyive. Ew di vê axaftina xwe de, bi kurtayî li ser pêvajoya ku "Hêvî" tê de derbasbûye, xebat û çalakîyên ku kiriye û di tevgera Kurdistanê de rola ciwanên Kurdan radiweste.<sup>25</sup>

Waha xuya dibe ku "Hêvî" bi hêviyeke nû dest bi xebata xwe kiriye. Li gor ku Celîlê Celîl dinivise, di dema seferberligê de, gava "Hêvî" neçar dimîne ku xebata xwe bide sekinandin, arşîva xwe teslîmî Evdîlezîz Baban dike. Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, komele di serokatiya Asaf Bedîrxan de dîsa dest bi xebata xwe dike. Di vê demê de, komele di warê weşanên Kurdî de jî xebateke gelek hêja dike. Di sala 1922-an de, ji ber siyaseta Mustafa Kemal Atatürk, Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî hatiye qedexekirin.<sup>26</sup>

---

<sup>1</sup> Bazil Nikitin, Kürtler, Özgürlük Yolu Yayınları, Stenbol, tîrmeh 1986, r. 344.  
Binêre: M. Emîn Zekî, Kürdistan Tarihi, Komal Basım Yayım Dağıtım, Stenbol, 1977, r. 179.

<sup>2</sup> Zinar Silopî, Doza Kurdistan, Öz-Ge Yayınları, Ankara, 1991, r. 34.

<sup>3</sup> Yê ku ji Martin van Bruinessen, Agha Shaikh and State, r. 291-293 neqil dike: Robert Olson, Kürt Milliyetçiliğinin Kaynakları ve Şeyh Said İsyanı 1880-1925, Özge Yayınları, Ankara, çiriya paşîn 1992, r. 38.

<sup>4</sup> Binêre: Zinar Silopî, berhema navê wê derbas dibe (b.n.d.), r. 34- 35

<sup>5</sup> Malmîsanîj, Bitlisli Kemal Fevzî ve Kürt Örgütleri İçindeki Yeri, Fırat Yayınları, çapa duyem, Stenbol, ilona 1993, r. 17

<sup>6</sup> Zinar Silopî, b.n.d., r. 35

<sup>7</sup> Dr. Celîlê Celîl, Jiyana Rewşenbîrî û Siyasî ya Kurdan, wergêr: Elîşêr, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, çiriya paşîn 1985, r. 92.



<sup>8</sup> Nesimi Fıratlı, "Resmî İdeolojinin Sunduğu Gerçekler Kürt Ulusal Demokratik Hareketleri", kovara Deng, hejmar: 12, Stenbol, tebax 1991, r. 33.

<sup>9</sup> Ji bo vê behsê binere: Dr. Celîlê Celîl, b.n.d., r. 94.

Malmîsanij- Mahmûd Lewendî, Li Kurdîstana Bakur û Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdî, Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1989, r. 53-57.

Malmîsanij bi xwe jî dibêje ku min hejmara çaran ya vê kovarê dîtiye.

<sup>10</sup> Yê ku ji V. F. Minorsky, Kurd, r. 18-an neqil dîke: Celîlê Celîl, b.n.d., r. 96

<sup>11</sup> Ji bo vê behsê binere: Celîlê Celîl, b.n.d., r. 96- 97

<sup>12</sup> Yê ku ji Rojî Kurd, hejmar: 1, 1913, r. 2-yan neqil dîke: Celîlê Celîl, b.n.d., r. 99.

<sup>13</sup> Ji bo vê behsê binere: Celîlê Celîl, b.n.d., r. 100-101.

<sup>14</sup> Yê ku ji Jamanak, hejmar: 1608, 31-ê çiriya pêşîn ya 1913-an neqil dîke: Celîlê Celîl, b.n.d., r. 101- 102.

<sup>15</sup> Yê ku ji kovara Hetawî Kurd, hejmara yekem neqil dîke: Malmîsanij, Cızira Botanî Bedirhanîler ve Bedirhanî Ailesi Derneği'nin Tutanakları, Weşanên Apec, Stockholm, 1994, r. 234

<sup>16</sup> Yê ku ji kovara Hetawî Kurd, hejmar: 2, Stenbol, 1913, r. 2-3 neqil dîke: Malmîsanij, b.n.d., r. 232- 233

<sup>17</sup> Ji bo vê behse binere: Celîlê Celîl, b.n.d., r. 104- 105.

Zinar Silopî, b.n.d., r. 41

<sup>18</sup> Binere: Zinar Silopî, b.n.d., r. 40- 42.

<sup>19</sup> Yên ku ji agahdariyên Musa Anter yê di kovara Doğu, hejmar: 1, r. 29-30 de neqil kirine: Malmîsanij û Mahmûd Lewendî, b.n.d., r. 59.

<sup>20</sup> Binere: Zinar Silopî, b.n.d., r. 42- 43

Ji bona rewşa Kemal Fewzî ya wan salan li têbiniya 5-an binere.

<sup>21</sup> Nesimi Fıratlı, "Resmî İdeolojinin Sunduğu Gerçekler Kürt Ulusal Demokratik Hareketleri", kovara Deng, hejmar: 12, Stenbol, tebax 1991, r. 33.

<sup>22</sup> Nesimi Fıratlı, "Resmî İdeolojinin Sunduğu Gerçekler Kürt Ulusal Demokratik Hareketleri", kovara Deng, hejmar: 12, Stenbol, tebax 1991, r. 33.

<sup>23</sup> Kovara Jîn, çapa nû, Weşanên Deng, Uppsala, çiriya pêşîn, 1987, hejmar: 20, r. 8-9

<sup>24</sup> Kovara Jîn, çapa nû, Weşanên Deng, hejmar: 21, r.13-16; hejmar: 22, r. 11- 12.

<sup>25</sup> Binere: Kovara Jîn, çapa nû, Uppsala, çiriya pêşîn, 1987, hejmar 24, r. 8- 10.

<sup>26</sup> Binere: Celîlê Celîl, b.n.d., r. 92.

# NALEY CUDAYÎ

## Hêmin

Hêmin ku navê wî yê rastîn Seyid Mihemed Emînî Şêxulîslamî Mukrî ye, bi nasnavê Hêmin Mukriyanî jî tê naskirin. Navê bavê wî Seyîd Hesên, navê diya wî Zeyneb e.

Hêmin di 1921'ê de nêzîkî Mehabadê li gundê Laçînê ji dayik bûye. Di 18'yê Nîsana 1986'an de jî li Êrmîyê wêfat kirîye. Berhemên wî yên herî navdar **Tarîk û Rûn û Naley Cudayî** ne.

Naley Cudayî yek ji berhemên başên Kurdî yên sedsala me tê hesabandin. Li jêrê me jî bo xwendevanên xwe yên ku bi herfên Erebî nizanin, ev şî'ra hêja ya Hêmin jî kitêba wî ya **Naley Cudayî** wergerand herfên Latînî.

**Mahmûd Lewendî**

Saqîya! Wa badewe wa badewe  
Rû le lay min ke, be camî badewe

Muşterî wek min le meyxañê kem in  
Zorbeyan şad û be keyf û bêxem in.

Mey heram e bo sehende w bêxeman  
Mestî bêxem bo çî bigrin êxeman?

Em şerabetale dermanî xem e  
Lêy heram bê ew kesey derdî kem e

Em şerabe ale bo bêderd niye  
Lêy heram bê ew kesey rengzêrd niye

Bo kesêke mey çizilkî pêwe nê  
Bo çî milhor lêre bînî pêwe nê!?

Bo kesêk e mey: ke derdî karî ye  
Bêxemêk bixwatewa, zordarî ye

Bo kesêk e mey: dilî pirr bê le dax  
Bo çî lêy bixwatewe berzedemax!?

Ew kesey bêkes niye w xanexerab  
Dek be jarî marî bê bade w şerab!

Ew kesey neyçêstuwe derdî jîyan,  
Ew kesey neydîwe êş û birk û jan,

Ew kesey nekra nîşaney tîrî xem,  
Şanî danexza le bin barî sitem,

Ew kesey hestrî be zordarî nekird  
Tîxî zordarî birîndarî nekird,

Ew kesey destî le ew kê berdira  
Ew kesey dujmin le malî der kira

Ew kesey neybînî hatî dujminî  
Nîrî yexsîrîy le esto darinî

Ew kesey hênde nebû zuyr û zigar  
Wa nekewte ber çepokî rojîgar

Ew kesey neyharî ber dasî zeman  
Ew kesey "zirrey negeyye asîman"<sup>1</sup>

Ew kesey dûrî 'ezîzanî nedî  
Tîr û taney bêtemîzanî nedî

Tozî bedbextî le ser şanî nenîşt  
Lêy negîra dewr û pişt û çwar tenîşt,

Ew kesey xwardî w le bin sêber kewt  
Şew le bo keyfê le malê derkewt

Ew kesey xwardî w le bin sêber rima  
Şew le bo keyfê le malî xoy nema

Bo debê bêt û bika meyxane teng?  
Şwênî dîke zor e bo galte w cefeng

Ew kurey hêsta le jwanê rêy heye  
Seyr e zor seyr e ke alûdey mey e

Ew kesey rawî nenên lêre w le wê  
Ew kurey maçî kıçanî deskewê

Ew kurey doy dawetî destî denê  
Bête êre, çone hey dêy nakenê!?

Ew kesey "destî le memkan gîr bibê"<sup>2</sup>  
Ew kesey "tiflî dilî bo jîr bibê"<sup>3</sup>

Ew kesey pencole buksê car û bar  
Ew kesey destî bigate gerdinî yar

Ew kesey ramûsê kulmey tas û lûs  
Ew kesey têy helnedabê çarenûs

Ew kesey bimjê xunawey gerdenê  
Kufr e yek qetre şerabî ger denê

Ew kesey asûde wû xoş raybiward  
Qet xemî yexsîr û koylanî nexward

Yek le malê çawerêy bû bêtewe  
Dergî nêw malêkî lê bikrêtewe

Xemrewênek gwê bidate razî ew  
Nazenînek bê bikêşê nazî ew

Bigrê pencey nerm û nolî nasikê  
Boy kirabête serîne, basikê

Heybê hêz û gurd û tîn û taw û gurr  
Rojîgarî reş nebê bextî mikurr

Ew kesey cêgay le meyxeanê nîye  
Ew kese bade w şerabî bo çî ye?

Saqîya, wa wergerê, wa wergerê!  
Rû le lay min ke meço bo ser perê

Lengerê bigre mebe wa berzefir  
Bêne bo min, bêne bo min camî pir

Mey helal e bo min î wêranemal  
Bo min î sergeşte wû rût û recal

Bo minî ba birdeley girdenişin  
Bo minî dil pir le nador û birîn

Bo minî aware wû dûreweten  
Bilbilî bêbeş le gulzar û çemen

Perweriwî, balşikawî, dengbirraw  
Bêbijiwî, beşxurawî, derkiraw

Pîrî zûrhanî, keniftî, derbeder  
Dîdesûrî, dilmekoy derd û keser

Datepîwî, bêpesîwî, bêqerar  
Bêkesî, desteqîkawî, kolewar

Lêw be barî, derdedarî, rencero  
Şaîrî cwanîperistî dilbeso

Saqîya, bo kwê deçî, bo kwê deçî?  
Toş le ber ew milhorane milkeç î?

Toş be reng û boy ewan xwardit firîw?  
Çawî to şî helfirîwand zêr û zîw?

Toş degoryewe degel gewher huner?  
Kengê gewher cwanî kirdin bextewer?

Zêr bela ye, bêwefa ye dewlemend  
Her huner nemr e, hunerwer merd û rend

"Çilki destî malî dinya" wek delên<sup>4</sup>  
Malperist peymanşikên e w bêbelên

Qedrî cwanî kwa dezanê malperist!  
Cwanperist e pîrî xawen zewq û hest



Na meço, cwanê meço, wawe meço  
To firîwî zêr û zîwî wan mexo!

Ew hewesbazane cêy mitmane nîn  
Her dezanin gulçînî û beyrinîn

Wa were dey, wa were, nêzik be lêm  
Bimdeye mey, bimdeye mey ta delêm:

"Mestî mestem saqîya destem bigîr!  
Ta neyoftadem zi pa destem bigîr!"<sup>5</sup>

Ca ke serxweş bûm be dengêkî newî  
Bot delêm ew şî reberzey Mewlewî: <sup>6</sup>

"Beşnew ez ney çon hikayet mîkoned  
Ez cudaîha şîkayet mîkoned"

Gwêm deye, ey dîdemestî qît û qoz!  
Ta binalênim wekû bilwêr be soz

Nabê qet naley cudayî bêeser  
Ca çî ney bika çî pyawî derbeder

Bo ye nalem têkelî ney kirduwe  
Şîwenêkim pê we ney neykirduwe

Lêm gerê ba derbirim sozî derûn  
Lêm gerê ba helwerênim eşkî rûn

Şîwenî min şîwenî însanî ye  
Bangî azadî w giroy yeksanî ye

Şîwenî min şîwî Kurdî bêbeş e  
Ew geley haşa deken lêy û heşe

Ba le zarim bête der pişkoyî şî'r  
Ba firawantir bikem asoyî şî'r

Parçegostêk e dilî min, rû nîye  
Nale-nalî min direng e, zû nîye

Derdî dûrî, derdî dûrî kuştimî  
Derdî wuşyarî w sebûrî kuştimî

Yadî yaran û wilatim roj û şew  
Lêy heram kirdim qerar û xurd û xew

Xemrewênek lêre min nakem be dî  
Çon pena bo mey nebem, saqî! Edî!?

Nabînim xak û wilat û şarî xom  
Nabînim nasya wû dostû yarî xom

Rû le her laye dekem namo ye bom  
Nabînim cê jwan û kewnelanî xom

Şew dekêşim şewnixûnî w bêxewî  
Roj deçêjim derd û daxî bêewî

Çon nenalê ew diley pirrhestî min!?  
Çon le ejno bibnewe dû destî min!?

Çon nenalê ew dile engawteye!  
Berd le berdî bêtewe dengî heye

Janî nesorî cudayîm çêstuwe  
Her çî xoşim wîstuwe cêm hêstuwe

Helbirawim min le yarî nazenîn  
Derkirawim min le xakî dilnişîn

Bûme aware w perîwey dûr wilat  
Kewtime nêw wîredawî rêy necat

Bekre Şofare ewî mûxey çinîm  
Zêy Mem û Zînan wilatî lê tenî-m

Kewtime nêw çalî dilî wek Memê  
Yaye Zîn le kwê ye hawarî kemê!

Kwa Qeretajdîn, Çeko w 'Erfokwê-n?  
Bêne hanam wek pilingî çengbexwên

Laseşorêk bûm xenîmî dujminan  
Êste engawim be tîrî çilkinan

Wa-m be tenyayî le nêw xwêna şelal  
Kwanê 'El û kwanê Xanzad û Xezal!?

Zor le mêj e nare-narî minî nebîst  
Her wekû Şemzîn, Şemîley xoş ewîst

Wek Sîyamendê le çol û bendenê  
Cergî let kirdim pelî darebenê

Şetlî cwanaw-im minî sardebîrîn  
Kwa Xecim ta bom bigêrê germeşîn!?

Mangî "Kanûnê be çilwan derkîram"<sup>77</sup>  
Wek Birayîm lew wilate raw nîram

Kwa Perîxan bend û bawim bo bilê!?  
Bo nasûtêm nebme polûy serkilê!?

Ew le zozan, min le aranî dejîm  
Kê delê emniş Welî Dêwane nîm!?

◆  
Kurdewarî ey wilatecwanekem!  
Rolekem, xêzanekem, bawanekem!

Ey ewaney qet le bîrim naçnewa  
Êste bimbînin, erê demnasnewa?

Rojgar harîwimî wek esponî wird  
Hêz û twanay lê birîwim derdekurd

Bûme gepçar û deka galtey be min  
Ew rimûzney zendeqî çûbû le min

◆  
Ey refîqan, ey 'ezîzanî wilat!  
Ey biray hawsengerî cergey xebat!

Ger denalênim emin pekkewte nîm  
Têdekoşim bo wesil ta ku dejîm

Koşîşî min zor be cê ye w zor rewa  
Çûnke qanûnî tebi'et wa ye, wa!

"Herkesî ke dûr maned ez eslê xîş  
Baz cûyed rûzîgarê weslê xîş"<sup>8</sup>

Rêge debrim, kwanê hengawim şile  
Rast e bêhêz im, dekem emma mile

Her depêwim kêw û şax û çol û deşt  
Dêm berew kwêstan, berew baxî beheşt

Dêm berew zix û çew û kanyawî xom  
Çon le wane werdegêrim çawî xom

Dêm berew, ew dar û berd û bendene  
Dêm berew, ew bax û mêrg û çîmene

Dêm berew zûrk û telan û kend û lend  
Dêm berew bijwên û zenwêr û zemend

Dêm berew panawk û hewraz û nişew  
Dêm berew eşkewt û zendol û pesew

Dêm berew befr û çilûre w bestekek  
Dêm berew şîxal û rêçke w rêşbekek

Dêm berew lêr û çîr û bestên û çom  
Dêm berew heldêr û gêj û bend û gom

Dêm berew hobe w hewarî ba sefa  
Dêm berew ladê, berew kangey wefa

Dêm bibînîm nîştîman û zêdekem  
Dêm bibînîm xizm û kak û dêdekem

Dêm û degrim bazî bêrî şox û şeng  
Dêm û degrim destî doy cwan û çeleng

Dêm girawîy xom le bawêş wergîrim  
Dêm nehêlim berhelîst û bergîrim

Dêm û heldemjim şîney kwêstanî Kurd  
Dêm û deçme şewrrînî bêstanî Kurd

Dêm û deşkênîm le wê camî şerab  
Maçî şîrîn nayelê tamî şerab

Dêm û natîrsîm le perjînî be zî  
Her perî serkewt û dêwezme bezî

Ta bimênê nûrî çaw û hêzî pêm  
Dêm û dêm û dêm û dêm û dêm û dêm

Dêm heta hembê birîst û bîr û hoş  
Ger gilaşîm Kurdewarî w êwe xoş!

1974

- 
1. Le folklor wergîrawe
  - 2, 3. Le folklor wergîrawe
  4. Le folklor wergîrawe
  5. Nîwey yekemî em beyte hîy şaîrêkî hawçerxî Fars û nîwey duwemî le yekem mesnewîy Mewlewîy Belxî ye.
  6. Mewlana Celaleddînî Belxî
  7. Le beytî Brayîmok wergîrawe
  8. Şî'rî Mewlewîy Belxî ye.

# MÎR 'ÎZEDDÎNŞÊR Û XULAMÊ WÎ KULO<sup>1</sup>

Yê ku berhev kiriye:  
Alexandre JABA

Neql dikin ku berê umera û beglerêd Kurdistanê zêde î'tibar û bawerî bi sedeqata tayîfa File û re'yan hebûn. Herçî ku emrêd malêd wan û dayin û istanêd heremêd wan [ên] navmalîti hebû[n], hemû di destêd Filan da bûn. Goya carekê î'tibar ji wan dîtibûn hetta ku di Hekariyan da\* di weqtê Mîr 'Îzeddînşêrî da\* Fileyekî wî di heremê da\* hebûye [bi] navê Kulo û çil salan xulamî û navmalîti kiriye. Îcarê wisa\* diqewime ku xiyaneteka aşîkar ji wî Fileyî Kuloyî navmalî sadir dibitin ku êdî ew File labud misteheqê kuştinê dibitin. Mîr 'Îzdîn ('Ezdîn) jî emrdikitin ku Kuloyî bînin û bikujîn. Mufredî jî Kuloyî digrîn û destan girê didin ku bibîn bikujîn. Îcarê Kulo dibêjite mufredîyan ku:

– Min bibine huzûra Mîr 'Îzdîn, xeberekî min heye da ez jiboy Mîrî bibêjim, paşê min bibin û qetl bikin.

Îcarê ew mufredîtikrar Kuloyî dibine huzûra Mîr 'Îzdîn. Îcarê Mîr ji Kuloyê File pirsîyar dikitin:

– Kuro çî dibêjî?

Îcarê Kulo dibêjîtin ku: – Mîr, esseh tu dê min bikujî?

Mîr dibêjîtin ku: – Tu dê elbette bêyî kuştin. Çare nîne.

Îcarê Kulo dibêjîtin ku: – Mîr, me'lûmî te bibitin ku eve nêzûkî çil salan e ku min xizmet dikir û ava xusl û destmêja te min tanî. Her çî qederê ku ava xusl [û] destmêjê min jiboy te înafe, me'azallah berê min mîztiye nêva wê avê û jiboy te paşê înafe. Eve ez dibêjme te: Herçî

xusl û destmêj û nimêjêd ku te hetta niha kirine ew hemû jî di ayîn û dîne te da\* betal in. Tu evan nimêjêd çil salan qeza bike û qenc bizane ku ez dijminê dîne te bûme, li ku mayî ku dijminê canê te. Û min xema kuştinê jî nîne. Me'lûmî te jî bibitin ku min eve îhaneta çil salan digel te kiriye. Min tu ji Xudê [û] mîran<sup>2</sup> rûreş kiriye. Ez jî tême qetl kirin, xem nîne.

Îcarê Mîr 'Îzdîn qewî zêde têtê xezebê û bixu radibitin Kuloyî didite ber xençeran û dikujiyin û bixu jî jiboy vê xebêra hatî ku Kuloyî çil salan wisa\* îhanet û xiyanet kiriye, qewî zêde milûl û mehûn dibitin ku "Evî Fileyî hinde nimêjêd min daye fesadî, ez dê çewa\* bikim?"

Melan gotiye Mîr 'Îzdîn ku: – Jiboy kefareta vî şûlî mexsûse, medreseyekê bîna bike, dibitin ku Xudê te'ala te 'efû bikitin û gunahêd te bibexşitin.

Îcarê fî'l-waqî' ewî Mîr 'Îzdînî xasseten jiboy vî şûlî medreseyek bîna kiriye û ewqafêd kafî lê weqf kirine û hala niha jî ew medrese heye, 'Îziye ['Eziye?] dibêjîn. Hetta ku eve şûle neqewimî bûy, umera û axayêd Ekradêd xû cihêd Hekariyan qewî zêde î'tibar û bawerî bi re'ye û Filan hebûn û ew tayîfe jiboy emîn hisêb dikirîn. Lakin paş vî şûlî ku waqî' bubî, êdî ewçend î'tibar Fileyan nakin û bi wan baweriyê nakin, lewra\* selba î'tiqada wan buy êdî xanim û heremêd wan jî bi rû Filan nakevin û ji re'yeyan xû setr dikin.<sup>3</sup>

Yê ku ji herfên 'Erebî wergerandiye:  
M. Malmîsanîj

<sup>1</sup> Ev nivîsyeke ji nivîsên peşan (nesr) ên kevnên Kurmancî ye, berî 135 salan di kitêba Alexandre Jaba de derketiye û di beşê Kurdî ya vî kitêbê de "Hikayeta Sih û Yekê" ye. Lê di wergêra Frensî ya wê de navê nivîsê "Mîr Az-ed-dîn-şîr et son domestique Kulo" ye. Min navê nivîsê li gor Frensîya wê danî. Tê zanîn ku 'Îzeddînşêr, bi navê Yezdanşêr jî tê nasirin.-M. Malmîsanîj

<sup>2</sup> Mîr, piraniya wê: mîran. Kurd ji Muhemmed re û ji pêxemberên din re dibêjin mîr [û] mîran. (Di beşê wergêra Frensî de nota Alexandre Jaba)

<sup>3</sup> Ev nivîs ji vî kitêbê hatiye neqlkirin: Alexandre Jaba, Recueil de notices et de récits kourdes, St. Petersbourg, 1860; réimpression 1979, Amsterdam, r. 93-95

\* Di dawîya vî kelmeyê de -bi herfên 'Erebî- "ny" heye, lê wenî tê fêmkirin ku ev şaşîya çapê ye.

# WERGERA RÛSÎ YA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ


Seîd Mela

Xebatkarê Enstîtuya Lêkolînên Lengu-  
îstî mamosta Kerîmî Eyûbî, di bin  
redaksiyona I. A. Smîrnova de Dîwana  
Melayê Cizîrî ji Kurmancî bi zimanekî  
pirr bedew wergerandiye Rûsî. Bi vê  
wergerê, cara pêşîn e ku Dîwana Melayê  
Cizîrî bi zimanekî Ewrûpî  
têt weşandin û bi Rûsî têt  
xwendin.

Mamosta Kerîmî Eyûbî  
ji vê kitêbê re pêşgotin û  
nivîsek li ser jiyana û xebata  
Melayê Cizîrî jî nivîsiye. Di  
werger û lêkolîna Dîwanê  
de K. Eyûbî berhemên Sadiq  
Behaeddîn Amêdî (1977) û  
'Ebdurehman Şerefkendi/  
Hejarî (1982) bikar aniye. Wek têt  
zanîn, Amêdî û Hejar jî sîd ji çavkaniyên  
berî xwe wergirtine. Çapên berî hingê  
ew bûn: Çapa M. Fon Hartman (1904),  
Mustefa Qeredaxî (1924), Mela Taha  
Eba Bekir Alî (1937), Kovara Hawar  
(1941-1943), A. M. Zivingî (1954) û  
yên din wek Enwer Mayî, Muhemed  
'Elî 'Ewnî, A. M. Nacî û M. Ş. Elhu-  
seynî.

Wergera Rûsî ya Dîwana Melayê  
Cizîrî 286 rûpel e, tîraja wê 2050 tene  
ye; bi alîkariya Komeleya Interrin û  
Çapxana Nauka, li Sankt Peterburgê,  
di sala 1994'an de hatiye weşandin.

Di pêşgotinê de hatiye nivîsîn ku  
Melayê Cizîrî di warê astronomî, dok-  
torîya gelêrî, leşkerî, olî, cografi, dîrokî  
û edebiyata gelên Rojhilata Navîn de  
zana bû. Lewra jî Kurdan navê wî bi  
Melê hildan.



Jibo bicihkirina jiyana  
Melê, Eyûbî dibêje ku di-  
vêt hin materyalên nuh  
bêne dîtîn. Lê li gora lêko-  
lînên materyalên di dest  
de, meriv piştrast dikare  
bêje ku Mele di çarîka  
duwema sedsala XVII'an  
de hîn sax bû.

Di kompozîsyona xe-  
zelê de Mela daye ser şopa  
hostayên gewre Se'diyê Şîrazî, Hafîz û  
Camî. Lê Hafîz ê herî nêzî dilê Melê ye.  
Bizimanêxweyê zikmakî Melê hostetiya  
xezelê bi form û naveroka wê gelekî li  
hev aniye û gihandiye kemalê. Herçendî  
Dîwan ji qesîdeyên serbixwe pêkhatiye  
jî, ew ji aliyê hunermendî, naverok û  
dîtinên xwe ve, ji hev cida nabin û  
yekgewde ne.

Mamosta Kerîmî Eyûbî lêkolîneke  
akademîk a kûr û pîrralî pêkaniye ku  
jibo naskirin û rêgihîştina Dîwana Melê  
gelekî pîwîst e. Ev werger dikare bibe  
gaveke mezin jibo belavkirina vê dîwanê  
bi zimanên din.



# KONFERANSA EHMEDÊ XANÎ

## 27.05.1995



Ehmedê Xanî  
Tablo: Ji Seîd Rêzanî

Di 27'ê Gulana 1995'an de bi însiyatîfa Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê û Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, bi munasebeta 300 saliya nivîsandina destana Mem û Zînê, li Stockholmê konferansek hat çêkirin. Civaka Kurd a li Swêdê jibo vê konferansê eleqeyeke gelek mezin nîşan da. Nêzî du sed kesî guhdariya konferansê kir.

Ji Hollandayê Dr. Martin van Bruinessen, ji Frensayê Profesor Joyce Blau û ji Swêdê jî Mûrad Ciwan wek konferansiyer li ser hêlên cuda-cuda yên Ehmedê Xanî û Mem û Zînê rawestiyên.

Prof. Joyce Blau li ser jiyana Ehmedê Xanî, Martin van Bruinessen li ser welatperweriya Ehmedê Xanî û Mûrad Ciwan jî li ser dema Ehmedê xanî peyivî.

Di dawîya semînerê de, beşdarên ji konferansiyeran hin pirsên derheqê Mem û Zîn û Ehmedê Xanî de pirs kirin.

Zimanê konferansê bi Îngilîzî û Kurdî bû. Hesenî Qazî axaftina konferansiyeran ji Îngilîzî werdigerand Kurdî.

Serokê Navenda Çandî ya Kurdî li Moskovayê Prof. Şakirê X. Miho û Dr. Beşîr Resûl jî wek mêvan di vê konferansê amade bûn.

# JÎ SERÎHILDANA SALA 1925'AN ÇEND FOTOGRAF

Berî demekê min di kovareke Tirkî de îlanek xwend. Ev îlan derheqê mezata (muzayedeya) kitêban de bû û di dawiya îlanê de hatibû nivîsîn ku hin fotografên Şêx Se'îd ji dê li Îstenbolê, di mezatê de bèn firotin. Piştî pirskirinê hat fêmkirin ku ev fotograf yên Şêx Se'îd û Serîhildana Kurdan a 1925'an in û di 1925'an de hatine kişandin. Ez fikirîm, heke Kurdek nikaribe vana bikirre dê yekî din bikirre û ew dê ji dest Kurdan herrin. Ji xwe hatibû gotin ku xwedî rojnameyê Tirkan xwestiye bi sî milyon lîreyên Tirkîye van fotografan bikirre. Ewqas pereyên min tunebûn, min mesele ji hevlekî xwe re, Se'îd Aydoğmuş re got, wî jî qebûl kir û bi pirranî bi pereyên wî ev fotograf hatin kurrîn. Herweha Se'îd qebûl kir ku em van fotografan di vê hejmara Çirayê de biweşînin. Ez sipasî wî dikim.

Di mezatê de firotina van fotografan, mesela Xalid Begê Cibrî anî bîra min. Demir Özlü di çîrokeke xwe de dinivîse ku piştî bidardekirina Xalid Begî, şûrê wî tevî hin tiştên wî yên din di mezatê de hatine firotin. Wekî ku Özlü dipirse, kî dizane niha şûr û kincên Xalid Begî li ku ne?

Di dawiya van fotografên Serîhildana sala 1925'an de bi Tirkî-bi herfên 'Erebî-derheqê fotografan de hin agahdarî hatine nivîsîn. Ji van agahdariyan tê fêmkirin ku ev fotograf di dema serîhildanê de ji alî zabitên Tirkan hatine kişandin. Bi qasî ku ez dizanim ji vana tenê du heb di 1925'an de, di hin rojnameyên Tirkan de hatine weşandin lê yên din nehatine weşandin. Diyar e ku ev fotograf girîng in. Jiber ku di nav wan de fotografên hin şehîdên navdar ên Kurdan hene û tu fotografên din ên wan şehîdan neman. Herweha di hin fotografan de hin Diyarbekirî bi kincên xwe yên wê demê diyar in. Dîsa hin fotograf derheqê dukan û kolanên Diyarbekira 1925'an de fikirekê didin. Herçî fotografên bajarê Diyarbekirê, yên Farqîn (Silîvan) û Licê ne, yekta ne. Ev fotograf, jibo karên eskerî, ji alî zabitên Tirkan ji teyareyê hatine kişandin û van bajêran bi tevayî nîşan didin. Wek nimûne, gava ku meriv ji vana li yekê dinêre, dibîne ku wê demê, li derveyê kela (bedena) Diyarbekirê çî bigre tu avahî tune û di nava kelê de jî hin der bê xanî û bê avahî ne.

M. Malmîsanij

**Diyarbekir-Keleya Hundur (İçkale)**

1-Xwendegeha Mamostayan (Darülmualimin)

2-Qolordu

3-Hepixxane

4-Daîreya 'Edliyeyê

5-Bîna Hukûmetê

6-Mufettişiya Ordu ya Sisiyan (Üçüncü Ordu Mufettişliği)

7-Şubeyên Mufettişiya Ordu ya Sisiyan

8-Deriyê Serayê

Fotograf ji teyareyê hatiye kişandin.

Dem: 31. 3. 341 [1925], se'et: 11. 00

Teyare: Brege 14 A-2

Pilot: Mukerrem Efendî

Bilindî (irtifa): 1200 metre

Foto: Mulazımê evvel (üsteğmen) İhsan Efendî

**Diyarbakir (Fotograf ji teyareyê hatiye kişandin.)**

- 1-Xana Hesan Paşa
- 2-Diçe Deriyê Çiyê
- 3-Diçe Deriyê Mêrdîne
- 4-Camiya Mezin (Cami-i Kebir)
- 5-Diçe Deriyê Ruhayê

Dem: 27. 3. 341 [1925], se'et: 10. 40

Teyare: Brege 14 A-2

Pîlot: Kazım Efendî

Bilindî (irtifa): 1000 metre

Foto: Ji teref Mulazımê evvel (üstegmen) Îhsan Efendî

**Farqîn (Silvan) [Fotograf ji teyareyê hatiye kişandin.]**

Dem: 9. 4. 341 [1925], se'et: 9. 40

Rasîd: Zuhtu Efendî

Pîlot: Mukerrem Efendî

Bilindî (îrtifa): 2000 metre

Navê teyareyê: Îstanbul

No: 280

Mîqyas: 1/7 700

Rewşa hewayê: piçek bi ewr

Licê [Fotograf ji teyareyê hatiye kişandin.]

Dem: 8. 4. 41 [1925], se'et: 10. 10

Rasid: Zuhtu Efendî

Pîlot: Mukerrem Efendî

Bilindî (irtifa): 2200 metre

Navê teyareyê: İstanbul

No: 280

Mîqyas: 1/7 700

Rewşa hewayê: piçek bi mij û bi ewr

